LE XAKÊ XURASANÊ (DÎWAN)

CE‘FERQULIYÊ ZENGELÎ

avesta | EDEBIYAT: 625 | 148
**Le Xakê Xurasanê**
**(Dîwan)**
**Ce'ferquliyê Zengelî**
**Amadekar**: Mehdî Jafarzadeh / Mehmed Salih Bedirxan

**Edîtor:** Abdullah Keskin
**Berg:** Yekbûn Stêr
**Mîzanpaj:** Avesta
**Çapa Yekem:** 2018, Stembol

**Çap:** Berdan Matbaası
Sadık Daşdöğen Davutpasa Cad.
Güven San. Sit. C Blok, No: 239
TOPKAPI / 'STANBUL
Tel: (0212) 613 12 11

© Avesta, 2018
Ji xeynî danasînê bêyî destûra weşanxanê bi tu awayî nayê zêdekirin

Sertifika no: 13193

**AVESTA BASIN YAYIN**
**REKLAM TANITIM MÜZiK DAĞITIM LTD. ŞTi.**
Şehit Muhtar Mahallesi Basma Tulumba Sokak No: 5
BEYOĞLU / 'STANBUL
Tel: (0212) 251 44 80

www.avestakitap.com
avestayayinlari@yahoo.com
https://twitter.com/avestayayin
https://instagram.com/avestayayin
http://www.youtube.com/avesta1995
http://www.facebook.com/wesanenavesta

**ISBN: 978-605-**

LE XAKÊ XURASANÊ (DÎWAN)

CE'FERQULIYÊ ZENGELÎ

avesta | **ŞI'R**

**CE'FERQULIYÊ ZENGELÎ** Di sala 1799an de li gundê Goganê yê Qûçanê, hatiye dinyayê û temenê xwe li wir derbas kiriye. Lêkolînên nivîskar û zanayên kurd ê Bakurê Xorasanê, heta niha derbarê koça dawî ya Ce'ferqulî de negihiştine qenatekê. Li gor bûyerên ku Ce'ferqulî di nava dîwana xwe da îşaret pê kirine, wisa xuya ye ku di serdema hukûmeta Nasir Eldîn Şahê Qacar da jiyaye. Tewahudî amaje bi wê yeke dike ku Ce'fequlî derdora sala 1894an de koça dawiyê kiriye. Ce'ferqulî li gelek herêmên Îranê, Turkmenistanê geriyaye û di helbestên xwe de navê wan herêman jî hilaniye. Bi tirkî, farisî û erebî jî helbest nivîsandine. Di qesîde û xezelên xwe de cîh daye beytên farsî û tirkî. Nayê zanîn be ka Ce'ferqulî li medreseyan xwendiye yan na. Ligor lêkolînerên Xorasanê Zengelî weke hozanên serdema xwe bêyî xwendin û nivîsandinê fêrî gotina helbestan bûye.

**naverok**

Pêşgotin: Ce'ferqulî Zengelî: Efsaneya rastîn! / Elîreza Spahîlayîn (Kawa Zêdî)
Ce'ferqulî Zengelî û Dîwana Wî

**DÎWAN**
1.
2. Desbeste towe nakem
3.
4. Derê Meyxanê
5. Çûme Heleb û Şamê
6. Le Xakê Xurasanê
7. Îşev Min Le Xewê Dî
8. Elîf
9. Zewac Cenab 'Elî
10. Dastanê Hezretî Xizir û 'Elî Eleyhîsselam
10. Kefter û Şehbaz
11. Milwariyê Dexwazim
12. Felsefê Hec û Mî'racê
13. Pêxember Çû Mîracê
14. Dilo Tu Mewi Mexrûr
15. Le Min Mîvan e Gurcî
16. Qewlê Ce 'ferê Sadiq
17. Munacatname
18. Min Aşiqê Hezîn Dî
19. Here Şûn û Yordê Xwa
20. Çiyayê Hezar Meçît
21. Mulemma
22. Kaf û Mîm û Rê
23. Şîrê Yezdan Ya 'Elî
24. Silêman û Bilqês
25. Silêman û Bilqês
26. Nizanim Perîzad î ya Hûriyê Rizwan î
27. Şukrê Zulcelal
28. Xanezadê Beytu'l-heram Ya 'Elî
29. Pendnameya Ce'fer Qulî Zengilî
30. Pûr û Pişîman Dewin
31. Ademîzad
32. Aqibet Xeflet Xab e
33. Muşkil Kar e Karê Dil
34. Yar û Hemdem Hatine
35. Sebrê Eyûb We Min De
36. Barilaha Kerîma
37. Sî û Du Hirûf
38. Qelender û Mestane
39. Milwariyê Dil Ji Min Bir
40. Le Dîwanê Muhemed
41. Ya Elî Meded

42. Keçika Qizilhisarê
43. Çiyay Şaycanê
44. Biwîn Halê Min
45. Mîna te tune yarek
46. Can û Dil Bêtab In Îro
47. Kelamullahê Natiq Ya Elî
48. Le Şe’nê Îmam Reza
49. Reza Zaminê Ahû
50. Rojê Qiyametê
51. Pûr û Peşîman Dewin
52. Şêrên Perakende
53. Dîdarê Te Dexwazim
54. Milwarî Rind e
55. Wesfê Elî
56. Gulcihan je min bû cuda
57. Qehbe felek
58. Eya Xaliqê Ekber
59. Sehergeh çon zaqê şeb ser hilanî roşen bû
60. Qadirê qudretnema
61. Dildarekê
62. Sed hezaran şukr yezdan çon ku tu yarê min î
63. Badê Seba
64. Li Şahrekê
Helbestên tirkî
Xurasan sitûnî Hesen Pehliwan
Fitneya Salar

## Pêşgotin
## **Ce’ferqulî Zengelî: Efsaneya rastîn!**

Gotineke mezinan ê me kurdan heye ku dibêjin “peyva ji dil ra dibe, wê li dilan rûne.” Tevî ku gorî zagonên helbestnasî û hermonutîkê û prensîbên nûjen a helbesta modern, gotinên gelekî ji helbestvanên klasîk, neyên pejirandin û hesibandin, lê dema gotinek di dilê meriv de cîhê xwe digire, ev gotin di eynî demê de bi hest û mejiyê însanan re pêwendiyê çê dike. Dibe ku wekî helbest were destnîşankirin. Ce’ferqulî Zengelî, helbestvanê mezin ê kurdên Xorasanê, yek ji temsîlên vê pênaseyê ye.... Ew ne tenê ji hêla stiran û hûnanê de helbestvan e, ku jiyana wî jî temsîla helbestê ye... û wisa ye ku kesayeta wî rojbiroj mezintir dibe.

Nivîsîn li ser kesayet û rola helbestîk a Ce’ferqulî Zengelî di nava kurdên Xorasanê û wêjeya kurdî de, karekî nehêsan e. Çima ku hûrî û kûriyên jiyan û helbesta wî zêde ne. Gorî texmînên berbelav Ce’ferqulî Zengelî di sala 1799î ya zayînî de li Goganê, gundekî bajarê Qûçanê, ji dayîk bûye û derdorî sala 1894an de jî, li cîhekî nediyar koça dawîn kiriye.

Helbestvanê navdar ê kurdên Xorasanê, Ce’ferqulî, di dirêjahiya temenê xwe de, tim li ger û geştê bûye bi gotina xwe “bêçare û

aware" bûye bi tena serê xwe, piyên peya, çol û newal û gund û çiya û bajarên Xorasanê -û tê gotin ku tevahiya Îranê û herwisa dervegeriyaye. Dutara wî tim bi ser milan de, helbestên wî bi ser zimên de, dengê wî bi serî lêvan de. Lê, meqseda wî tim nediyar, bi şevan û rojan tim diqîriye û diherikiye wekî kaniyên biharê û carcaran, di sîbera merxekî an nepena kevirekî de razaye û demên xwe yên dijwar û evîndar û çarenûsa xwe ya xedar û nediyar, derbas kiriye.

Milwarî; ev nav, diyardeya herî girîng û bibandor e di jiyana Ce'ferqulî de, rastîn an xeyalî, vê xanima ciwan wekî hezkiriya Ce'ferqulî, bandora herî mezin li ser wî kiriye. Ser vî esasî, evîn û evîndarî, mijara herî berçav û nasraw e di nava helbestên Ce'ferqulî de. Meriv dikare bibêje peyva zêde bikar hatî li helbestên wî, "Milwarî" an "Mil" e û gaşe sedema ewqas pêşwaziya helbestên Ce'ferqulî ji hêla xelkê Xorasanê de, ev hestên xweşik û peyvên nazik bin. Evîn, dikele û hêstir dibarin ku helbestvanê bêhedor û aware, tim dubare dike:

*Ce'ferqulî dest bavêj, dawî mededkarî dil/*
*Milwariyê dil ji min bir, nika li qesdî cîn e**

**Ceferqulî, birastî kî ye û çi kiriye?**

Ce'ferqulî kurdekî Xorasaniye ku jiyana xwe wekî helbesteke bêdawî jiyaye. Bi nêrînekî rexneker û krîtîk, em dikarin bibêjin ku xwezî, helbestvanê me peyvên resen û kevn û esîl ên kurdî, di nava helbestên xwe de zêdetir cîh bida û bedewî û resentiya zimanê kurdî baştir diparast. Lê mixabin ku ev yek nekiriye... Ce'ferqulî jî wekî Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî, bala xwe daye ser "çi stiranê", lowma "çawaniya hûnandinê" û parastina zimanê kurdî ji wî re ewqas muhim nebûye... Eva kêmasiya herî girîng û berçav di helbest û xebat û hunera Ce'ferqulî de ye. Rexneya din; zêdetiya hejmara helbestên olî yên di dîvana wî de ye. Lê di eynê wextê de, wî nirxên herî mezin û mayînde diyariya çand û ziman û hunera kurdên Xorasanê û hemû cihanê kiriye, wekî mînak;

* Babasefer Muradî/Ce'ferqulî; Helbestvanê Arif 2015/ r. 113



a) Bandora karîzmatîk a Ce'ferqulî li ser kurdan û xwebaweriya wan de -ku hertim di rewşeke xerab de jiyane- zor girîng e.

b) Hêza hezkirin ji însanan û ji zimanê kurdî ku wî daye gelê kurd, gelekî zêde ye.

c) Hunera kurdan bitaybet ji hêla mûzîk û dutarvanî û sitranê de gelekî xurt kiriye.

d) Jiyana efsaneyî a Ce'ferqulî, piştî windabûna wî, gelekî hêz û xeyal û quwet daye xelkê, nemaze helbestvanan û hunermendên Xorasanê û birastî di vî warî de, Ce'ferqulî ala herî berz û hêviya herî bilind a kurdên Xorasanê (xurbetê) bûye.

Ev beytên wî derheqê Çiyayê Hezarmeçîtê de li bareyî wî û helbestên wî bixwe jî rast in:

*Ji vir tê bihna muşk û etriyat û zencefîl*
*Ava kaniyan rewan e, mîna nehrê selsebîl*
*Meger le vir qedem xist, mu'elimê Ciberyîl*
*Gûya li vir nazil bû, hem Torat û hem Êncîl**

û birastî, tevî hemû erebîzebûna zimên û naveroka dînî, helbesta Ce'ferqulî, kaniya xêr û xwebawerî û jiyanê bûye, ji kurdan re.

Hêjayî gotinê ye ku wekî helbestvanên klasîkên navdar ên kurdî Ce'ferqulî Zengelî jî bi çend zimanan helbest nivîsandiye; bi kurdî, tirkî, tirkumenî û farsî. Lê zêde ji sedî 95î helbestên wî bi kurdî ne û dibe ku Ce'ferqulî wekî zexîre û dewlemendî û bingeheke layîq ji wêjeya kurdan re were nasandin û divê em bizanin ku ev sermaye bi saya mamostayê mezin Kelîmullahê Tewehhudî berhev bûye û vejîna wî pêk hatiye. Ez ji vê pirtûkê pir bihêvî me û dilniya me weşandina dîvana Ce'ferqulî, têkiliya navbera Kurdistana mezin û kurdên xerîb ên Xorasanê zêdetir bike û bibe destpêka hevnasîneke ciddî, herwiha bibe sedema geş û xweştirbûna çand û ziman û wêjeya kurdî.

**Elîreza Spahîlayîn (Kawa Zêdî)**

* Kelîmullah Tevahudî/ Dîwana Ce'ferqulî/ 2002/ r. 150

## Ce'ferqulî Zengelî û Dîwana Wî

Ce'ferqulî di sala 1799an de li gundê Goganê yê Qûçanê, hatiye dinyayê.* Ligel Kelîmullahê Tevahudî** hozan û hunermendê xorasanî Ezodî*** jî di hevpeyvîn û axaftinên xwe de aşkere dike ku Ce'ferqulî xelkê Qûçana Xorasanê ye û wî temenê xwe li vê herêmê derbas kiriye. Lêkolînên nivîskar û zanayên kurd ê bakurê Xorasanê, heta niha derbarê koça dawî ya Ce'ferqulî de negihiştine qenaetekê. Li gor bûyerên ku Ce'ferqulî di nava dîwana xwe da îşaret pê kirine, wisa xuya ye ku di serdema hukûmeta Nasir Eldîn Şahê Qacar da

* Kanîmal - Kelîmullahê Tevahudî, ***Dîwana Ce'fer Qulî Zengelî*** *Meşhed:* 2002: r. 3

** Kelîmullahê Tevahudî, dîrokzan, şair û muzîsyen e. Ji Bakurê Xorasanê ye. Heta niha derbarê çand, dîrok, kelepûra kurdên Xorasanê de zêdetir ji 30 kitêbî nivîsandiye. Kitêba wî ya bi navê "Herekata Kurd ber bi Xorasanê" ji 7 cîldan pêk tê bi farsî ye. Herwiha berhema ku me li ser kar kiriye *Dîwana Ce'fer Qulî Zengelî* Meşhed: 2002 jî ji aliyê wî ve hatiye amadekirin û çap kirin. Tevahudî, helbestên Ce'fer Qulî berhevkirine û ew bi rênûsa erebî belav kirine.

*** Ehmed Ezodî, dengbêj û helbestvanekî navdar e li Bakurê Xorasanê. Ezodî jî ji ser zarê xelkê û hozanên Xorasanê helbestên Ce'ferquliyê Zengelî berhev kirine û bi navê *Dîwana Caferqulî Zengelî û Mecmûya Şa'ir Ehmed Ezodî* Bocnurd, 2008 belav kiriye. Di amadekirina vê berhemê de sûd ji kitêba Ezodî jî hatiye wergirtin. Herwiha bo famkirina hinek bêjeyên Xorasanê dîwana Ezodî gelekî sûdmend bû.

jiyaye. Tewahudî amaje bi wê yeke dike ku Ce'fequlî derdora sala 1894an de koça dawiyê kiriye. Ligel amajeya Tewahudî derbarê jiyana Zengelî de gelek rîwayet jî hene.

Heta niha nivîskar Celîlê Celîl&Gulî Şadkam* kurdolog Mehmet Bayrak** lêkolîner Abdollah Hajiyan û Umîd Demîrhan*** lêkolîner Mehmet Salih Batirhan**** hinek numûneyên dîwana Ce'ferqulî belav kirine.

Ce'ferqulî li gelek herêmên Îranê, Turkmenistanê geriyaye û di helbestên xwe de navê wan herêman jî hilaniye. Li gor helbestên Ce'ferqulî wî danûstendin ligel gelek neteweyên li Îranê jî kiriye. Lewre di helbestên xwe behsa gurcî, ermen, pêkhateyên weke ecem, tirk û hindûyan jî kiriye.

Mînakek ji helbesta Le Min Mîwanê Gurcî:

*Gurciyek nazenîn e tûtiyek şîrînsuxen*
*Sîm û zerefşan zulf e bilûr serayîgerden*
*Hûr û perîzadek e dîlwerê sîmînbeden*
*Şikil kaseyê Çînî 'eqîq û le'lê Yemen*
*Serwê sehî qamet e mûrçemiyan e Gurcî*

Zengelî xisûsî gelekî behsa sirûşta Xorasanê jî dike. Xaka Xorasanê weke ciwantirîn cî li cîhanê dihesibîne. Helbestên wî yên bi serenava Le Xakê Xorasanê, Çiyay Şaycanê, Keçika Qizilhîsarê behsa sirûşta Xorasanê dikin herwiha di wan helbestan de Ce'ferqulî navê, giha, çiya bajarok û herêmên Xorasanê li dû hev rêz dike.

Çarînek ji helbesta Çiyay Şaycanê:

*Je Şîrwanê hewale cûlgê Faric Qoçanê*
*Îmamdax, Elîbulax, Armûtlî û Zîlanê*
*Çiyay Selsal û Duçing le rastê Xewûşanê*

* Celîlê Celîl & Gulê Şadkam: *Sêxiştiyên Kurmancî Xorasan*, Wien, 2012
** Mehmet Bayrak: *Kürt Ve Alevi Tarihinde Horasan*, Ankara, 2013
*** Abdollah Hajiyan, û Umîd Demîrhan: *Gulbijêrek ji Çand û Wêjeya Kurdên Xorasanê, Fritillaria Kurdica*, Krakow, 2017.
**** Mehmet Salih Batirhan: *Ce'ferqulıyê Zengelî Û Dîwana Wî Ya Kurdî* (Projeya masterê ya bêtezî çapnebûyî), Zanîngeha Mêrdînê, 2018



*Hespan şîhe dekşînin berxan le wê barrebarr*

Li gor helbestên di dîwanê de heyî em li wê yekê rast tên ku Ce'ferqulî Zengelî bi tirkî, farisî û erebî jî helbest nivîsandine. Di qesîde û xezelên xwe de cîh daye beytên farsî û tirkî. Herwiha beşek helbestên wî yên bi tirkî di beşeke dîwanê de hatine bicîkirin.

Mînakek ji mullemayeke Ce'ferqulî Zengelî wiha ye:

*Lêv tunikê piste fek didan hûrê şox û şeng*
*Je feraqê te nemaye le rûya min av û reng*
*Wesfê husnê te bela bûye le Rûm û le Fereng*
*Baxrimi baxrimi buryan qilûp 'aşqin mene virdî xedeng*

Mijarên helbestên Zengelî bi giştî, tesawuf, felsefeya jiyanê, ilmî eşqa Xweda ye. Lewre Ce'ferqulî di qesîde û xezel û mûnacaatnameyan de navê 12 îmamên mezheba şîe, Elî, Hûsên, Hesen, Îmam Ce'ferê Sadiq, Abbas, hiltîne û methiye bo wan gotine û ji kêşa erûzê û sirweyê jî îstîfade kiriye.

Mînakek ji methiyeya bo Elî jî wiha ye:

*Meded je te dexwazim êy xwedawendê sermed*
*Xwedwendê ehed û hem hovellaho semed*
*Serwerê pêxemberan pêxemberê me Ehmed*
*Le her karê xûb û bed dewêm ya Elî meded*

Ce'ferqulî ligel pesn û methiyeyan bo îmamên mezheba şîe, çîrok û hedîsên olî jî di helbestên xwe de bi cih kirine. Xisûsî jî em li çîroka melîkeya bajarê Sebayê Belqis û Silêman rast tên. Zengelî bi 2 helbestên cuda cîh daye rîwayeta Belqis û Silêman.

Du mînak ji helbestên Bilqês û Silêman

**1.**
*Silêman go: Asif dêw û periyan xewer ke*
*Çar fersengê qesrê min gişi kevirê mermer ke*
*Je rûyê kevirî mermer da rûkêş tu zîv û zer ke*

**2.**
*Bilqês name hilanî we şoq û zoq û xendan*
*Dî name nivîsîne je caniwê Silêman*
*Evel we navê Xwadê qadirê heyy û subhan*

Evîna Ce'ferqulî beramberî Milwariyê di gelek helbestên dîwanê de xwiya dibe. Mirov dikare beje evîna Zengelî û Milwariyê hemû dîwan rapêça ye. Evîna Milwariyê wek agirekê dikeve hundirê canê Cefer Qulî ku paşê êdî ji haleteka zemînî û evîneka madî ber bi evîneka manevî va wî dikişîne ber bi irfanê ve. Lewre Zengelî evîna xwe dişîbîne mîna evîna Ezra û Wamiq, Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn û bi vegotineke folklorîk behsa evîna xwe dike.

Cefer Quliyê Zengilî çend nasnav ango mehlesên cuda bikaranîne. Cefer, Cefer Qulî Bêçare, Cefer Qulî Endelîb û hin navên din. Ce'ferquli tesîreka pir zêde li ser mûzîka kurdên Xorasanê jî daniye. Ce'ferqulî li dutarê jî daye û piştî wî gelek bexşî û dengbêjên Xorasanê huner û helbestên wî ji xwe ra kirine hewîn û di ekola wî afirandî ya evîn û irfanê da perwerdehî dîtine û mezin bûne. Hezkirina Ce'ferqulî li nava xelkê Xorasanê gelekî zede ye. Li bajarê Şirwanê peykerê Ce'ferqulî hatiye danîn û her sal di mîhrîcanên edebiyatê de helbestên wî tên xwendin.

Li gor rîwayetên lêkolînerên Xorasanê malbata Ce'ferqulî Zengelî koçer bûne û karûbarên sewalkariyê kirine. Ew her demsalekê li herêmekê geriyane. Amaje li ser wê yeke jî heye ku hêj di nûciwaniya xwe de Zengelî evîndarî Milwariyê dibe û dilê Milwariyê jî li cem Ce'ferqulî Zengelî ye. Herwiha malbatên wan jî cînarên hev in. Piştî demekê ku malbata Ce'fequlî neçar dimîne ji Qûçanê bar bikin û herin koçberiyê. Dema malbata Ce'ferqulî Zengelî vedigerin Qûçanê malbata Milwariyê li Qûçanê nemaye û wan jî bar kiriye. Herwiha nebûna Milwariyê tesîreke giran li Ce'ferqulî Zengelî dike û Zengelî bûye bengiye Milwariyê. Bajar bi bajar, gund bi gund li Milwariyê digere lê wê nabîne û evîna wê jî ji bîr nake.



**Hin beytên Zengelî derbarê Milwariyê de**

**1.**
*Milwarî boz e we mîna qund e*
*Arê işqê Milwariyê tund e*

**2.**
*Ce'fer Qulî Bêçare dewê mîna bulbulan*
*Xuya le rûy Milwarî mîna şevnemê gulan*

Heta niha nayê zanîn be ka Ce'ferqulî li medreseyan xwendiye yan na. Ligor lêkolînerên Xorasanê Zengelî weke hozanên serdema xwe bêyî xwendin û nivîsandinê fêrî gotina helbestan bûye. Gelo Ce'ferqulî Zengelî beyî xwendina medreseyan û xwendinê çawa bûye hostayê edeb, ilmê îslamê. Çawa fêrî çîrok û hîkayetên bûye û şexsiyetên dîrokê ji kû nas kirine? Hêvîdar im di siberojê de pirsen derbarê jiyan û helbestên Ce'ferqulî Zengelî de hemû bê bersiv nemînin.

Bêyi em behsa çawaniya zimanê helbestên Ce'ferqulî Zengelî bikin pêwîste em destnîşaniyê bi rewşa diyalekta kurdên Xorasanê bikin. Kurdên Xorasanê bi zaravayê kurmancî diaxivin.* Kurdên Xorasanê piranî kurmancîaxêv in û devoka wan kurdiya Bakur ango kurmanciya jorîn e. Li gor dîrokê, niha çend sede ji koçkirina wan ber bi Xorasanê ve, derbas dibe. Li gor amarên nefermî zêdetirî milyonekê kurd li Xorasanê dijîn ku hîn piraniya kesên mezintir ji 20 salan, kurdî diaxivin yan jî fam dikin.**

**Çend taybetiyên zimanî yên kurmanciya Xorasanê**

Devoka kurdên Xorasanê kurmancî ye, lê ji ber tesîra zimanê farsî û hin zimanên din ê wê herêmê hin taybetiyên şîwezara kurmancî ya xorasanî çêbûne. Hin guherîn di dengnasiya şîwezarên

* Afrasiab Shekofteh, *The Kurds in Khorasan, North-east of Iran*, 2013 r. 07.
** Mehdi Jaferzadeh, *Analîza Krmanciya Deregeza Xorasanê li gor Hêmanên Zimannasiyê*,(Teza Çapnebûyî) Zanîngeha Mêrdînê, 2017, r. 01.

Xorasanê de pêk hatine û herwisa ji ber cudahiyên mekanî û tarîxî di navbera kurmanciya Bakur û kurmanciya Xorasanê de tevî ku bingeha wan yek be jî dîsa mirov rastî hin guherîn û ferqan tê ku li vir çend nimûne ji ferqên berbiçav tên pêşkêşkirin û bi kurmanciya standard ra tên berawirdkirin. Armanca me ew e ku xwendevan bi hêsanî devoka Xorasanê têbigihije û çêja helbestên Ce'ferqulî Zengelî bistîne. Helbet ferq û guherînên devokî ango şîwezarî hertim sabît nînin û pirrî caran mirov rastî lihevnekirina qaîdeyên destnîşankirî jî tê.

**Guherîna pêşdaçekan**

Di devoka kurmancî ya Xorasanê da pêşdaçekên 'li' û 'ji' 'bi' bi 'le' û 'je' û 'we'yê tên guhertin.

*Ey le husnê te peyda enwarê padişahî*
*Le tînetê te peyda je xur ta gav û mahî*
*Delîlê cinn û beşer hem le erz û semayî*
*Le fikrê te pinhan e sed hikmetê ilahî*
*Şev û royê le çiyan we dû wê bûme hêsîr*

**Guherîna dengê 'b' bi 'w'**

Di piraniya bêje û lêkerên ku **b** tê da heye ev guherîn dengguherîn tê dîtin:

*To**w**e ez bikem to**w**e je 'işqê Milwariyê*

**Qertafa avaker bo dema niha "de" ye**

Di kurmanciya bakurî de "*di*" tê pêşiya reha dema niha û lêkera dema niha pê tê dariştin, lê di kurmanciya Deregezê de ev pêşgir weke "*de*" xwe nîşan dide.



*Herçi iltimas dekim ew je min deke ferar*
*Qediyana gelek lêkeran bi dengê 'i'yê*
*Herkes le te bifikri ne demri ne dewi kal*

Qertafa îzafeya pirjimar

Qertafa îzafeya pirjimar di kurmanciya bakurî de '*ên*' e lê di devoka Xorasanê de '*êne*' ye.

*Êne*: ji bo pirjimariyê

*Dilwer çû xwa xemiland we çek**êne** cûr we cûr*
*Je zîn**êne** eywanê qedem lêxist hate jûr*

Em li vir pêwist dibînin, spasiya xelkê Xorasanê û herwiha kedkar û rûşenfikrê Xorasanê Kelîmullahê Tewahudî jî (Kanîmal) bikin. Xelkê Xorasanê zimanê xwe parastine û hêja Kanîmal jî piraniya helbestên Ce'ferqulî ji devê xelkê bihîstiye û herwisa dutarvan û bexşiyan jî ew helbest weke stran gotine.

Navvvvv

(DÎWAN)

1.

Ey le husnê te peyda enwarê padişahî
Le tînetê te peyda je xur ta gav û mahî
Delîlê cinn û beşer hem le erz û semayî
Le fikrê te pinhan e sed hikmetê ilahî
Mustecab dewi du'a le wextê sehergahî
Ya zaminê qerîwan tu umîd û penah î
Hasil ke miday dilan ya zaminê qerîwan

Evvel serê bismillê ew bayê bismilla ye
Şafi'ê rûzê ceza Muhemmed Mustefa ye
Saqiyê hozê koser 'Elî el-Murteza ye
Bihiştê rûyê zemîn Mescidê Goherşa ye
Qewrê Harûnê Reşîd je yê Axê* cuda ye
Her kes Harûn le'net ke Axa dide şefaye
Ya zaminê qerîwan hasil ke miday dilan

Le'net bêwi le Me'mûn** çi mel'ûnek bêdîn e
Barigay Îmam Reza giştî gohernişîn e
Gumêz guldestê bilind giştî xiştê zêrîn e
Îmam Husên şehîd wû hêsîr bûye Sekine
Esqera şîrxar e gewriya wî we birîn e
Le xêmegê bîmar wû ew Zeynel'Abidîn e
Ya zaminê qerîwan hasil ke miday dilan

Çend kelîman gudagir ey Hadiyê*** rehnema
Zehrê cefa bû nesîb le Hesenê Mucteba****
Je rûzê ezel Husên***** qewûl kir camê bela
Cewanê wî şehîd wûn eyalê wî mubtela

---

* Mebest Îmam Reza Îmamê heştem yê şîe ye.
** Xelîfeyekî Ebasiyan e.
*** Îmamê dehem yê şîeyan
**** Lawê Hezretê Elî, Îmamê duyem yê şîeyan
***** Îmam Husên, Îmamê sêyem yê şîeyan

Nesîwê yarêne wî bûye deştê Kerbela
Destê te yedullah e tu we xwa muşkilguşa
Asan ke muşkilê min ya zaminê qerîwan

Towe ez bikem towe* je ‘işqê Milwariyê
Xwa le halê xwaşiyê xwa gavê bêmariyê
Xah aware le çiyan xwa le intizariyê
Xah bimînim sergerdan xah bimrim we xariyê
Xah je mêl û je rixwet xah je rûy naçariyê
Xah azad û muxeyyir xwa le giriftariyê
Sa wî dedim ser û can ya zaminê qerîwan

Dilê min ê we derd e ez we kunde û zincîr
Va derdê le min keti tunne çare û tedbîr
Şev û royê le çiyan we dû wê bûme hêsîr
Haka bûye muqedder le min tunîni texsîr
Xah bimrim xah bimînim xah herme çol û cezîr
Je ‘işqê Milwariyê hergiz nakerim** je bîr
Ya zaminê qerîwan tundtir ke arê dilan

Rezamend û teslîm im we qezayê muqedder
Huccetê*** Xudawendî nûrê çavê Pêxember
Ziyabexşê mêhr û mah guldestê te munevver
Rêwerê cinn û ins û wehş û teyr û berr û behr
Îmamê Heştumîn î lawê Mûsebni Ce‘fer
Ce‘fer hatiye dergay te tu le wî bike nezer
Ya zaminê qerîwan hasil ke miday dilan

* Îdîomeke kurdên Xorasanê ye yanê “ez qet tobe nakim.”
** Li devera bajarê Layînê ê Xorasanê nakim di forma nakerim de tê bikaranîn.
*** Nîşan û elameta Xwedê



## 2. Desbeste towe nakem

Dîsa daye serê min hewayê te hûrwarê
Şev û royê denalim mîna ewrê beharê
Xewerê te tunîni xezan kete gulzarê
Reqîwan deste deste gul bizdandin je darê
Bulbula min bûye lal je qusê wefedarê

Ta ku carê gula min le hemer numayan bû
Xemê ‘işqê eser kir le min zarê ‘eyan bû
Je hesreta rûya wê xewê le min heram bû
Rûzigara min reş bû zindegiyê min talan bû
Xab û xur* le min nema je ‘işqê wefadarê

Ew we zincîr û kund e ez le kunde giriftar
Le bendê wê hêsîr im rehm nakere zincîrdar
Ez mat û hêran mame kejreftar e rûzigar
Her teref nezer dekem kesek tune le min yar
Bêkes û bêxemxar im bi qêr ez wefadarê

Ez fexîr û zelîl û naumîd im xar û zar
Herçi iltimas dekim ew je min deke ferar
Iltimasî min va ye belke le axirê kar
Muşkilê min asan ke Xudawendê kirdigar
Bêkes û bêpanah im bi qêr ez wedafarê

Dilê min çilkek xwîn e xewerek je min tunne
Je wê rûyê hicranê taqetek le min tunne
Hem ‘elîl û zeîf im rexwetek le min tunne
Nexwaş û dilfikar im quwwetek le min tunne
Bêkes û bêqerar im je destê wefadarê

* Xew û xwarin

Le hekîm û tebîban vî derda tunne derman
Le ser min hazir biken dilwera şîrînziman
Elacê vî derdê min qêr ez wê tunne imkan
Je feraqa rûya wê helak im dîdegiriyan
Giriftar û bêmar im sewa wê wefadarê

Şevê le halî roya ez fikar im dilmelûl
Je hesreta rûya wê xar û zar im dilmelûl
Je gerdişê zemanê bêqerar im dilmelûl
Şevaroyê çav le rê intizar im dilmelûl
Hêsîr û giriftar im le des wê wefadarê

Texsîra le min wa ye desbeste towe nakem
Subhê sadiq mubeddel we şam û mesa nakem
Şev tarî û rê dûr e çav je wê cuda nakem
Can û mal payendaz e meger ez feda nakem
Bêkes û bêpenah im bi qêr ez wefadarê

Umîdê min je Xwadê va ye je rûy ihsanî
Carê le min nezer ke muşkil bike asanî
Le bêyni me berpa ke 'işreteke nihanî
'Işreta dunyalixê le eyyamê cewanî
'Işret le min heram e bi qêr ez wefadarê

Aşix im şevaroyê dekem dad û bêdade
Gah xursend û gah xemîn gah dekeme feryade
Miradê Ce'fer Qulî je heq bibi amade
Reqîwan giriftar ke hem zelîl û uftade
Bêkes û giriftar im je hicrê wefadarê



## 3.

Royek je mal verketim le eyyamê nûbihar
Sewa siyahetê ra daxil bûme le gulzar
Warid bûme baxekê bêdemax û ustixar
Ser kişandiye felek şemşad û serw û çinar
Çi baxeke ba sefa manendê baxê rizwan*

Le her teref fikirîm giştî gulêne elwan
Min dî dexwîni bulbul le ser gulê erxewan
Nagah min dî ku verket nazenînek şitaban
We naz û qemze têye mîna kewê xereman
We tawê şîlwarê xwa zinde dekerî mirdan**

Min go: Xwadêyo kî ye va dilwerê nazenîn
Va Nahîd e ya Zuhre ya Xurşîd e ya Perwîn***
Rûbendê swîr le rûyan solê lingê wê zêrîn
Tîrê 'işqê le min xist cîgerê min kir birîn
Pêşta çûm bikim selam lerzîm ketim je zimîn

Min we xwa ra fikir kir bikerim je viya pirs
Biwînim va perî ye ya melek e ya ku ins
Ne le serê min ma hûş ne le dilê mi ma hirs
Axir min je wê kir pirs mîna ademê we tirs
Kêm kêm hate palê min mîna teyrê ser destan

* Baxê Rizwan: Bihişt
** Miriyan
*** Nahîd, Zuhre, Xurşîd, Perwîn navên stêrkan in.

Temaşey bejnê kirim nalê* serw û senober**
Gerdenbendê le usti muresse' durr û goher***
Cewahiratê hefreng şedde giştî sîm û zer
Je refşê wê hêran bûm eqlê min bûye muzter
Çavê min reşeva bû le serê min bû tofan

Kiras sîs û herîr e we xwa çun hûr û perî****
Ku le cêke biharî le xwa kiriye je zerî
Le bin kirês rawûne her du memê enarî
Mîna Yûsifê Ken'an 'alem bûye muşterî
Xudawenda hasil kî tu we xwa miday dilan

Nagah***** hate çavê min emaretek we êwan
Istexrek le pêşiya wê nav mînê durrê qeltan
Dîfal je kevrê mermer ser kişandiye Kehkeşan
Min dî dilwer pêşta hat manendê serwi bostan
Destê min girt go: Were ey dilfikarê nalan

Destê min we destê da ez birme nav êwanê
Min dî esbabê 'işret teyar e le meydanê
Lehze bi lehze pirrtir dilê min bir gulcanê
We zimanê Kurmancî gep kir şîrînzimanê
Go: Were je 'işqê te cîgerê min bû biryan

Qerez****** ku ez rûniştim we haleteke mehcûr
Dilwer çû xwa xemiland we çekêne cûr we cûr
Je zînêne eywanê qedem lêxist hate jûr
We bejn û balê re'na je dilê min bir hedûr
Hat le çerê******* min rûnişt we min re bû mêhrewan

---

* Wek, mîna
** Navê dareke bejnbilind e
*** Bi dur û goheran hatiye xemilandin
**** Wek, mîna
***** Ji nişkê ve
****** Di encamê de/ meqsed
******* Tenişt, kêlek



Êvar bû melê şîvan* sa min çi desga danî
Murqê biryan teyar kir we terîqê mîzwanî
Dewriyê şîwan pêderpê kenîz kulfetan hanî
Sergerdan û heyran mam le wî bezmê sultanî
Ew we 'izzet-ihtiram sa min ra bû mîziwanî

Je du ti'amxarnê şev kişiya bû wextê xaw
Hedûr le min nadeket cîgerê min bû kewaw
Wê nazenînê gulrû zulfê xwa da pêç û taw
We hef qelem arayiş le des piyalê şeraw
Fekweken** we min ra go viya bike noşican

Hînga go: Şev kişiya çû ey lawikê xoşqamet
Here satê tu rakev me nema sebr û taqet
Çûm ketime nav cilan xew le çavê min naket
Je xwa bûme bê xewer we haletê felaket
Ne le serê min ma hûş ne le cismê mi ma can

Nagah dilwer warid wû le des xwa girtiye cam
Rûwendê xwa hilanî le hemerê hêran mam
Min dî Milwariyê min e wa çavreşê gulendam
Fek we ken rû le min hat we min ra bû hem kelam
Şewitîm je 'işqê wê manendê şem'ê sûzan

Her du lêvê wê qunçê şikil swîr hemço lale
Çenê gilor bîvil tîx her du çav in piyale
Mîna hîveke çarde gêşti husn û kemal e
Min le ba xwa fikir kir ilaha wa çi hal e
Nûr je rûyan debarî mîna xurşîdê taban

---

* Dema şîvê
** Fekweken /Devliken

Şikil vedebirûskî mîna yaqûtê ehmer
Didan sedef qunçe fek şîrîn je şehd û şeker
Gerden nalê bilûrê singê wê textê mermer
Aşixê dîdarê wê cemî‘ê cin û beşer
Çakir û cannisar in perî û hûr û xilman

Ez je şûnê xwa rawûm ta feda kim ser û can
Derdê dilê xwa bejim sewa yarê mêhrewan
Dilwer camê mêy da min go: Tu bike noşican
Derdê hicran tu mewêj ey dilfikarê nalan
Xudawenda nezer kî le halê xestedilan

Ce‘fer Qulî cîgerxwîn dewê mîna bulbulan
Xwêy le rûyê Milwariyê mîna şevnêmê gulan
Xudawenda hasil kî midayêne giştî dilan
Tu je karê aşiqan we xwa vekî muşkilan
Muşkilê vî derdê min tu we xwa bikî asan



## 4. Derê Meyxanê

Zulfê te şane şane bûne muşkî mu‘etter
Herdu kemendê kiyan du şamar in berawer
Keçegî te heçe ne şiklê te qosê qemer
Qereqaş birûkewan çavê reş in helqewer
Hûra firdosa berîn ‘endelîba suxenwer
We husn û cemalê xwa je min dilbiriye dilwer
Lêv qunçe didan sedef gepkirin şehd û şeker

Dilwer qirmiz xemilî çûye seylê gulşanê
Meyêke* sîseboz e guherçîna demanê
Sêveke Qasimşahî** le kinarê dûkanê
Şevek le nîzkê pigê çûme derê mêxanê
Mutrib we sot û awaz mê*** le des dilwercanê
We min ra go: Tu vexwa je vê mêyê mêxanê
Çûme pesxanê xelwet rûniştim we çêşmê ter

Lêvnazik pistedehan zimanê te engebîn
We husnê te tunîni le Xeta Çîn û Maçîn
Bedensîm kirasherîr le xwa kir çeka sengîn
Navê ‘işqê tu megir cîgerê min meke xwîn
Sîngê te baxê Irem we xwa guleke rengîn
Je ‘işqê te le min bû dunya qaf û fê û sîn****
We xwa tutiya xezelxan bejnê te nexlê ‘er‘er

* Deveya mê
** Cûreyeke sêvê ye.
*** Mey
**** Mebest ji qaf û fê û sînê qefes e.

Pijangê te xedeng e her du çavê te nuqet
Le serê min bû tufan bûye şûrê qiyamet
Le şevekê dostewar min biwe şûnê xelwet
Aşiqê husne te me we min ra bike sobet
Sewa te bûme biryan bike mêhr û muhebbet
Rehm bike le halê min Xusrewê ba edalet
Metlewê min hasil ke tu êy serwê senober

Verketiye hîva çarde je berê burcê meşriq
Şefeq da kûhê Sîna sitarê subhê sadiq
Tu Leyla û ez Mecnûn tu 'Uzra û ez Wamiq
Nexwaşeke bedhal im tu yî tebîbê haziq
Kes tûnîne mîna te ne nika ne le sabiq
Ta min dî ez bêhûş bûm le husnê te bûm aşiq
Te je min bir eql û hûş misalê badê serser

Bejnê te şaxê şimşad bilind û tazenihal
Çûye 'erşê mu'ella serbilind û bê hemal
Ta şemalê te da min ez kirim dîn û ebdal
Herkes ku te biwîni jê tere* eql û kemal
Carê le min bike rehm ruxset bide bêwime mal
Herkes le te bifikri ne demri ne dewi kal
Ew nawi dilpejmurde 'işqê te deke coher

Ce'fer Qulî senaxan dexwîni şê'rê dilcû
Le serê min bû tofan hêran mame mislê Nû(h)
Sewa te ra mi can da qedem lêxin were zû
Perdê je rûyan hilîn carê nişan de ebrû
Qoşe memê te Dicle le wer ketime kamcû**
Mi xerq meke le deriyê we dadê min gê Yahû
Nesîb û qismetê min ha kir Xaliqê ekber

* Dihere
** Kîteyeke vê risteyê kêm e.



## 5. Çûme Heleb û Şamê

Îro je 'işqê yarê mi mêy vexwar je camê
Îşev min le xewnê dî cemalê gulendamê
Tarîf bûye wesfê wê le sûrey Elîf Lamê
Şems û qemer çakir in le ba wê xoşxeramê
Tûtî lal û bê ziman le cem şîrînkelamê

Mîna yarê kes nedîm le milkê Xurasanê
Bujnûrt û Raz û Gîfan le Manesimilxanê
Ciwên û Nerdênê çûm geriyam Mazenderanê
Esterawat û Gurgan hem yurdê Mezînanê
Derweder geriyam çûm ta Şahrûd û Bestamê

Sultanmeydan Kilîder Seroleng û Çinaran
Radkan û Qizilhesar Exlemed û Gulmekan
Hem Şandîz û Nuxunder Turxebe û Qulqoçan
Cixrik û Şerîfawat hem Hesarê Gulistan
Le Meşhedê Muqeddes ketme 'işqê nizamê

Je Elhak û Miyamê ta we 'Ebbasawatê
Sewziwar û hem Turşîz Turwet û Mewelatê
Geryam le sertaserê bilûkê Qayinatê
Le milkê Nîşawûrê ta we Miyanawatê
Le tu derê min nedî nîşanê gulendamê

Geriyam le Xaf û Baxerz Tûn û Tebes Qayinat
Bala Murxab û Sercam Xuriyan şehirê Herat
Merw û Serexs Aqderbend Qeretîkan [û] Kelat
Xur û Gujik Tebadkan Mizdûran Mehmûtawat
Siyahet kirim çûme Turbetê Şêxê Camê

Semerqend mi le hev da hatime şehrê Xuzdarê
Dêhistan bazara min tav xarime Buxarê
Armût û sêv û enar firêwan le bazarê
Keçkê wê sermest mîna keçkê Qizilhesarê
Le hemerê wan naynin caylan hergiz dewamê

Je ‘işqê wê şev û ro le min bûne meh û sal
Ya reb dîdarê yarê sa min ra megîn zewal
Çolayxane mi tew da Deregez kire pamal
Mîna yarê kes nedîm we sûret û we cemal
Mîna Mecnûn we dû wê ret bûm je neng û namê

Tarîf kirin wesfê wê le welatê Şîrazê
Gûya neqaşê ‘alem qelem xist le kaxazê
Natê yarê min nedî le Şarek û Exazê
Ne le Gilyan Daxyanê ne Ordûxan Bîwazê
Ne le Qûçan Faricê ne Şîrwan Ziwarimê

‘Aşiq im pirr derd û xem we dîdarê te muştax
Gurcî le Gurcistanê ez degerim dax we dax*
Tu bulbulê baxan î yê din gişti hemço zax
Nalê te serw û nazê le ku bikerim** surax
Şaye je lutfê Xwadê bifilitim je damê

‘Emaretê xerawmay we olengê henwar e
Gurcî le wê taw dexa je wê bûm bêqerare
We wê zulf û keçegê ez fexîrê bêçare
Aware qerîw kirim we pê bûm ustixare
Aqibet va karê min hergiz nagê encamê

* Çiya bi çiya
** Li herêma bajarê Layînê “bikim” weke forma “bikerim” tê bikaranîn.



Yar hat satê wê gep kir je fekê durr debarî
Tîrê ‘işqê le min xist le cîgerê min karî
Je wê derdê ez ketim ro le min bû êvarî
Mîna *‘Aşiqê Xerîb** axir bûme firarî
Je ‘işqê wê senemê hatime Heleb û Şamê

Subhdem je gulzarê min fexîrê guzer kir
Bulbulek xûnîncîger cihan pirr şûrûşer kir
Birîna min teze bû ‘işqê le min eser kir
Demaxê min we zulfê yarê min mu‘etter kir
Her dem nesîmê pigê** lêxist le wê meşamê

Pirr we ah û hesret im sewa te nazenînê
Mîna Ferhad mi can da le feraqê Şîrînê
Ce‘fer Qulî ço Behram nemedpûş e le Çînê
Laçînek im tav dexum le ser te gogerçînê
Hol xwarim û gul xwarim axir ez ketme damê***

* Meqsed çîroka Şahsenem û Xerîb e
** Sehergah, sipêdeh
*** Geriyam û zivirîm ketime dama te.

**6. Le Xakê Xurasan**ê

Wesfê yarê biwêjim ez le dor û zemanê
Tarîfê wê ez bikem mîna gulê cenanê
Ne we qelem mumkin e tersîmê gulcihanê
Ne we zimîn tê gotin wesfê şîrînzimanê
Bêhemta bêmanend e le xakê Xurasanê

Rû qirmiz e qunçegul lêvxendan pistedehan
Mem nazik in belgî gul sedefê hûr in didan
Le gerdenê serayî hemayil kiriye mircan
Eger carê biwînim le dil namîni erman
Mimkin nawi werkev im je xakê Xurasanê

Qedbilind û ne pest e misilê serwê azad e
Bejnê wê çon elîf e dilê min le feryad e
Herdu guliyê wê kemend le qesdê min amade
Ez pê kirim giriftar can û mal da we bade
Heyran û sergerdan wûm le Xakê Xurasanê

Sa min giriftarê ra kemend in herdu gîsû[*]
Le qesdê min fikarê keman in herdu ebrû
Sewa telefkirnê min tîrê pijangan rawû
Nêçîrwanê bêrehm e je satê evvel xwa wû
Nagihan nêçîr kirim le xakê Xurasanê

We endamê kişîde şikilê wê mislê lale
Le tebî‘etê biwêm me‘lûm e zêrînxal e
Elîf bejna mi wê kir xemîde hem ço dal[**] e
Sergerdan je hicra wê da’im dekem xiyale
Hêsîr bûme we dû wê le xakê Xurasanê

* Kezî, guliyên por
** Dal alfabêya erebî-farsî ye ku li vir helbestvan bejna xwe şibandiye xwarbûna tîpa “[illegible]”.



Sîngê yarê bostan e berpa kir şerûşûre
Mem enar û narinc in beden mîna bilûr e
Bulbul le gulê şeyda ez ê bûme rencûre
Hêsîr kirim we dû xwa le min nema hedûre
Xezan ket le gulzarê le xakê Xurasanê

Le xwa arayiş kiriye ‘eskê şîr û xurşîdê
Şemayilê padişan le qefesê murîd e
Aşkar bû le nav xelkê ‘alem hate xerîde
Le qesdê min fexîrê ketiye tonê cihûdê[*]
Ta min zarê şehîd ke le xakê Xurasanê

Xudawendê ‘alemê ber ser şahid guwa ye
Wesfê yarê nê gotin qemerwar huwêyda ye
Le vê husna heyran in Zulêxa û Gulşaye
Le qefesê giriftar tûtiya bênewa ye
Eşkrêz im naumîd le xakê Xurasanê

Le ‘alemê cewanî Xudawendê kirdigar
Ez ku je dil xafil wûm çima te kirim bîdar
Çima te vî fexîra we belê kire duçar
‘Alem kulli te‘nezen[**] ne min sebr û ne qerar
Reqîb le min şa bûne le xakê Xurasanê

Xudawendê Te‘ala wesîlêkê bigînî
Belkê vî xema je min dûr bikî û hilînî
Her dere du aşiq in karê wan le hev daynî
Sewa *Ce‘fer Qulî* ra feraqê wê negînî
We dû wê xar û zar im le xakê Xurasanê

* Xwe wek cihûyan çêkiriye.
** Hemû alem qerf, tinaziyên xwe bi min dikin

## 7. Îşev Min Le Xewê Dî

Evvel we navî Ella le her karê bismilla
Her muşkil dewi asan bixwînin qulhuwella
Le wesfê yarê bêjim Elîf Lam û Mîm û Ra*
Dilwera şîrînziman îşev min le xewê dî

Ew xaliq û ez mexlûq ez talib û ew metlûb
Ez bendeyê bîqerar hem bêşekîb û şikûb
Ew sahibê ‘alemê hem kullê şey’ê qulûb
Dilwera şîrînziman îşev min le xewê dî

Ew raziq û em merzûq ew sahibê ceberût
Em mirde û ew zinde em mewt û ew layemût
Ew xaliqê cin û ins ew sani‘ê melekût
Hûr û xilman bendewar îşev min le xewê dî

Je sun‘ê qudretê xwa xilqet kiriye xelayiq
Je her kêm û bêşî da rûziyê wî daye layiq
Hef kokebê le asmîn we hev bûne mewafiq
Hef kokebê nûranî îşev min le xewê dî

Diyanzde burcê le asmîn burcê çarom seretan
Serê wan burcan nehs e sewa nexwaş bêmaran
Rehmê dilê te pir e tu yî Rehîm û Rehman
Tali‘ê yarê fikrîm min yar le gulşenê dî

Tu ‘alim û aga yî hem ‘alimu’x-xeyûb î
Sewê gunekaran ra hem xafiru’z-zinûb î
Tu yî rebbu’l-‘alemîn hem elifu‘l-qulûb î
Je sun‘ê qudretê te îşev min le xewê dî

Tarîfê yarê biwêm ew serwerê selatîn
Gulî degê kemerê zulfêne wê çîn be çîn
Xalê le ser sîngê wê mîna guleke baxîn
Gogerçînek le asmîn îşev min le xewê dî

Ez Kerem û ew Eslî ez Ferhad û ew Şîrîn
Ez Ibrahîmê Malik ew hem ço Nûşaferîn
Bulbul le gulê aşiq pê hemdem û hemqerîn
Je bulbulê şêydatir îşev min le xewê dî

Ez Wirqa û ew Gulşa ez Yûsif ew Zuleyxa
Ez Mecnûn û ew Leyla ez Wamiq û ew ‘Uzra
Ew Seyyadê Serwinaz ez le wê hem ço Hemra
We dû wê bûm derweder îşev min le xewê dî

Her du lêvê wê yaqût didan hûr in ço goher
Le nav her gulistanê mîna serw û sinober
Tûtiya şîrînziman bînî fekî wî ‘enber
Wî yarê şîrînziman îşev min le xewê dî

Pistedihan û didan boz dekerin ço goher
Lêva sûr e mîna gul şîrîn je şehd û şeker
Heyran im le vî husna le xwa kir zêr û ziwer
Yareke goherfiroş îşev min le xewê dî

We herkes wî mêhrewan rûzî dedî bêpayan
Muşkilê wî karî min tu we xwa bike asan
Vî derdê Ce‘fer Qulî meger tu bikî derman
Le cennet hûr û xilman îşev min le xewê dî

* Ce’fer Qulî amaje bi Sûreta Re`dê dike ku bi “المر” dest pê kiriye.

## 8. Elîf

La ilahe illellah tu yî heyy û subhanî
Ez bîmar û ‘elîl im tu tebîb û derman î
We ‘işqê te giriftar çon Yusifê Ken‘anî
Her şev ta demê pigê ez we ah û efxanî
Rengê swîrê min zer wû we derdê bêderman im

Ya qeyyûmê zulcelal ez dewêjim ya hebîb
Qudretqelem te kişand xelq kir elîfa necîb
We ‘işqê giriftar im ez bîmar im tu tebîb
Tu we heqqê Pênc Tenan* wê le min bike nesîb
Sergerdan û perîşan ya rebb ez ê heyran im

Kişiya bejnê elîfê mîna serwê azade
Elîfwar û bê‘eyb e dilê min le feryad e
Zendê boz û bêçyê zêr mîna şax û şimşad e
‘Aciz û dilfikar im je xemê hatme dade
Ez we arê ‘işqê wê giriftar û sûzan im

* Pênctenê alê eba (Mihemed, Elî, Fatime, Hesen, Husên)



Je zemînê ta asmîn ya rebb meger pirr dûr e
Mistecab nawi carê du‘ay dilê rencûre
Bê dîdarê rûyê wê le min tunne hedûre
Ne min xew e ne xorak ne taxet û sebûre
Ez we derdê ‘işqê wê we dîdeyê giryan im

Rû we qiwle gerdenkec ez dekime munacat
Du‘ayê min mustecab ke elo qaziyu’l -hacat
Rozigara min va ye ne heyat e ne memat
Le gepkirinê debarî je fekê nuxl û newat
Ez le baxê ‘işqê wê qumriyê xezelxan im

Ez şehbaz im ew bulbul bulbula bositanê
Ez mîna merganekê* ew le tonê cêranê
We dû wê haware me le çol û biyabanê
Elîf xoşxalê hindû nê tîrresê kemanê
Ce‘fer Qulî dewêji we dû wê sergerdan im

* Neçîrvan

## 9. Zewac Cenab ‘Elî

Şems û qemer le coza le wexteke texafil
Hefte yomê erbe‘e ‘Etarud le merahil
Zîqede û kaf û ha sata ku bûn miqabil
Min dî le halê ruya pîş ez zohrê newafil
Tezwîca Xeyru’n-nisa le Emîrê qebayil*
Ew du yarê mehsîma melekşekl û şemayil
‘Eliyê ‘endelîbwar le wê gulê bû mayil

Hûn we selewatekê meclîs biken mu‘etter
Ta sa we ra beyan kim neqlê Zehrayê ether
We çi terê bû cufta ‘Elî saqiyê koser
Gîşte hedda teklîfê cemal ço mahê xawer
Hûr û xilman bendewar bûne kenîz û noker
Heryek le şuxlek meşxûl le felekê heft exter
Girtîn Bercîs û Nahîd le burcekê menazil

Herkes le cem Pêxember xwa kir medh û menaqib
Gepkirin je zer û sîm je cah û je minasib
Çi exyar û çi eqyar çi ensar û mihacir
‘Elî Sedîq û Farûq le Fatime bûn talib
Pêxember ma sergerdan rû kir bi ferdê xayib
Cibreîl hat go: Ya Resûl ‘eyan dewi kewakib
Nizûl deke je sema le ‘erzê çon mesayil

* Amaje bi Fatime û Elî dike.



Le ser her xaniyê daket le xwêdî biken tewaf
Ew dewi zocê Betûl kes neke behs û mesaf
Wî hukma zû carî ke tu je edû layexaf*
Pes ez emrê Îzedî Ferzendê ‘Ebdilmenaf
Belal şandiye car kişand dengê wî çû qaf bi qaf
Le wê şevê muntezir kulli ‘elam û eşraf
Gerdenkec summun buk im le dest û pa selasil

Herkes hanî zînet kir sera bi qedrê meqdûr
Le her bam û menzerê roşen bû şem‘ û kafûr
Zêdetir je orzelik ‘ud û ‘enber û bixûr
Le wê şevê zulmanî Medîne bû Kûhê Tûr
Xandin Tewrat û Incîl hem Furqan û hem Zebûr
‘Arif pê bir we metleb ‘eqilcahil bûye dûr
Semtek zikr û istixfar semtek ceng û celacil

Malê ‘Umer we goher malê ‘Elî we xak e
Yê wî mesned û qalî yê wî xak û xaşak e
Qenber ‘erz kir ya ‘Elî menzîlekê era ke
Şayed Zohre je asmîn mêlê vî menzîla ke
‘Elî we Qenber ra go: Tu terkê vî gepa ke
Kînga ‘eql û fikrê te deke ocê eflake
Nîni mihtacê ziynet heyyê Rehîmê bazil

* Ayeta Quranê ye.

Çend kulaman biwêjim je Fatimê Melîhe
Nizare kir rû le ʻerş we Eyyûbey Mesîhe
Erz kir perwerdigara we zimanê fesîhe
Min dûr ke je kaferê rûreş e pirr qebîhe
Ez Murteza dexwazim wî zuruyey zebîhe
Ized muradê wê da jê ma zikr û tesbîhe
Je xem le reqîban bû şeker zehrê helahil

Xudawendê bîhemta je rûyî rehmetgerî
Le Mistefa layîq dî mertewa Pêxemberî
Je nûrê xwa cuda kir nûrê wî û Heyderî
Je ʻeyb û alayêş û je şirkê wan kir berî
Yêk we yêk oladê wan da meqam û serwerî
Nezer kir le şaʻiran xisûsen Ceʻfer Qulî
ʻEceb nûr û bexşayêş ʻeceb feyz û fezayil

Barilaha bi heqqê Murteza û Betûle
We ʻurûcê kewakib we nuzûl û duxûle
We heqqê Şahê Necef* we hurmetê resûle
Le dilê Milwariyê min rê mede tu melûle
Bêynê Bercîs û Behram pir we qehr û nikûle
Vî tîrê duʻayê min lêx le amacê qebûle
Destê *Ceʻfer Qulî* ke le gerdenê wê mayil

* Hezretê Elî



## 10. Dastanê Hezretî Xizir û ʻElî Eleyhîsselam

Evvel hemdê Xudawend dovvom nʻetê pêxember
Dastanekê biwêjim medihê saqiyê koser
Je nav kûçê Medînê rokî je qeza qeder
Guzer dekir ku ret wi nageh Xizir Pêxember
Çav hêngifî xizanek zîba ço şems û qemer

Xelko sa we beyan kem ez we awazê celî
Le nav kûçê Medînê rokê Murteza ʻElî
We xizîn ra ew delîst peyda bû Xizir Nebî
ʻElî le wî selam kir we zimanê ʻErewî
Taliya go: Ey kûdek tu je xeyb dedî xewer

ʻElî go: Ey Taliya çi teʻeccub dewînî
Je her derê guzer kî we min ra hemninîş î
Dexwazî imtihan kî muʻciza min biwînî
Emma peşîman dewî geh şad û geh xemîn î
Tu here xwa pinhan ke je çavê cin û beşer

Xizir we işaretekê forî çû meşriqzemîn
Dua û senagûyan le Xudawendê mubîn
Go: Xwadêyo dagirî wî xizanê mehcebîn
Nageh je paş piştê wî ʻElî go ya Rebb amîn
Taliya go: Ey kûdek tu melek î ya beşer

ʻElî go: Ey Taliya tu biger le cihanê
Le yemîn û le yesar le berr û biyabanê
Tu je noyan qayib wi meyin tu ʻuzr û bihanê
We min ra mewê kûdek le xwa mere gumanê
Bizan ez nînim kûdek ez im Heyder û Sefder

Vî cara rû le mexrib Taliya kiriye nizûl
Heyran û sergerdan û sefîl û zar û melûl
Je ‘Elî herasan wû le zikrê Heq bû meşxûl
Go: Ilaha çi sirr e le vî kûdekê meqbûl
Vî sirra aşikar ke eya Xaliqê ekber

‘Elî go: Ey Taliya du caran te kir ferar
Le her ku te xwa vêşart ez le wê bûm aşikar
Çi le meşriq û mexrib çi le yemîn û yesar
We min ra mewê kûdek biwêj Şîrê Kirdigar
Ger newêjî Şîrê Heq biwêj Heyder û Sefder

Nika tu amade wi le wê alî nezer ke
Rûni huli tu bifkir yadê namê Heyder ke
Je meşriq ta we mexrib gişti zîr û ziber ke
Je çiyan û je çolan je herderê guzar ke
Pirsûcû ke je xelkê hem je cin û je beşer

Xizir Nebî nezer kir le wê aliy pişt û rû
Ta vegerand rûyê xwa nedî ‘Elî ku da çû
Meşriqzemîn le hev da dego Ellah û Yahû
Barilaha çi sirr e le vî xizanê xoşxû
Vî sirra aşikar ke eya Xaliqê ekber

Je meşriq naumîd bû rû le mexrib kir suraq
Xêlek we se‘y û sur‘et we kemalê iştiyaq
We zarî û tezeru‘ herdem digo: Elferaq
Xwadêwo va ku da çû sa wî ra bûme muştaq
We dû wî ra derweder îro bûme xwîncîger

Xizir dî peyda nebû le berr û biyabanê
Ne le cûlgê nîşan dî ne le çê û demanê
Çû kinarê deryayê le wê kete gumanê
Ban kir Ilyasê Nebî hazir wû le keranê
Ilyas forî peyda bû je bin avê hate der



Ilyas go: Ey Taliya çima haka hezîn î
Herasan û perişan tu we dilê xemîn î
Şûnê te rûyê zemîn le bin ‘erşê berîn î
Je meşriq ta we mexrib we çavî xwa dewînî
Çima haka hêran î rengê te yî bûye zer

Xizir go: Tu nizanî le serê min çi şûr e
Heft ro ne ez degerim ne taqat û hedûre
Je nav kûçê Medînê rokê min kir ‘ubûre
Çend xizanek delîstin we şoq û we sirûre
Tiflek rabû go: Selam eya Xizir Pêxember

Min pê ra go: Ey kûdek tu çere min dewînî
Wî got: Eya Taliya çi te‘eccub dewînî
Dexwazî imtihan kî mu‘ciza min biwînî
Tu here xwa pinhan ke ta halî xwa biwînî
Forî ez çûm pinhan bûm je çavî cin û beşer

Le her ku xwa vêşartim forî ew bû aşikar
Çi le meşriq û mexrib çi le yemîn û yesar
Je min wî dekir sual je zimanê iqtidar
Ez we çavan nawînim wî xizanê ba weqar
Heft ro ne bûye pinhan ez geriyame berr û behr

Ilyas go: Ey Taliya wesfê wî meke izhar
Le vî deryayê sehmnak ew we min bûye duçar
Min jê pirs kir: Tu kî yî? Go: Ewel heşt û çar
Min go: Navê te çi ye? Go: Ez Heyderê Kerrar
Le deriyê çû pinhan bû ez pirr geriyam bê semer

Heft sal in ku degerim le vî deriyay bê payan
Muştaq im le dîdarê jê tune nav û nîşan
Pirr geriyam ta peyda kem ta le min biwi mîvan
Nika ku tu pirs dekî dewêm vî razê nihan
Sirrê wî kes nizani meger Xaliqê dawer

Je Ilyas naumîd bû wegeriya Xizir Nebî
Aware û sergerdan je ‘Elî nîrar şan nedî
Haware û xarûzar perişan û dilxemî
Dego: Perwerdigara ka va tiflê ‘Erewî
Nizanim va çi sirr e nawînim je wî eser

We xwa ra go: Nawînim tunîni rahê nicat
Je vî dera vegerim herme çiyayê zulmat
Je zawan û je çiyan perîşan û xeste hat
Lebteşne û dermande ta gîşte avê heyat
Xast ku avekê vexwa neda kir xeyru’l-beşer

Neda hat je bin avê: Eya Xizir Pêxember
Vemexwa tu wê avê kêmekê bike lenger*
Sa te camek av bînim je avê Hozê Koser
Bigir tu noşêcan ke bi heqqê esna ‘eşer
Camek werket tiji av le des saqiyê koser

Xizir hilgirt wê camê avek sar kir noşêcan
Çû ku je kaniyê dûr wi nagehan kete guman
Go: Va ew kûdeka ye le min bûye mêhrewan
Cam kire tûr we rêket rû le meşriq bû rewan
Je bin avê neda hat eya Xizir Pîxember!

Min cam da te av vexwî eya ey Xizir Nebî
Te av vexwar noşêcan cam birin bêedebî
Ew cama yê te nîne tu bide destê saqî
Ew camê bihiştê ye eger tu lê muştaq î
Ta şî‘ê xwa sîrav kem pe wê je avê koser

Xizir go: Barilaha sa min wa dada bes e
Xwadê vî denga biwêj le vî kaniya çi kes e
Heft ro ne ez degerim rûhê min le qefes e
Dunya gişti le hev dam ez ketim je nefes e
Nizanim sirrella ye ya şahê cin û beşer

Xizir hate ser kaniyê go: Ey kûdek eleman
Îro te qesem dedim bi heqqê heyyê subhan
We gişti pêxemberan Muhemmed e xetmê wan
We diyanzde îmaman we çardehê me‘sûman
Tu werkev xwa nîşan de bigerim ta girdeser

Taliya sond daye wî we zatê pakê qedîm
Le hev ket avê kaniyê negeh vebûye du nîm
Nûra wî aşikar bû je emrê ferdê Rehîm
‘Elî lê bûye zahir we soleteke ‘ezîm
Taliya go: Je te ra el-hezer û wel-hezer

‘Elî go: Mewê kûdek navê min e Sirrella
Je ezel tiş tune wû ne zemîn û ne sema
Nûra me her pênc tenan je nura heq bû cida
Min te‘lîm da Cebreîl le wî bûme rehnema
Je terbiyetê min bû Cibreîl xwadî bal û per

Nika sond dedime te eya Xizir Pêxember
Le cihanê zinde yî pinhan je çavê beşer
Her şî‘e yadê min kir le wî tu bûyî rehber
Xisûsen Ce‘fer Qulî dilmelûl û xwîncîger
Miradê wî we wî gîn bi heqqê esna eşer

* Hinekî sebir bike.

## 10. Kefter û Şehbaz

Evvel şukrê Xudawend dovvom ne'tê pêxember
Je wicûdî Pênctenan xilqet kir cin û beşer
Dastanekê biwêjim medhê saqiyê koser
Dasitaneke şîrîn aşikar û dadiger
Je sexawetê 'Elî je şeca'etê Heyder

Qadirê qudretnema xaliqê leyl û nehar
Aferîde kir Adem 'alem gişti berqerar
Xilqet kirin Pêxember sed û bîst û çar hezar
Xetmê kullan Muhemmed ew resûlê kirdigar

Je dû wî canişîn bû nayib Heyderê Kerrar
Je tufêylê wan bûye loh û qelem berqerar
Çar 'unsurê tebî'et ab û bad û xak û nar
Nizamê aferîniş je wan bûye bermedar

Je sexawetê 'Elî Hatem bû we sexawet
Je şeca'etê 'Elî Rustem bû we şeca'et
Je 'edaletê 'Elî Nûşîrwan we 'edalet
Je kerametê 'Elî enbiya we keramet

Eger hûn xeredmend in we daniş û 'eql û hûş
Lehzêkî guh dabigrin je zikre mewin xamûş
Navê Ehmedê Mursel hergiz mekin feramûş
Ta sa we ra beyan kim neqilê kebûter û qûş



Royek Murteza 'Elî le meçîtê kir nemaz
Je qudretê ilahî ew xaliqê karîsaz
Kefterek je asmîn da rû le 'Elî kir perwaz
Red we red û pê der pê le dunbalê wî şehbaz

Yekser hate meçîtê we tirs û lerz kebûter
Rûnişt le jûnyê 'Elî bi hukmê Heyyê Dawer
K'ey hellalê muşkilat ey rehnemayê rehber
Je dû xitmê resûlan tu yî mola û serwer

Go we ser de biwêjim ey dawerî nîknam
Je dû Ehmedê Mursel tu le ummetê îmam
Ya 'Elî xizanê min le filan çiyay meqam
We heway av û danê rû le xermangê firiyam

Daketim min çîne kir girdagirdê xermanê
We unwanê her royê ta biwêm av û danê
Nagehan rû le min hat şehbazek je demanê
Firîm rû le te hatim dûr ketim je aşyanê

Je çengê wî filitîm we sed hîley min bir can
Qêr ez te tune umîd ya 'Elî Şahê Merdan
Çon je canibî heq da le hezret bûwû ferman
Hûçikê xwa hewale kir kebûter bûye pinhan

Ew şehbazê we heywet je hewa da peyda bû
Erz kir ya weliyullah ew seydê min ku da çû
Bi heqqê zatê bêçon subhanellahê Yahû
Nesîb û qismetê min direng meke bide zû

‘Elî rû le Qenber kir kêy xulamê wefadar
Tu here kardek werîn asan kem muşkilî kar
Qenber çû kardek hanî da des Heyderê Kerrar
Xwas rakere goştê ran baz go: Ya ‘Elî zinhar

Şehbaz erz kir ya ‘Elî ya ‘Elî binê Imran
Aşikar ke çi sirr e vî raza meke pinhan
‘Elî go: Ez dexwazim jê bikerim goştê ran
Bidem bixwey aştî ken hûn bi hurmetê Quran

Şehbaz ‘erz kir ya ‘Elî ya ‘Elî meazellah
Ne ew kefter ne ez baz du firişte je Ellah
Je hezret bûye ferman herne cem weliyullah
Ta biwînin ‘edalet je ‘Elî sirrê Ellah

Ce‘fer Qulî Bêçare meger ku tu bulbul î
Şevanero dexwînî tu we awazê celî
Meger le qiyametê we dadê te gê ‘Elî
Çonku pir gunehkar î Ce‘fer Qulî Zengilî
Je sexawetê ‘Elî je şeca‘etê Heyder



## 11. Milwariyê Dexwazim

Evvel je Xudawend dovvom je ‘Ebbas
Milwariyê ta lêvê qewrê dexwazim
Delîlê gumrahan ya Xizir û Ilyas
Ya Milwariyê xwa ya sewrê dexwazim

Adem we du derdan bûye mubtela
Je dûriyê behiştê dûriyê Hewwa
‘Umrê min kûta ke derdê min dewa
Ya Hewayê xwa ya sewrê dexwazim

‘Işqê Silêman kir bêyar û enîs
Herkes le karê wî kir mukr û telbîs
Bûye wesal axir feraqa Belqîs
Ya Belqîsê xwa ya sewrê dexwazim

Dilê min biriye Milwarî mehbûb
Ez lê bûme talib ew bûye metlûb
We miradê Yûsif we sebrê Eyyûb
Ya Zulêxa ya ku sewrê dexwazim

Ez laçîn im ew tawûsa xoşxeram
Ez Mecnûn im ew Leylaya gulendam
Heq dûr kî yarê min je Ibnî Selam
Ya Leyliyê xwa ya sewrê dexwazim

Dilê min defiri nawi paberca
Ne Meşhedê rind e ne yê Bixara
Ya wetenê yarê ya jî Kerwela
Herçi meslehet wi sewrê dexwazim

Awazê ‘işqê min tiji kir ‘alem
Çi şah û çi geda çi ‘ereb çi ‘ecem
Hef salan şewtîm ez nala Kerem
Ya Eslî xwa ya ku sewrê dexwazim

Je umîdwaran Xwadê umîd e
La qapûy kirdigar sewrê kilîd e
Axay min ‘Ebbas û şahê şehîd e
Je wan yarê xwa ya sewrê dexwazim

Ce‘fer Qûlî dewê  mecbûr im qasir
Yar je min hilgirtin duşmenê cabir
Le vî musîbeta ez biwim sabir
Barileha sewrê sewrê dexwazim
Ya Leyliyê xwa ya sewrê dexwazim



## 12. Felsefê Hec û Mî‘racê

Îro le kûyî wefa Xelîlê dilnûranî
Je emrê ferdê dana Ismaîl kir qurwanî
Le biynê Sefa û Merwe binîşê* Ke‘be danî
Erz kir perwerdigara hekîm û xêb danî
Le padaşê vî kara çi lutf û kerem zanî
Nida hat ey Ibrahîm ger bendey ferman î
Birehnan pûşîde ke ziyafet ke mêhmanî

Pes Xelîlê muqeddes mêhmansera bena kir
Bidûnê misafiran te‘am xarin eba kir
Le ‘eweza Ismaîl qûçê qurban feda kir
Heq nûra Muhemmedî je sulba wî ‘eta kir
Çon ku je rûzê ezel xetmê resûl peyda kir
Gişti resûlê sabiq je nûra wî cuda kir
Dil dexwazi osaf ke wî hebîbê subhanî

Xwadê je tofeyla wî bena kirin du ‘alem
Evvel sebtê defter kir navê wî loh û qelem
Le çendînê hezar sal pêş je xilqetê Adem
Mocûd ne loh û kursî nar û cennet je ‘edem
Mîrê Yesrib û Betha mahê Mekke û Herem
Serwerê kullê ‘Ereb Xusroyê kullê ‘ecem
Rehmetê li’l-alemîn nûrê pakê Yezdanî

Qisseyê mi‘rac biwêm nazil bû rûhu’l-emîn
Selat û selam hanî je cem cihan aferîn
Got: Muştaqê dîdar e pir pir Xaliqê Mubîn
Rikaba beraqê girt rûnişt ew le xaney zîn
Pênc asiman têy kirin le feleka şeşemîn
Le Mescidu’l-Eqsa dîn enbiya û murselîn
Pêşwê wan bû kir nemaz sê kullan we asanî

* Bingeh

Je wê ret bû Mustefa we celal û we şoket
Kir ku ew lingxas here nida le guçikan ket
Ne'lînê xwa vermêxin were we sey' û sûret
Ta je gerdê wan bigrî 'erşê min zîb û zînet
Je dergahê min teleb ke herçi dexwazî hacet
Resûl we zarî erz kir: Ey ezîzê pir rehmet
Curmê ummet bibaxşîn çun Rehîm û Rehman î

Derdê Ehmed dewa bû je Xudawendê nayab
Qurb û menzilet pir pir lutf û kerem bêhisab
Sê hezar mes'ele go te'lîm daye bab we bab
Hema le resûl xwaş hat herçi Xwadê kir xetab
Dî xelwet xelwetê heq têye dengê bûtirab
Xwast ku pirs ke Îzed go: Ecew mewîn ey cenab
'Elî sirrê Yezdanî yedullahê Rebbanî

Ez sa resûl çi bêjim Heq pê ra go 'eqlê kull
Qedrê wî Xwadê zani hînga sahibê Duldul
Pêxemberê maselef le wî kirin tewessul
Wellezuhya û welleyl zulf û rux bedr û sunbul*
Xwadê sebr û qena'et hem teslîm û tewekkul
Şafî'ê rûzê mehşer destgîrê serî pul**
Me'nay her çar kitawan behrê 'ilm û me'anî

Xwadê talib ew metlûb Xwadê mehbûb ew hebîb
Herdu Yûsif û Ye'qûb xelkê derdmend ew tebîb
Mûnisê her bêkesî dadiresê her xerîb
Yezdan we izzetê xwa 'eta kir sebr û şekîb
Şefa'etê ummetê le her kê bikî nesîb
Xisûs le vî fexîra Ce'fer Qulî 'Endelîb
Bidî je karxaneyê xwa fêzeke cawidanî

* Wellezuhya û welleyl şev û roj e. Amaje bi kerametên Muhammed pêxember hatiye kirin.
** Heceyek kêm e.



## 13. Pêxember Çû Mîracê

Hemdê bîhedd bîmer Xudawendê yêkta ra
Bîşerîk û bîmanend bîmisal û hemta ra
Dirûdeke pêyderpêy Muhemmed Mustefa ra
Senaguyan mutessil 'Eliyu'l-Murteza ra
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi'racê

Xudawend meb'ûs kiriye Pêxemberê şayêste
Şand je hedîs û exbar je ayatê bayêste
Lê fikirî Quranê halê wan bû aşufte
Je kulli êyb û niqsan Pêxemberê xwe şuste
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi'racê

Dînek muhkem û sabit tefezzul kir le Mehmûd
Je dînê pêşîniyan ew dîna bûye me'bûd
Dînê Yehûd û Mecûs je wî dînê bû merdûd
Xelqet kir kulli 'alem sewa wî dînê meqsûd
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi'racê

Nis hedîsê qudsî Xwadê fermûde lolak
Ey Ehmedê pakizad lemma xelqetu'l-eflak
Je xelqetê 'alemê wucûdê te bû milak
Sewa te ra xelqet bû zemîn asiman simak
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi'racê

Pêxember xelqet kir Xaliqê kon û mekan
Xoşsûret û xoşsîret xoşkelam û xoşbeyan
Didan boz in le fekê mîna lo'loyê mercan
Ew wucûdê munewwer bûye mezherê îman
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi'racê

Xudawendê zulkiram irade kiriye mi‘rac
Je lutf û rehmetê xwa danî le serê wî tac
Je gişti pêxemberan sa wî girtin distê bac
Fezl û kerem şamil bû pêxember me bû nac
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

Je emrê perwerdigar nazil bû Ruhu’l-emîn
Danî le ser Biraqê yeraq û alatê zîn
Rikabê Beraqê girt rûnişt ew le xaney zîn
‘Orûc kiriye Pêxember je zemîn çû asimîn
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

Pêykî Rebbu’l-alemîn Cibreîlê bawefa
‘Enanê Beraqê girt bêynê Merwe û Sefa
Cilodar bû hûriyan mela`ikan je qefa
Cibreîlê muqereb le Muhemmed kir sena
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

Je meçîtê we derket Beraq hanî Cibreîl
Siyar bû le Beraqê cilodar bû Mîkaîl
Bexên bexên degotin le pêşiyê wan Israfîl
Je afatê asimîn muhafiz bû Ezraîl
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

Je terefê çep û rast dehat muretteb sida
Gûya le wê şeytan wû herdem wî dekir neda
‘Eqlê kull wû Pêxember direng kir cewaw neda
Xezeb dekir Xudawend eger wî cewaw bida
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê



Hezretê Resûlullah je Beraq nizûl hanî
‘Ebadetê Xudawend le Tûrî Sîna danî
Daket ew le beyte’l-lehm we hikmetê sibhanî
Je ezel Pêxember wû Xudawend rinttir zanî
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

Rehmet bişaret hanî firiştêkê Mehmûd nam
K’ey hebîbê Ilahî ey Mehmûdê nîknam
Xwadê je fezl û kerem pêxam daye sê kelam
Ya evvel û ya axir ya haşir wesselam*
Merhmet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

Xaznê Beytu’l-miqeddes sê cam le xidmet hanî
Yêk şerab û yêk jî av yêk şîrê cawidanî
Camê şîr wî ser kişand we hikmetê Rebbanî
Nicat da je afetan wî hebîbê subhanî
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

Enbiya sena kirin je dû ferax ez nemaz
Danayê kull hatiye ey Qeyyûmê karisaz
Ey Kerîmê bêzewal Rehîmê bendenewaz
Te Muhemmed nicat da le wan giştiyan kir ê‘caz
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

Tefezzul kir Xudawend je sulbê Resûlullah
Je arê Nemrûdî da xelas kir Xelîlullah
Nabûd kir qewmê Fir‘on nicat da Kelîmullah
Zinde dekir mirdegan ew Îsayê Rûhullah
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

* Heceyek kêm e.

Le Muhemmed ‘eta kir rehmetê ‘alemiyan
Quran le wî nazil bû mensûx bû gişi edyan
Tewrat Encîl û Zebûr werderketin je miyan
Ta ayetê Ilahî bela biwi le cihan
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê

*Ce‘fer Qulî Bê***çare** te nedî xêrûbere
Le welatê xurbetê çere bûyî derwedere
Quranê Muhemmedî tu dexwînî ezbere
Te kişandiye qelemê mi‘racê Pêxembere
Merhemet kir Xudawend Pêxember çû mi‘racê



## 14. Dilo Tu Mewi Mexrûr

Dilo tu mewi mexrûr xirûra cewanî çû
Xezan ket le gulzarê gulê erxewanî çû
Eyyamê hewes nîni dewra pehliwanî çû
Xeyrê zatê pakê Heq herçi hewû fanî çû

Adem we renc û mêhnet me‘yûs bû je cenanê
Nûh pir kişand meşeqqet le eyyamê tofanê
Ibrahîm avîtne êr sa xerawî botxanê
Le vî dunya kes nema zebîhê qurbanî çû

Fikir ke ‘ibret bigir kanê Dawûd Pêxember
Le nigîna Silêman heft eqlîm wû mustexer
Gişti bendeyê ferman eger cin û ger beşer
We wê silsilê xwa va textê Silêmanî çû

Kanê Hezretê Ishaq je camê ezel mesrûr
Ye‘qûb je firaqê lîw* le çavan nemaye nûr
Yûsifê qemercebîn je wetenê xe bû dûr
Mehbûsê bend û zindan Yûsifê Ken‘anî çû

Le nav darê ‘er‘erê erre kirin** Zekeriya
Le nav teştê ser birîn we cor û mêhnet Yehya
Çima le dunyay fanî nema Hezretê Mûsa
Je nezerê xelayiq Îsayê rûhanî çû

* Kur, law
** Qetkirin, birrîn

Ka Hezretê Muhemmed şefî‘ê rûzê ceza
Xwadê bû xatirê wî du ‘alem kirin bena
Amorzişê ummetê je Heq dekir istid‘a
Mustemsik le nav xelkê Quran ‘etret danî çû

Ka Hesen û ka Husên ka Qenber û ka Selman
Wekîlê karxanê Heq ka ‘Elî Şîrê Yezdan
Îmamê muşkilguşa qesîmê nar û cenan
Le nav sîngê wî mexfî esrarê subhanî çû

Kanê şahê Sefewî pes kanê Şahê Tehmas
Ka Şah Sultan Husên û cennetmekan Şah Ebbas
Kanê Şahê Silêman burra çû ku we elmas
Je dunê Şah Ismaîl Şah ‘Ebbasê sanî çû

*Ce‘fer Qulî Bêçare* dewê mîna bulbulan
Xuya le rûy Milwarî mîna şevnemê gulan
Xudawenda hasil kî miday wan her du dilan
Newrûz hat û bihar e feslê zimistanî çû



### 15. Le Min Mîvan e Gurcî

Lo Aşiqo sergeşte biwîn çi can e Gurcî
Bi xûnê dil axişte aramê can e Gurcî
Bîmar dilê aşufte gûya Loqman e Gurcî
Xoşgoftar û xoşreftar şîrînziman e Gurcî
Ez qaliweke bêcan rûhê rewan e Gurcî

Gurciyek nazenîn e tûtiyek şîrînsuxen
Sîm û zerefşan zulf e bilûr serayîgerden
Hûr û perîzadek e dîlwerê sîmînbeden
Şikil kaseyê Çînî ‘eqîq û le‘lê Yemen
Serwê sehî qamet e mûrçemiyan e Gurcî

Lêvnazik e bergê gul didan boz e mîna zîf
Xalê hindû cuft û tax şikil cemal e zerîf
Dehan pisteyê xendan xatir ‘ezîz û şerîf
Qedem le ser çavê me eger ew bîni teşrif
Canê xwa dekim nisar sa ku mîvan e Gurcî

Sîngê bozê bilûr in zulfereş we pêç û tab
Mem gulor in sîv û nar her du şîşeyê gulab
Fek ennab û newat e herdu lêv camê şerab
Tawis û kebkê derî le ba wê nîne hesab
Ez aşix û perwane şem‘ê sûzan e Gurcî

Ez ‘endelîbê mest û ew qunçeyê tazeter
Ez murxek im sitemkêş ew kewûta xemzeger
Ew Gurciyek dilzinde ez musteheq û muzter
Ez bergeke pejmurde ew sitareyî seher
Ez le wesfê wê lal im şîrînziman e Gurcî

Ey Xaliqê lemyezel waqif î tu je halan
Perdepûş î tu ya Rebb asan dekî muşkilan
Ez bêçarê musteheq hemêşê zar û nalan
Nalê bulbul dexwînim şev û ro le ser gulan
Perwanê dorê we me meşewtîn per û balan
Ez aşiq û perwane şem'ê sûzan e Gurcî

Ne pir pest û bilind e bejnê yarê miyane
Le terkîwê Zulêxa le bejnê Esilxan e
Şîrîn şîrîn gep deke ew ê şîrînziman e
Kes tunîni mîna wê le ser şikl û biryane
Ez yarê xwa nas dekim le nav hûrî periyane
Ez aşiq û perwane şem'ê sûzan e Gurcî

*Ce'fer Qulî* tu Mecnûn ka Leylî nîşanê te
Tu Ferhadê kûhken î ka Şîrînzimanê te
Xelayiq ranakevin je ah û fexanê te
Hat mosimê biharê ka bax û bostanê te
Le çiyan tu bûy sergeşte ku da çû mestanê te
Tu bulbulê bostan î gulê baxan e Gurcî



## 16. Qewlê Ce 'ferê Sadiq

Îro 'eydê sultanî teze bû le xelayiq
Mesnedê hukumranî le Murteza bû layiq
Menzûrê dîn bû 'emel xwahişê dil mutabiq
Saetê şeva royê we hev bûne muwafiq
Gul vebûn le çemenan benefşe û şeqayiq
Newaxan bû 'endelîb zimanê min bû natiq
Je dilê min bûye dûr xem û endûhê sabiq

Pabend im le dunêke pir umîd û serbilind
Yêk le fikrê doletê yêk le xiyalê ferzend
Yêk xwaş e we yarê xwa yêk we lawê xwa xursend
Emma ez je her duyan bênesîb û derdmend
Le qol û qerarê xwa we dû wê bûme pabend
Ez we xem û we xuse ew we lêvê şekerxend
Me'lûm ku haka bûye qismetê min je xaliq

Ne min bav e ne bira ne min ser û samane
Ne min sebr û tewan e ne min şûn û mekane
Ne min maye 'eql û hûş ne min dîn û îmane
Le elacê derdê min peyda nawi derman e
Umîd je bende nawi umîd Heyyê subhan e
Je dû Xwadê penctenan 'Ebbasê nûcewan e
Meger ew le derdê min biwi tebîbê haziq

Aşiq bûm je roy ezel le Milwariyê bênezîr
Mîna wê kes min nedî le şah û sultan emîr
Ez fexêrê xwîncîger hef sal in bûme hêsîr
Kirme bend û zindanê bêkunde û bêzincîr
Her ku min kir şikayet we pijangan lêxist tîr
Ewê je min bêxewer ez wê nakerim je bîr
Mîna wê tune me'şûq mîna min tune aşiq

Elîf bejnê min bû dal bejnê wê serwê azad
Dilê min we derd û xem ew we şoq û dilê şad
Ew we xwa bûye hakim ez je des wê dekim dad
Husna wê û işqê min rowero dewi ziyad
Leylî Mecnûn mîna me hergiz kes naderê yad
Ne Yûsif û Zuleyxa ne Şîrîn û ne Ferhad
Ne Behram û Gulendam ne Uzra û ne Wamiq

Behrê eşqê bêpayan pir moc û pir telatum
Ez lê bûme tûfanî rahê nicat bûye gum
Meger mîna Eflatûn meskenê min bûye xum
Her şev le xewtê seher we zarî û tezellum
Dewêm hemd û senayê Xaliqê mihr û encum
Nusretekê dexazim ez je îmamê şeşum
Sahibe ‘ilme’l-yeqîn mubeyyinê haqayiq

Ya serwerê şeşomîn pir mu‘ciz û nizam î
We hikmet û falname we exbar û peyam î
Mezhebê me je te ma pir hedîs û kelam î
Mertewê min bilind ke çun tu walamiqam î
Je dû Hezretê Baqir canişîn û îmam î
We min bendê rûreş ra tu pêşwa hemnam î
*Ce‘fer Qulî ‘Endelîb* qolê Ce‘ferê Sadiq



## 17. Munacatname

Ey Xaliqê lemyezel zatê pakê qedîm î
Bexşende û ‘êybpûş hem Settar û ‘Elîm î
Rûzî dedî bendegan çun cewad û kerîm î
Le bendegan mêhreban Xwadêy ‘erşê ‘ezîm î
Sahibê cûd û bexşiş hem Rehman û Rehîm î

Ey xaliqê xelayiq ey qadirê bêniyaz
Bexşendê curm û guna le muhtacan çaresaz
Le bêkesan tu yar î qadirê bendenewaz
Curmê bende bibaxşîn ey Xaliqê sebebsaz
Rehm ke le bendeyê xwa çon rehman û rehîm î

Ey xaliqê xelayiq ey qadirê bêmesel
Je wesfê te aciz e zimanê kulli milel
Je bendegan henek kwîr henek te kiriye şel*
Je dê bavan mêhreban hem letîf û bêbedel
Rehm ke le bendeyî xwa çon rehman û rehîm î

Ya Xaliqê xelayiq ya wasi’el-‘etaya
Te sa bendê gunekar îcad kir kulli eşya
We emr û qudretê xwa xilqet kirî mihr û ma
‘Etabexşê mêhreban le bendeyî rûsiya
Rehm ke le bendeyî xwa çon rehman û rehîm î

Xudawenda çi bêjim xelayiq şermsar** in
We xiclet û rûsiya je te umîdwar*** in
Le dergay te Xwadêyo xwîn je çavan debarin
Curmê bende bibaxşîn herçend ku gunekar in
Rehm ke le bendeyî xwa çon rehman û rehîm î

* Ferc
** Heceyek kêm e
*** Heceyek kêm e

Ey Xaliqê bêbedîl ey Besîrê bênezîr
Sahibê cod û kerem raziqê tiflê sexîr
Mêhreban î le bende xisûs le ademê pîr
Pêştir ku xizan biwi xilqet dekî jê ra şîr
Rehim ke le bendey xwa çon rehman û rehîm î

Xudewenda me tune qêr ez te umîdga
Bicoz dergahê te tune le tu derê me pena
Me we gunay me megir ey xaliqê bêhemta
Tu me mubtela meke we renc û derd û bela
Rehm ke le bendeyî xwa çon rehman û rehîm î

Ey perdepûşê bende tu Settaru'l-'uyûb î
Bexşendê curm û guna hem Xefaru'z-zinûb î
Danayê razê nihan hem 'Ellamu'l-xiyûb î
Şefa dedî bîmaran hem dafi'l-kerûb î
Rehm ke le bendeyî xwa çon rehman û rehîm î

Xudawenda bi heqqê Taha û alê Yasîn
Erzaniyê nazil ke vî giraniya hilîn
Bendê te perîşan bûn ey kirdigarê Mubîn
Je rahê fezl û kerem firêwanyê tu bigîn
Rehm ke le bendeyî xwa çon rehman û rehîm î

Ey xaliqê lemyezel ey malikê mulk û cûd
Adem û cin û melek sewa te deken sicûd
Tunne le erd u 'alem bê xêr ez te tu me'bûd
Danayê razê nihan sani'ê bûd û nabûd
Curmê bende bibaxşîn heqqê resûlê Mehmûd



Ey le wesfê te kêm e sifatê cewşen kebîr
Le bêkesan tu yar î oftedeganê destgîr
Le dergay te pir guna rûsiya û pir teqsîr
Je des nefsê emmare em gişti bûnê hêsîr
Rehm ke le gunekaran heqqê resûlê Mehmûd

Barilaha bi heqê risaletê Pêxember
Bi heqqê Şahê Necef 'Elî saqiyê koser
Heqê Zehrayê Betûl heqê Şebîr û Şeber
Xwadêyo me dagirî je her şûr û je her şer
Rehm ke tu le bendey xwa heqqê resûlê Mehmûd

Barilaha bi heqqê resûlê her du sera
Heqê 'Elî û sibteyn heqê Zuhreyê Zehra
Xudaya hacetê me tu we xwa bike rewa
Me muhtac we kes nekî bi hurmetê Mucteba
Rehm ke tu le bendey xwa heqqê resûlê Mehmûd

Xudawenda bi heqê 'Elî saqiyê koser
Bi heqê Îmam Hesen şehîdê xestecîger
Xudawenda bi heqê Huseynê teşnecîger
Şefa'etê ummetê deken le rûzê mehşer
Rehm ke tu le bendey xwa heqqê resûlê Mehmûd

Barilaha bi heqê 'Elî Zeyne'l-abidîn
Bi heqê 'alimê dîn Baqir îmamê mubîn
Heqê Ce'ferê Sadiq ew şahê dunya û dîn
Xwadêyo je nav xelkê tu van belana hilîn
Rehm ke tu le bendey xwa heqê resûlê Mehmûd

Heqê Mûsayê Kazim heqê Rizayê qerîw
Heqê Şehê Xorasan îmamê we zêr û zîw
Ziyaretê wan bikî tu we xwa le me nesîw
Tu bendey muhtac nekî we ademê nanecîw
Rehm ke tu le bendey xwa heqqê resûlê Mehmûd

Heqê Teqî û Neqî şahenşehê ‘alemîn
Heqê şehê ‘Eskerî ey kirdigarê mubîn
Bi heqê Sahibzeman padişehê seqelêyn
Xudawenda kerem ke tu vî qêtiya hilîn
Rehm ke tu le bendey xwa heqê resûlê Mehmûd

*Ce ‘fer Qulî* tu mewi je Xudawend naumîd
Dunya bêitibar e le kes nemaye cawîd
Je dergayê Ilahî kes nebûye naumîd
Gişti umîdwar in je Xudawendê Mecîd
Barilaha tu rehm ke heqê resûlê Mehmûd



## 18. Min Aşiqê Hezîn Dî

Xelko ‘eceb sen‘etek min aşiqê hezîn dî
Xurşîdek le rûy asmîn yêk le rûyê zemîn dî
Cinsa adem e emma xêretê hûrê ‘eyn dî
Bêlek perî le dorê min xakisternişîn dî
Kes mîna wê tunîni min ço mah û perwîn dî

Zulfê sîm û zerefşan kakulê mislê sunbul
Pijang tîr birû kewan rû qirmiz in xunçegul
Her seher fexan dekim sewa wê mîna bulbul
Mîna wê le cihanê peyda nawi ‘eqlê kul
Çonku kêmtir nala wê le firdosê berîn dî

Xalhindû çav e cellat aşiqan deke qetîl
Fekê wê avê heyat kes rê nawe bêdelîl
Didan durr dane boz in mîna rîgê selsebîl
Çavê reş birû kewan bîvil tîx û pir şekîl
Va kaniya min şîrîntir je qend û engebîn dî

Mem enar û şemam in sîng bax û ya bostan e
‘Eqlê min je min istand we du çavê kîviyan e
Şûna min mîna Mecnûn le çolan û çiyan e
Min le dorê tav dexar da’im mislê perwane
Şe‘şe‘ê cemalê wê mîna şem‘ê zêrîn dî

Dilê min we birîn e lêvê yarê nemekdan
Eger le bihiştê wim bê wê nawime xendan
Hêsîr im le nav Şî‘e bê kunde û bêzindan
Le ser min bûye nazil derdêne derdmendan
Va bela min je ‘işqê Milwariyê nazenîn dî

Ruswa kirim ‘işqê wê hem bê‘ar û neng û nam
Rexne kiriye dînê min xab û xur* le min heram
Herçi iltica dekim je Resûl û je Îmam
Ne meqsûd dewi hasil ne rûy min dewi temam
Je dunya mi le ser xwa çun qaf û fê we sîn dî**

*Ce‘fer Qulî* dewêji va çi sirr e çi hikmet
Waweyla ku haka wi şûrê rûzê qiyamet
Heq negînî mergê min le vî welatê xurbet
Rindtir va ye ku bikem herdem şukr û qena‘et
Her çi mesleheta min Xwedê canaferîn dî

* Xwarin, xwirek.
** Meqsed ji qaf, fê û sîn qefes e.



## 19. Here Şûn û Yordê Xwa

Qehbefeleka fanî min danî le hicranê
Bulbulek mest û şêyda nawînim gulistanê
Çima kirim lamekan degerim le cihanê
Tu asarê min tune qet je nav û nîşanê
Çun bêperwa degerim le çol û biyabanê

Aşiq bûm le husna wê tûtiya şekerxa ye
Nizanim ew perî ye ya Şîrîn ya Leyla ye
Xal hindû û rû swîr e we gerdenê sera ye
Me‘lûm nîni ahûyê Çînê û ya Xeta ye
Nam cêranê Bawerdê yan çolê Şolistanê

Lêvpiste û didanboz guliyê wê du şamar in
Pijangtîr û birûkewan çavê reş pir xumar in
Des le kecegan xistim zulfê wê helqe xwarin
Eşarê çav û biryan çere canê min xwarin
We gepê xwa şîrînê ez kirime gumanê

Tîr le cîgera min xist dilê min kir parepar
Ez dîn bûm mîna Mecnûn ‘işqê kirime mest û har
Taxet le min tax bûye je min bir sebr û qerar
Wê Gurciyê tu bavê* ne wê qol e ne qerar
Kes je wan nas nekirin ‘eslê şîrînzimanê

* Lêkera avêtinê. Biavê/ Biavêj

Heray je des felekê qet min nakeri xoşhal
Çima min kir aware ez kirim bêper û bal
Dîdarê rûyê yarê sewa min newû helal
Çima da min derd û xem da yarê husn û cemal
We husnê wê min nedî le rûy giştî cihanê

Geriyam le çemenzarê dehat çi sotê bulbul
Gerdişxwar le gulzarê her mekan û her menzil
Wê şîrînê min bîn kir ew natê qunçey gul
We eşqê wê giriftar ez le nav îlê Zengil
Mîna Yûsifê Ken'an kirime çah û zindanê

Ce'fer Qulî je Xwadê bixaz dewê dilê xwa
Xwa we azmayêş bide pê biwe we eqlê xwa
Terkê vî şûna bike here şûn û kelê xwa
Herkes mehel dagiri feraxur we 'eslê xwa
Xafil mewi satekê je 'eslê wê Şaycanê



## 20. Çiyayê Hezar Meçît

Xudawenda le ser min 'eceb şûr û nişûr e
Adem pir le vî çiya we xwa dewi mexrûr e
Mislê cennetê firdos we zoq û we sirûr e
Çar teref nezer dekem gûya lom'eyê nûr e
Meger zatê pakê heq le vir Heyyê huzûr e

Je vir tê bîna muşk û 'etriyat û zencefîl
Avê kaniyan rewan e mîna nehrê selsebîl
Meger le vir qedem xist mu'ellimê Cibreîlhu reh
Gûya le vir nazil bû hem Torat û hem Incîl
Furqana Muhemmed hem kitawa Zebûr e

Ser kişandiye felekê nizanim çi çiya ye
Ya Elburz e ya Irem ya Cûdî ya Sîna ye
Hekîm giştî têne vir ew şûna kîmiya ye
Je wê temaşa dekim Çiyay Şaycanê xwa ye
Her çi ez fikir dekim ne Qaf û ne ku Tûr e

Pir we gul û giya ye hem we berf û baran e
Demawend û Serandîb Uhud le cem hêran e
Aledax û Bînalûd yetîmê wer destan e
Gumiş Çiyay Kişmîrê hem Şimran û Lubnan e
Şek nîni ger biwêjim we xwa Kûhî Bilûr e

Me'lûm bû qudreta Heq le vira bûye nazil
Miradê gişti xelkê le vira dewi hasil
Herkes ku bawer neke karê wî dewi batil
Sa ku le rûya berê 'Elî sahibê Duldil*
Le sefera Xawerê je vir kiriye 'ubûr e

Lo Xaliqê bêzewal Xudawendê mubîn î
We ser 'eywê bende ra perdê dadekişînî
Ger aşkar û ger nihan tu her duyan dewînî
Her derê du aşiq in zûtir wan we hev gînî
Sa ku kesê şêda yî bêqerar û hedûr e

Min bay da bêlek** perî evel Gulcana Esmer
Fatima sîmînbeden hem Şaycan û hem dilwer
Sinowerê ez kirim je milkê xwa derweder
Milwariyê min we min de bi heqê 'esna 'eşer
Ta kînga Ce'fer Qulî bike şukr û sebûr e

* Navê hespê Hezretê Elî
** Birrek



## 21. Mulemma*

Dilwera min min le te carê nezer kir bê melal
Natira Mecnûn je min bêgane bû eql û kemal
Aq yûzûnde xal-i Hindû nukte koymuş zulcelal
Leblerinden neyşeker damler nebat û qend û bal
Yêk nezer ber men fêken ey Xosrowê ferxunde fal

Biriyê te qosê qezeh pijangê te şerr û şûr
Lêvê te le'lê bedexşan singê te nalê bilûr
Tu we vî husna, perîzad î nizanim ya ku hûr
Cânımı pervanetek yaxdin we te ey şem'-i nûr
Mêsrêyan ra kerdê şeyda, Yûsofê sahêb cemal

Lêv tunikê piste fek didan hûrê şox û şeng
Je feraqê te nemaye le rûya min av û reng
Wesfê husnê te bela bûye le Rûm û le Fereng
Baxrimi baxrimi buryan qilûp 'aşqin mene virdî xedeng
Ba qem û mêhnet qerînem kerdêyî ey bî-mêsal

Dilwera kes mîna te tune le tu mulk û weten
Ne Semerqend û Buxara ne le Çîn û le Xoten
Qendehar û Kabul û Keşmîr û Lahûr û Yemen
Gozlerînden orgenûp cadû-yi Babil mekr û fen
Yêk nêgahet mînemayêd 'alemî ra payêmal

* Weke ji navê helbestê jî diyar e ev helbesta Ce'fer Qulî di şêwaza mullemayê de ye. Di vê xezela xwe de Ce'fer Qulî ligel kurdî cî daye beytên azerî û farsî jî. Ev şêwaza mulemmayê ji aliyê gelek helbestvanên klasîk hatiye bikaranîn.

‘Enberîn zulf û şekerleb gerdenê te sîmê xam
Bejnê te serw û le rêçûyinê çû kebkê xoşxeram
Le gulistanê Irem tûtî zimanê xoşkelam
Men feqir bulbul kîmin efxan çeker men subh û şam
Şod elêf qedem zê ‘eşqê rûyê to manendê dal

Aferîde kes nekiriye Heq mîna te dilruba
Ne Zilêxa û ne Gulşa ne Şîrîn hûrî liqa
Çima tu le ‘aşiqê xwa nakerî mêhr û wefa
Barçe gözleri kevakib sen qamer sen ya ki şa
Xêtmetet xahem rêsem lakên nebaşed per û bal

El-Xerez *‘‘Ce‘fer Qulî’’* ‘işqê wê te Mecnûn deke
Je xur û xab û je fehmê ademî bîrûn deke
Gerdişê çerxê felek dilê te pir xwîn deke
Murteza heqî gêce gûndûz menem fikrim budur
Ta cêhan bada hemî xorşîdê ‘omret bîzeval



## 22. Kaf û Mîm û Rê

Ger te yarê Xwadê bikerî nesîb
Le hemêz kem carê kaf û mîm û rê (kemer)
Kemer barîk bilûr rûyan ramîsim
Le des xwa bipêçim zê û lam û fê (zulf)

Zulfê te dirêj in kemenda kiyan
Orka* dil bede wan le fesla çiyan
Dilê min biriye wan çav û biriyan
Qunçe û xendan in her du lam û bê (leb)

Lebê şekerşiken e te nazenînê
Serşikla gulgûn e te mehcewînê
Bulbul şeyda bûye jê ra dexwînê
Le fekê boz dekin sat û dal û fê (sedef)

Sedef durrdidan in milwarî Emman in
Yaqût û zumrûd le‘l û mircan in
Her du mem enar û lîmo û nişan in
Qunçegula baxê cîm û nûn û tê (cennet)

Cennet mîna baxê sîngî te xoşreng e
Gula Isfehanê çeka hefreng e
Serayê gerdenê te yê qeşeng e
Mecnûn î te cîm û ‘eyn û fê û rê (Ce‘fer)

Ce‘fer îro je xemê te we der da
Mîna qurquşûmê bû ber da
Birînê dilê xwa îro we der da
Meded dexwazi je ‘eyn û lam û yê (Elî)

* Di kurmanciya Xorasanê de bi wateya hefsar dirêjkirinê de ye.

## 23. Şîrê Yezdan Ya ‘Elî

Evvel iptida dekim we zimanî pir guna
Dewêm hemd û senay Xaliqê erz û sema
Qudreta wî îcad kir kull şey‘î masewa
Ta Mustefa bû zahir ‘Elî bûye rehnema
Le wesfê wî nazil bû sûrê pakê heleta
Mehremê sirrê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Xakê adem te kiriye we destê xwa ecîne
Ta hikim bû secde ken melayîkê emîne
Tekebbur kir Ezazîl* je wê bûye leî‘ne
Je dergay Heq rande wû bûye duşmenê dîne
Daxil bû le dilê wî buxz û endûh û kîne
Mehremê razê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Tuş tunewûye xêrez Heq ne zemîn ne asman
Ne ‘erş û loh û kursî ne hûrî û ne xilman
Ne cennet û ne dûzex ne koser û ne rizwan
Ne mela’ik peyda bû ne Behram û ne Kêwan**
Wicudê te zahir wû ya ‘Elî Şahê Merdan
Mehremê sirrê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Te le ezel girêda du destê dêwê kafer
Dêwê kûhê Qaf mane gişti rencûr û muzter
Je Adem ta Muhemmed sef kişandin seraser
Ta vexwin ew camek av je des saqiyê koser
Em nika we gune nê je me mewi mukedder
Mehremê sirrê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

* Şeytan.
** Navê stêrkekê ye.



Ya Emîru’l-mu’minîn tu yê muşkilguşa yî
Ge le rûyê zemînê ge le ‘erşî e‘la yî
Ge le ‘alemê xeyb î gahî le vî dunya yî
Tu we xwa sirrellah î tu we xwa yedullah î
Le rûze meydanê ceng bêhemta lafita yî
Mehremî sirrê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Ge le paş perdê dewî hem zimanî pêxember
Ge sêv dekî du nispan we destî xwa xezenfer
Gahî tu bac destînî je resûlê mutehher
Herçi dexwazî bixaz Heq te nake mukedder
Herçi teleb bikî tu rewa dewi serbiser
Mehremê sirrê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Derxwastêne Pêxember gişti je Heq rewa wû
Je canibê Xudawend curme ummet ‘eta wû
Sê hezar mesele go metleb Şîrê Xuda wû
Pêxember mat û hêran je wesfê te aga wû
Je teamê bihiştê we te ra hemqeza wû
Mehremê sirrê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Ge dekevî tonê şêr rê le Nebî degirî
Tu le esmanê çarom pêşê wî dadegirî
Ge le nemazê Xatem sewa sail dederî
Ge je resûlê Xwedê engulûsk hildegirî
Her ku here pêxember tu pê ra hemsefer î
Mehremê razê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Ge le deştê Erjenê necat dedî tu Selman
We des şêr ew giriftar we feryad û elaman
We Zulfiqarê duser ta le wî bûy tu ‘eyan
Zêxêm bûye firarî ta Selman xelas kir can
Feryadresê bêkesan ya ‘Elî Şîrî Yezdan
Mehremê razê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Ge sewa zewacê te sitare dewi nazil
Fatime we emrê Heq le ba te deke menzil
Xudawendê mêhreban rewa kir meqsedê dil
Miradê te û Zehra le wê şeve bû hasil
Le reqîbê te bûye şeker zehrê helahil
Mehremê sirrê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Le hicretê pêxember te canê xwe kir feda
Le şûnê wî raketî ey şahê muşkilguşa
Nagah dorê te girtin wan kafirê bêheya
Le wê şevê zulmanî berpa wû şûr û xoxa
Ta ne‘rê te bilind bû duşmen revî çu rûba
Mehremê razê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Zerbetê yomê Xendeq je des te ey xezenfer
Le wê rûyê karisaz sa Islam bû kariger
Kete xakê mezellet le wê Emr* û dilawer
Sa ku tu xafil newî je zikrê Ellah Ekber
Loma ew zerbetê te we dîn ra bû berawer
Mehremê sirrê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Le Uhud işkênandin didanê pakê resûl
Eshabê wî perîşan bûne mecrûh û meqtûl
Le Medînê Fatime çav le rê û dilmelûl
Te we şuca‘etê xwa şikest da qewmê cihûl
Je canê xwa tu ret bûy şehadet te kir qebûl
Qudretê Yedullah î Şîrê Yezdan ya ‘Elî

* Emr ibn-eI Ebduwed yek ji şervanên şerê Xendeqê bû ku bi destê xelîfe Elî hatiye kuştin.



Te pêxember da nicat je des kafirê bêdîn
Hemze le wê şehîd bû Pêxember bû dilxemîn
Ger wicûdê te nawû berpa nawû emrê dîn
Yawerê pêxember î Emîr î le mu’minîn
Lafeta illa ‘Elî dego Cibrîlê Emîn
Lafeta û hel‘eta Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Wesiyê pêxember û hem molayê Qenber î
Tu yî Şîrî sefşiken hem qatilê ‘Enter î
Gahî le hêlanekê tu şahê ejder derî
Ge le rûzê qiyamet tu şafi‘ê mehşer î
Ge qatilê Merheb û ge fatihê Xeyber î
Mehremê razê Xuda Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Barilsaha bi heqê pêxemberê muteher
Bi heqê Fatimê û ‘Elî Şebîr û Şeber*
Bi heqê Zeynu’l-ibad hem Baqir û hem Ce‘fer
Bi Mûsa û Reza û Teqî Neqî û ‘Esker
Tu sahibe me bigîn çunku rûreş e Ce‘fer
Feryadresê bêkesan Şîrê Yezdan ya ‘Elî

Evvel û axir ‘Elî zahir û batin ‘Elî
Xêr ez te tune umîd ya Şahê Merdan ‘Elî
Ummetê pêxember im mezhebê min î Ce‘ferî
Şevê evvelê qewrê je destê min bigirî
Şermende pir guna ye *Ce‘fer Qulî Zengilî*
Şafi‘ê rûzê ceza Şîrê Yezdan ya ‘Elî

* Husên û Hesen

## 24. Silêman û Bilqês

**1.**
Silêman Hişmetulah rûnişt le textê şahî
Perende lê sayewan je qudretê ilahî
Je canibê xurşîdê roşinayî pê dayî
Silêman nezare kir şûnê Hûphûp nemayî
Je rûy xeşmê qesem xwar we celalê ilahî
Zecrekê le wê bike xewer gê gaw û mahî
Ferman daye perendan hûn herin biken peyda

**2.**
Silêman go: Ey ‘uqab ey celadê tîzbal
Forî werkev le redê tu hergiz meke ihmal
‘Uqab rawû bal kişand le cengel* û kûh** û kal***
Hûphûp peyda kir haniy Silêman jê kir sual
Xoşxewerek hanîwû dil je wê nekir melal
Herçi wê pirtir dego Silêman dewû xoşhal
Silêman aferîn go le wê murxê xoşnewa

**3.**
Hûphûp ‘erz kir pêxember ez çûme şehrê Seba
Ew çi şehrek munewwer mîna firdosê e’la
Xakê wê ze’feran û bedexşan û tûtiya
Le çar feslan behar e hemêşe gul û giya
Gişti sevz û xurrem e çol û cezîr û çiya
Keçikek le wê sultan e wê tune tûş û hemta
Ser dadeweşîni ew her ro le xurşîd û ma

* Daristan
** Çiya
*** Newal



**4.**
Silêman name da go: Hûphûp to rewan biwi
Evvel serê vî nama Rehîm û Rehman biwi
We Bilqês ra bê were bendey Yezdan biwi
Terkê roj û hîvê ke were misilman biwi
Îro je kirdeyî xwa were pişêman biwi
Ger we gepê min nekî amadey mêdan biwi
Text û bextê te gişti le satê dewi fena

**5.**
Hûphûp name hilanî çû gîşte payê menzer
Je kungirê qesrê wê manendê badê serser
Warid bû le xewê dî Bilqês nîkexter
Name le ser sîng danî we balê xwa kir xewer
Bilqês rabû je xewê mislê telayê ehmer
Le namê temaşe kir xêlek bûye mukedder
Ferman da zû hazir ken gişti wezîr wuzera

**6.**
Le wê derê hazir bûn mezinan û wezîran
Nukte nukte wan xwandin je kaxazê Silêman
Je mezmûnê wê namê ewana mane hêran
Wan ‘erz kirin le Bilqês kêvaniya kêvaniyan
Eger ecaze bidî deşîninê xelatan
Rewan kenî çen tofan* qerînê ‘eqlê sultan
Bilqês bûye şadiman pe wan re go: Merheba

* Xelat

**7.**
Hûphûp forî va remza hanî daye pêxember
Sê roz e qasid têne ey şahê cin û beşer
Tofe sa te ra tînin ey şahê nîkexter
Hef perde awîzan in je wan hef şede goher
Hef xiştê zêrîn tînin hef je yaqûtê ehmer
Hef meşk û kafur tînin hef textê kevir mermer
Silêman go: Hazir ken Asif ibnê Berxiya*

**8.**
Silêman go: Asif dêw û periyan xewer ke
Çar fersengê qesrê min gişi kevirê mermer ke
Je rûyê kevirî mermer da rûkêş tu zîv û zer ke
Hezar perde awîzan tiji le'l û goher ke
Istexrekê bena ke tijî avê koser ke
Hewesê malê dunê je sere wan bi der ke
We fermanê Silêman ewana bûne bena

**9.**
Sê roze ku tewabûn qasid bûne nemayan
Je şewketê Silêman sergerdan û heyran man
Je hanînê tofê xwa bûne pûr û pişêman
Tofe le wê terkandin des we sîne bûn rewan
Le xidmetê Silêman du'a û senagûyan
To 'uzrê me qewûl ke ey rêwerê ins û can
Pir pir şandiye selam banûyê şehrê Seba

* Li gorî rewayetan Asif ibnê Berxiya zavayê Silêman e.



**10.**
Silêman rû le wan kir ey qasidê bêçare
We çavê xwa dewînin sipahek bê şimare
Perende le rûy asmîn sa min ra perestar e
Bi qedrê cayê sûzen xurşîd naguzar e
Je qudretê min nîni je qudretê Qehhar e
Nîşanê qudretê Heq le her ku aşikar e
Hef rûze muhlet dedim herin hûn biken sela (h)

**11.**
Qasid pûr û pişêman je wê dere vegeriyan
Tarîf kirin sa Bilqês je celalê Silêman
Textê wê* le rûyê hewê perende lê sayewan
Wehş û teyr û cin û ins giştî jê dewin ferman
Tune qudret le dunê çun qudretê Silêman
Eger tu ruxset bidî bişîninê mu'cizan
Axir wan qerar danîn vî kara bikin icra

**12.**
Mezinêne wan gotin mu'cizan deşîninê
'Ilm û me'rifetê xwa pe wan denimîninê
Denêk almas ba kun ke we riştê hilkişînê
Ew şûşêk av bişîni ne je asman zemînê
Çend qulam û kenîze mîna hev deşîninê
Ta wan je hev cuda ke je rûyê 'ilm û yeqînê
Eger ew pêxember wi dewêji vî cewawa

* Mebest Silêman e.

**13.**
Mu’ciz gîşte Filistîn Silêman go: Hazir ken
Sa helê vî muşkila rû le dergay qadir ken
Hûn kurmeke bê hestî je bin herdê peyda ken
Je kah û bêde îşev axurê hespan pir ken
Le destê kenîzan û qulaman hûn nezer ken
Je rûyê pencê destê wan keçik lawkan cuda ken
Hînga rû kir Silêman le Asifê Berxiya

**14.**
Silêman go: Hûn Asif dêw û periyan xewer ken
Ta hespan birevînin xûyê we ser wan werken
Xûyê je wan bigrin çend şûşêkê hûn pir ken
Hûn le berê vî kurma denê almas hazir ken
Kun deke ew we zimîn nexekê hûn jê der ken
Qasidan jî xewer ken we çavê xwe nezer ken
Cewawê xwa hilînin vegerine Şehrê Seba

**15.**
Qasidan cewaw hanîn le Bilqês kirin izhar
Ew le dil bû misilman je dînê xwa kir inkar
We kenîz û xulaman je mulkê xwa wê kir bar
Rû le yurdê Silêman we rê ket bê ixtiyar
Şemalê va xewera le Silêman kir ixtar
Bilqês we xatirê te je tac û text kir ferar
Piyade têye cem te ew ba dilê ba sefa



**16.**
Silêman go: Ey Asif le tuştek we niyaz im
Forî je Şehrê Seba textê Bilqês dexwazim
Je canibê Xuwawend* va emra bûye lazim
We hukmê ismê e‘zem le dunê karsaz im
Îro le rûyê zemînê sultanê bê embaz im
Le beraberê Bulqîs** serferazî dexwazim
Bêdireng hazir beken textê Bilqês le vira

**17.**
Dîvek rawû go: Ta rawî je şûnê xa
Silêman go: Dereng e kî zûtir tîni vi ra
Asif go: Ez tînim le turfetu’l-‘eyn bi ca
Silêman ta çav işkand text hanî nav barga
Silêman aferîn go: Le Asif Berxiya
Cin û ins û perîzad hêran man le vî kara
Çav le rê man biwînin banûyê Şehrê Seba

**18.**
Nagêhan je demanê*** gerdek rawû le hewa
We rêcê da dehatin we dû hev şah û sipa
Bilqês bûye nemayan we bejn û balê re‘na
Hêran û sergerdan ma le karê Hêşmetula
Rengê rûyan bû gulgûn wextî ku dî textê xwa
Silêman xoşamed go: Le wî**** yarî bêhemta
Ceşn û şadî wan kirin hef şevanero bi pa

* Xwedavend
** Bilqîs
*** Quntar
**** Wê

**19.**
Hûphûp pêykî xoşxewer va metlewa rewa kir
Du dilan giyande hev heqê metleb eda kir
Silêman da sêri tac xoşhal û xoşnewa kir
Hezar û sîsed û çar* min vî benda inşa kir
*Ce‘fer Qulî* tu biwîn qeza qeder çiha kir
Le dunê wefa tune Silêman jî fena kir
Xwadî bigî dadê te le axiret û ‘uqba

* 1304 hq. amaje bi vê yekê hatiye kirin ku ev helbest di vê tarîxê de hatiye nivîsîn.



## 25. Silêman û Bilqês

Royek le ser besatê rûniştiwû Silêman
Wehş û teyr û cin û ins gişti mutî‘ê ferman
Têr û tû we perrê xwa le ser bûne sayewan
Dî tavê avêtiye ser besatê nagihan
Hewale temaşa kir ta Hezretê Silêman

Dî ku Hudhud tunîni le şûnê xwa berqerar
Go: Eger Hudhud bêwi dekûjime xar û zar
Ya ku wê ‘ezab dekim we ‘ezabê nagiwar
Ta ku ‘ibret bigirin xalayiqê rûzigar
Sa ku le hev nekevi nezmê mulkê Silêman

Hema eger ew bêwi xoşxewar û xoşnewa
Curmê wê debaxşînim je rahê sidq û sefa
Pes rû le ‘uqabê kir ey serhengê bawefa
Zû Hûphûpê peyda ke mînê çi ye macera
Forî ‘uqab werket çû je xidmetê Silêman

Nageh ‘uqab û Hudhud daxil bûn her du xoşdil
Silêman je wê pirs kir: Ey Hudhudê qewîdil
Çima je ser xidmetê îro bûyî xafil
Meger je min netirsiyay te cur‘et kiriye hasil
Ger xewerek xoş nedî te dekuji Silêman

Hûphûp ta va gepa bîst erz kir: Eya Pêxember
Tu le xwe mewi mexrûr we kar nê zor û zîwer
Va dunya serayek e karwan deke guzer
Je adem rind û kûtî le dunê demê eser
Ez we xwa afatek im sewa textê Silêman

Ez tereme nav avê le wê dewim xûtewar
Terme zemînê wexmî* je xakê wê dekim bar
Dadeweşînim xakê le textê te berqerar
Je hurmetê wê xakê ta ku biwî tarûmar
Beden lê bûye lerzan va gepa bîst Silêman

Silêman newaziş kir Hudhud go: Nebiyula
Min îro hûphûpek dî je cinsê xwa çi zîba
Sihbetkunan em çûnê gihiştine Şehrê Seba
Min dî milkek basefa jinek le wê padişa
Gûya ku ew xafil e je hişmetê Silêman

Çi şehrek we sefa ye we hesar û we derbend
Navê padişê Bilqês jineke we zerabend
Perestişê xurşîdê deke bicoz Xudawend
Sahibê xêl û heşem we leşkerê serbilind
Weqe Hudhud tarîf kir ta mayil bû Silêman

Pes hezretê Silêman we şoq û zoq û sefa
Forî name niwîsî we mezmûn û we inşa
Hînga rû le Hudhud kir: Ey qasidê bawefa
Vî nama hilîn biwe bigîne şehrê Seba
Ta rast û derewê te me‘lûm wi le Silêman

Namê hilîn tu biwe ey Hudhudê serweşûr
Bavîje ser textê wê we xwa bisekin le dûr
Herçî dewên guhdagir** biwîn ta çi ye menzûr
Bidûnê kêm û zêde tu bike ‘erzê hizûr
Ta ewana aga win je hişmetê Silêman

* Weqf
** Guhdariyê bike.



Hûphûp name hilanî perwaz kir rû le Seba
Çû gîşte meqsedê xwa ew qasidê bawefa
Bilqês je ser textê xwa dî murxeke xoşnewa
Je nikilê xwa avît namêk le nav bariga
Hûn biwînin çiha kir Hûphûp pêkê Silêman

Bilqês name hilanî we şoq û zoq û xendan
Dî name nivîsîne je caniwê Silêman
Evel we navê Xwadê qadirê heyy û subhan
Je dû wê ger tu nêwî le vir newî misilman
Filitîne te tune je qudretê Silêman

Ta ku Bilqês name xwand lerizî temam ebdan
Hestiyê wê je hev kişiyan bû qaliweke bêcan
Rû le wezîrê xwa kir: Ey wezîrê suxendan
Werin hûn biden cewaw vî kara megrin asan
Çi cûre reftar kenê le hemerê Silêman

Wezîran bûne hemqol we serhenganê sipa
Gotin: Le me mezin î tu yî le me qiblega
Her çi tu ferman bidî em mutî‘ê emrê şa
Zor û quwwey me pirr e je kes me tune perwa
Em ‘eslen natirsinê je hêbetî Silêman

Je rahê ‘eql û daniş Bilqês go pe wezîran
Ger qûşînkêşi* biwi memleket dewi wêran
Pamal dewi re‘iyyet xalayiq dewi bêcan
Weren em bişîninê çend neferek suxendan
Tofe û soxat biwen le xidmetê Silêman

* Destpêkirina şer û şandina leşkeran.

Îlçî heren halî win je her xêr û her şerre
Çend mesalan pirs biken ta ew biden xewere
Cewaw dede elbette eger ew pêxember e
Hef perdê milwarîdûz îlçî hilîni here
Hem îlçî cewaw dewen je me sewa Silêman

Hûphûp forî vegeriya hate hendê Silêman
Herçi ku wan gep kirin axir evel kir beyan
Çend nefer îlçî têne danişmend û suxendan
Çend mesalan pirs deken ta dekerin imtihan
Je wez'ê Şehrê Seba çûn halî bû Silêman

Silêman go: Tu Asif dêv û periyan xewer ke
Çar terefê qesrê min gişti kevrê mermer ke
Je rûy kevrê mermer da gişti nuqre û zer ke
Sê roze qasid têne yêk yêk vana hazir ke
Asif çû ku icra ke wan fermanê Silêman

Silêman le ferraşan hukim kiriye we hêwet
Besat û bargayê min hûn giştî biken zînet
Xiştê zêrîn ferş biken pirr we nezm û nezaket
Perdêne milwarîdûz delingaz ken heft we heft
Ta ewana biwînin seltenetê Silêman

Sê ro je vî ara çûn îlçî bûne nemayan
Ta ku ew besata dîn bûne mebhût û hêran
Je hanînê tofê xwa bûne pûr û pişêman
Tofe le wê terkandin des we sîne bûn rewan
Du'a û senagûyan le xidmetê Silêman



Îlçiyan we sed xicalet daxil bûn le bariga
Selam kirin we 'edep du'a hanîne bi ca
Je dû du'a û sena kirin 'erzê mudde'a
Şêst nefer kenîz xulam je hev tu bike cuda
Meselê xwa 'erz kirin le xidmetê Silêman

Go: Xulam û kenîzan yêk we yêk biwin daxil
Keçik lawikan sêwa kir miradê wan bû hasil
Herçi ku wan pirs kirin cewaw da bûne xoşdil
Gişti muşkilêne wan le wê derê kirine hel
Îlçiyan te'eccub kirin je hişmetê Silêman

Îlçiyan go: Silêman ey sultanê mulk û dîn
Mertewê te bilind ke Xudawendê 'alemîn
Tu sewa padişay me kodêk je avê bişîn
Ne je avê zemînê ne je avê asimîn
Sa meqsûd biwi hasil çû fikretê Silêman

Go: Hespan birevînin ta ku ew xû biderin
Xûyê hespan hûn bigrin qedêkê tiji kerin
Ta sewa padişê xwa je wê avê biwerin
Sifrê daynîn ta mîvan xurakê xwa bixwerin
Îlçiyan xwarin xurak le besatê Silêman

Îlçî bûne murexes çûne pûr û pişêman
Je hatina xwa gûya gişti bûne nedaman
Je dû wan Silêman go: Ey tayifê ins û cin
Ez şexsekê dexwazim pirr quwwe û pehliwan
Textê Bilqês hazir ke le dergahê Silêman

Dêveke qewîhêkel ‘erz kir: Ya Nebiyulla
Icaze bide çakir textê wê tînme vira
Te je şûnê xwa rawî direng nakerim ‘esla
Le vî kara tunîni tu gune çun û çira
Çun sahibê qudret im je qudretê Silêman

Asif ibnê Berxiya ew pîremerdê mahir
‘Erz kir: Ya Nebiyulla icaze bide çakir
Çavê xwa bigrî vekî textê wê dekem hazir
Le vî kara tunîni tu cadû û tu sahir
Je lutfê Xudawendî je şoketê Silêman

Pêştir ku Bilqês bêwi textê wê kirin hazir
Ta ‘eqlê wê me‘lûm bi le xelkê giştî zahir
Çun dêvan dego: Dîn e tûnîni ‘eqlê wafir
Xaniyek je şûşê çêkir cûwêk le wir kir dayir
Cû tiji avê rewan kir hezretê Silêman

Bilqês û pe wezîran tê kirin rahê dûre
Gîşte Bêtu’l-muqeddes payê qesrê bilûr e
Xiyal kir va derya ye biwîn çi qeder kûr e
Saqê wê nemayan bû paçê xwa daye jûr e
Çunku bedgû’iya wê kiriwûn le ba Silêman

Xerez be‘d ez imtihan Bilqêsê nîksîma
Hate henda Silêman we şoq û zoq û sefa
Xû debarî je rûyan çun dekir şerm û heya
We xicalet û qeza ‘erz kir: Ya Resûlla
Ta îro ez xafil wûm je şoketê Silêman

Je Xadê ez xafil wûm ey Resûlê kirdigar
Min le xwa û nefsê xwa kiriye zilm bisiyar
Min Xudawend nas nekir le dergay wî şermsar
Rûsiyah şermende me le cem Xwadê gunehkar
Xwadê tofîq daye min je himmetê Silêman

Kelîmî we min ra bê ta ez biwim misilman
Ta dilê min saf biwi je kufr û şirk û ‘usyan
Dilê min roşen biwi je me‘rifetê Yezdan
Ta îro ez xafil wûm je Xellaqê ins û can
Bilqês bûye misilman we de‘wetê Silêman

Xerez ku misilman wû Belqêsê nîkmunezzer
Adabê misilmaniyê hêvosî* je xêr û şerr
Sewa ‘eqdê Bilqês ra meclis kirin munewwer
Sa ku newi çavîni şewitandin ‘ûd û ‘enber**
Rûnişt le sedirê meclis Bilqês le ba Silêman

Icaze hasil kirin je Bilqêsê nazenîn
Sîxê ‘eqdê carî wû we qanûnê şer‘ê dîn
Herdu des we des kirin manendê mah û Perwîn
Xerez ku je baxê hev ew her du bûne gulçîn
Gîştine miday dilê xwa Bilqês û pe Silêman

Barilaha bi heqê Silêmanê Pêxember
Bi heqê Şahê Necef ‘Elî saqiyê koser
*Ce‘fer Qulî* dagirî je her şûr û je her şer
Wî muhtac we kes nekî bi heqê Isna ‘Eşer
Milwariyê we wî gînî çun Bilqês û Silêman

---
* Hîn bû.
** Ji bo ku nezer nebe ‘ud û ‘enber şewitandin

## 26. Nizanim Perîzad î ya Hûriyê Rizwan î

Subhdem guşûde bû je çehreyê lem‘anî
Muberra dekir afaq je sewadê zulmanî
Şemsê enwer tali‘ bû dunya kire nûranî
Le ba husnê te xicil xurşîdê asimanî
Kes tunîni mîna te le tînetê insanî
Hêran ma ‘eql û beser le sen‘etê Yezdanî
Nizanim perîzad î ya hûriyê Rizwan î

Çavê te du badem in her du nergis û cadû
Je fikrê min narene bûne xezal û ahû
Gerdenê te serayî xalê rûyê te hindû
Du sumbulê teze ne mişk û ‘enber in gîsû
Pijangê te xedeng in mislê keman e ebrû
Sîngê te mîna bilûr her du memê te lîmû
Nizanim perîzad î ya hûriyê rizwan î

Keçegê te çakil in guliyê reş in berawer
Biryêne te kewan in rengê rûyê te esmer
Çavê mîna xezal in pijangê te çu xencer
Her du lêvê te qunçe didanmircan û goher
Fekê te avê heyat şerabê hozî koser
Le gepkirinê şîrîntir je tûtiya suxenwer
Nizanim perîzad î ya hûriyê rizwan î



Zendê boz e xetayî pêçiyê te zêr û şûşe
We bejn û bala re‘na je min bir eql û hûşe
Je des te hemnişîn wûm we têr û pe wehûşe
Mîna ewrê biharê dekişînim xurûşe
‘Işqê te ez kirime we qem ra hemaxûşe
Mîna Behram le Çînê sate bûm nemedpûşe
Nizanim perîzad î ya hûriyê rizwan î

Je derdê te bêqerar şev û ro dekim feryad
Le ba te gunekar im tu sitemkar û celad
Le halê mi tu rehm ke navziravê çu şimşad
Ya min bikuj xelas ke ya je qem bike azad
Mîna te je roya ezel kes çênekiriye ustad
Carê tu qehqêkê lêx vî dilê min bike şad
Nizanim perîzad î ya hûriyê Rizwan î

Tawisnîşan perîzad mirim je feraxê te
Dil je te va navirim ez bendê desbaxê te
Şev û royê le çiyan degerim suraxê te
Her kes ku te biwîni ta qiyamê daxê te
Sîngê te baxê Irem ez bulbulê baxê te
Hûriya baxê cennetê aişq û muştaqê te
Nizanim perîzad î ya hûriyê Rizwan î

We Milwariyê ra biwên rawi je baxê xurûr
*Ce‘fer Qulî Bêçare* îro je te bûye dûr
Ne le sêri maye hûş ne le çavan maye nûr
Ne le juniyan ma quwwet ne le dil maye hedûr
Rengê gulgûn bû zelîl sewa te bûye rencûr
Mîna Leylî le Mecnûn carekê bike ‘ubûr
Nizanim perîzad î ya hûriyê rizwan î

## 27. Şukrê Zulcelal

Herdem lehze bi lehze sed şukrê zulcelal e
Eda kiriye le min xisletê bê misale
We fezîlet û şeref kirime yar we hevale
Je lutf û keremê xwa kirime ferxundefale

Le batin kîmiya ye le zahir mislê mecnûn
Pak kiriye parsa xaliqê ferdê bêçun
Erestû lê murîd e çakire lê Eflatûn
Merheba şukrê Yezdan va çi husn û kemal e

Va çi qamet e dilcû manendê serwê azad
Va çi xoşxoy û xulq e hergiz kes naderi yad
Sahibê husnê alemê şagird in û ew ostad
Ehsenullah şukrê heq va çi şikl û cemal e

Çi rûziyêk bê hed e da min xaliqê ekber
Çi lefzeke şîrîn da manendê qend û şeker
Eger ez bihêjmirim şumare nawin huner
Gişti le min eta kir kerîmê layezal e

Nînim je Heq rencîde je rûziyê alemê
Xusûsen le şa'irî kişandiye we qelemê
Hêf ku je baweteke xerq kiriye le nav xemê
Çima ku ez kêmşans im tune bext û iqbale



Tezîmê xelkê dekim daim we uzirxwahî
Tenê dost û duşmenan giyandime tebahî
Çi biwêjim xwadêyo tu yî we xwa gewahî
Dewêm je viya wêdatir min meke paymale

Va çi sirr e çi hikmet felekê kirime biryan
Va çi cewr e muşeqet le wê tunîni payan
Va çi derdek giran e je sûzê wê eleman
Hêstiran ez derêjim je çavan mislê jale

Şukur mîna min tune zîba re'na û cewan
Daye min ilm û huner hem ibadet û îman
Nîzik kiriye heq le min dûr kiriye je min şêtan
We sebr û we sukûtê daim kirime heval

Ya rebb bi heqê Elî bext û tali' eta ke
Miradê *Ce'fer Qulî* je lutfê xwa rewa ke
Canê min şewtandiye vî narê sûznake
Ret meke je viya wêda tu le min hîv û sale

## 28. Xanezadê Beytu'l-heram Ya 'Elî

Je ezel kes nebû bixêyr ez me'bûd
Je ezel we Heq ra hemdem ya 'Elî
Le 'alema xêyb û iqlîma şihûd
Le sirra îzedî mehrem ya 'Elî

Ne zemîn ne sema ne 'erş û felek
Ne wehş û teyr hewû ne ins û melek
Qab û qosêyn je tunewînê bûne hek
Wucûdê pîş je ketmê 'edem ya 'Elî

Ne mêhr û mah hewû ne xuld û cehîm
Ne Sidrel-Munteha ne 'erşê 'ezîm
Ne subh û ne şam û enfasa nesîm
Yedellahê le loh û qelem ya 'Elî

Ne qemer wû ewel le heftom êwan
Ne 'Etarud* peyda ne Zuhre** 'eyan
Ne Şems û Behram Bircîs û Kêwan***
Le deftera kullan reqem ya 'Elî

Şeş mahe ender mehdê du nîme kir ejder
Muzeher ul-'ecayib je wê bû Heyder
Qedem danî le ser pîla pêxember
Butxane je wî bûn 'edem ya 'Elî

Sewa pêxembaran bû nûrê sifat
Je tufêla wî bû heyat û memat
Le deşta Erjenê da Selman necat
Esad kuşt we tîxê dudem ya 'Elî

Emrê du 'aleman je wî girt nizam
Karê pêxember kir wî beyanu'l-'am
Tewellud bû zahir le ruknê meqam
Xanezadê bêtu'l-herem ya 'Elîe azad

Eyyûb je lutfê wî şakir û sebûr
Mûsa je nûrê wî çû gîşte Kûhê Tûr
Dawûd je navê wî ezber dexwand Zebûr
We Xelîl le nav êr hemdem ya 'Elî

Tiflê nêysiwar wû le cem wî Rustem
La ba wî naçîz wû bexşişa Hatem
Da sa'il le ser nemazê wî Xatem
We Xudawend ra bû mehrem ya 'Elî

Dînê Ehmed je wî gîşte rewacê
Zehra le wî layiq bû le zewacê
Istandiye enguşter şeva Mê'racê
Le şeva Mê'racê zêxem im ya 'Elî

Ya 'Elî tu nezer le vî geda kî
Dilê min rûreşê je xem reha kî
Derdê *Ce'fer Qulî* we xwa dewa kî
Mîrê 'Ereb fexrê 'Ecem ya 'Elî

* Navê stêrkekê ye.
** Navê stêrkekê ye.
*** Şems û Bircîs û Kêwan navên stêrkan in.

## 29. Pendnameya Ce'fer Qulî Zengilî

Xelko ‘ibret bigirin ka Adem, kanê Hewa?
Ka Habîl û Qabîl ka Şêysê heybetulah?
Kuda çû çima nema Nûhê şêyxul enbiya?
Ka Şedad û ka Fir'on kanê Nemrûdê gumrah?
Va dinyayê bê wefa we kes nekiriye wefa

Ka Idrîs û ka Şu‘êyb ka Irmiya pêxember
Kuda çû Buxtulnesrê dunya kiri musexer
Kuda çû Hûdê Nebî ka Salihê namwer
Je kêvir naqe werxist we qudretê dadiger
Ka qomê ‘Ad û Semûd va dunya ye bêwefa

Ka Ibrahîmê Xelîl xaniyê Ke‘be kir bena
Mêhmanxane bena kir je rahê cûd û sexa
Isma‘îl kir qurwanî je rahê sidq û sefa
Bunyadê Ke‘be danî le cem Merwe û Sefa
We kes tu wefa nekir vî dunyayî bêwafe

Kanê Ishaqê Nebî sahib hilm û ‘elîm
Pêxemberê xoşliqa' xadiyê xulqê ‘ezîm
Je du sed û bîst salan Xwadê daye Ibrahîm
Isma‘îl û Isheq û kanê Mûsayê Kelîm
Hem Mûsa hem Ibrahîm çûn je dunyê bêwefa

Ka Ya‘qûbê Israîl sahibê Beytu'l-ihzan
Giriya sewa Yûsif ra çel salan bû natewan
We qes wî hêstir rêtin kwîr bû je her dû çavan
Ta je dîdarê Yûsif axir bû şad û xendan
Em jî axir terenê we hesret je vî dunya



Ka Yûsif lawê Ya‘qûb ew şahê sahib cemal
Je bin çal û zindanê gîşte rutbeyê kemal
Je dû renc û meşeqqet peyda kir ‘izz û celal
‘Işqê Yûsif Zulêxa le tarîxê bû meqal
Ka Yûsif ka Zulêxa kes nema le vî dunya

Ka Mûsa kanê Harûn kanê Yûşe‘ ibnê Nûn
Mûsa kir we ‘asay xwa textê Fir‘on sernigûn
Duşmenê edaletê we des wî bûne zebûn
Ku da çûne ku gûya le rûy dunê tune wûn
Ne Mûsa ma ne Fir‘on bêwefa ye va dunya

Xelko carê nezer kin ka Darayê Dadiger*
Ka Asifê Berxiya ka Silêman pêxember
Kanê sotê Dawûdî ka Ibrahîmê Azer
Kanê Şeddad ibnê ‘Ad** ka Fir‘onê sitemger
Ne Şeddad ma ne Fir‘on bêwefa ye va dunya

Kanê Dawûd pêxember xwadiyê kutawê Zebûr
Hesin we mistê wî da nermtir je mûm û kafûr
Pê ra dewû hemsida kûh û deşt û mar û mûr
Xwadê pê da hêwîsîn*** zimanê kullî tiyûr
We kes tu wefa nekir vî dunyayê bêwefa

Ka hezretê Silêman padişahê ins û can
Ab û xak û bad û nar gişti mutî‘ê ferman
We des dêv û periyan çêdekir kax û êwan
Izraîl qebzê rûh kir ta tekiya da nagihan
We kes tu wefa nekir vî dunyayê bêwefa

* Şahê Hexamenişiyan e.
** Şahê Adiyan e. Rewayet li ser wê yeke heye ku welatê Adiyan di encama tofanê de wêran bûye.
*** Hînbûn /fêrbûn.

Kanê hezretî Eyyûb sahibê sebr û şikûr
Je tirsê Xadê giriya ta le çavan nema nûr
Le dilê wî tune wû je xofê Xwadê hedûr
Kurman beden kun kirin mislê xaneyê zenbûr

Kanê Yûnis pêxember ew bendeyê rûhanî
We zikê masiyê da çel royan bû zindanî
Tesbîh û hemd û sena sa Yezdan bi can hanî
'Ibadetê Xwadê kir bidûnê nigeranî
Ka Yûnis û ka masî kes nema le vî dunya

Ka Zekeriya û Yehya kanê Îsa bin Meryem
We şerî'etê taze bû xwadiyê nefes û dem
Kwîr û şel şefa deda le nav xelqê musellem
Bû peyrowê dînê wî temamî xelkê 'alem
Ew Îsayê Rûhullah çû nema le vî dunya

Kanê Resûlê Ekrem xatemê pêxemberan
Muhemmed Mustefayê xetmê kulli resûlan
We zulfeqarê 'Elî kafiran kir misilman
Şîrê Xuda û resûl Hemzeyê sahibqiran
Ku da çûn tu kes nema le vî dunyay bêwefa

Kanê Ehmedê Muxtar ew resûlê kirdigar
Ku da çû Şîrê Xuda ew sahibê Zulfeqar
Le vî dunyayê fanî tu kes nema berqerar
Je Adem rind û kûtî meger bimê yadigar
Gişti çûn tu kes nema bêwefa ye va dunya



Ka emîrê mu'minan 'Elî saqiyê koser
Kanê bavê yetîman sahiba tîxê duser
Kanê Hesen ka Husên şehîdê teşnecîger
Kanê Hezretê Zehra şefî'ê rûzê mehşer
We kes tu wefa nekir vî dunyayê bêwefa

Ka Ebazerê Sedîq kanê Emarê Yasir
Ka Selmanê Farsî sahibê 'ilmê zahir
Kanê Miqdad û Eswed ka hebîbê mezahir
Ka Se'd bin 'Ebade ew pîremerdê mahir
Sehabe jî gişti çûn bêwefa ye va dunya

Ademîzadê gumrah rawi je xabê mexrûr
Eqlek we serê xwa ke te tune eql û şu'ûr
Ne Xwadê tê bîrê te ne qiyamet û ne gûr
Ey herîsê pir teme' le te nakevi hedûr
Bi xêyr ez renc û mihnet hasil tune vî dunya

*Ce'fer Qul***î** tu menal je des dunyay bêwefa
Vî dunya wefa nekir ne le şah û ne geda
Rû le Xwadê tu here je rahê sidq û sefa
Tuş tune le vî dunya bi xêrê cor û cefa
Sa ku we kes nekiriye vî dunya hergiz wefa

## 30. Pûr û Pişîman Dewin

Herçi fikir dekerim ez le rûyê cihanê
Pirs dekerim je xelkê kulli razî nihanê
Dexazim kohensalek ez je ehlê zemanê
Ta je wî pirs kerim je gerdişê doranê
Axir rok dewi xelko kulli pişîman in hûn

Eger çi mest û xelko eger çi gişti dîn in
Serê xwa hûn hilînin carekê hûn biwînin
Le yordê wan kesana nika baqûş dexwînin
Le mulkê xelkê eslen tuxmê xwa hûn meçînin
Axir rok dewi xelko kulli pişîman in hûn

Serê xwa hûn hilînin carekê hûn nezer ken
Herne diyarê qewran carekê hûn guzer ken
Batil fikrê vî dunya je serê xwa weder ken
Eger çi vî cihana gişti zîr û ziber ken
Axir rok dewi xelko kulli pişîman in hûn

Kuda çûye Zalê Zer ka Rustemê Tehemten
Kanê Gîwê Goderz û kanê pehliwan Behmen
Kanê Esfendiyarê şehsewarê rûyînten
Gişti çûn je cihanê le xakê kirin weten
Axir rok dewi xelko kulli pişîman in hûn

Eger Cemşîdê Cem win xelko eger Iskender
Le Çînê bûne xaqan le Rûmê bûne qêyser
Eger le cengê Firûd hûn bûne Tûsê Nozer
Gişti teren je dunê pir hesret û bêsemer
Axir rok dewi xelko kulli pişîman in hûn

Ka Zehakê mardûş, kanênê şahê Cemşîd
Kuda çû Firêydon û kanê Kaweyê Reşîd
Kanê Rustemê Destan qatilê dîwê Sifîd
Gişti çûn je cihanê des wetal û naumîd
Axir rok dewi xelko kulli pişîman in hûn

Xelko dil medin dunê dunê tune ‘itibar
Ne le wê mêhr û wefa ne sibat û ne qerar
Ne noşîrwan demîni ne jî Ehmedê Muxter
Ne *Ce’fer Qulî* demê ne Milwariyê navdar
Axir rok dewi xelko kulli pişîman in hûn

Kanê Siyawûş Şah ew cewanê bê nezîr
Ka pûrê Rustem Suhrab ew şîrmerdê delîr
Kanê xelko Feramerz kanê xelko Cihangîr
Xelko ka Gîwê Goderz tunîni çima zerîr
Axir rok dewi lawno pûr û pişîman in hûn

Paytextê Silêman dekişand badê serser
Le derbarê wî mutî'eger cin û ger beşer
Eger hûn bikin axir heft iqlîman musexer
Terin je rûy cihanê je we namîni eser
Axir rok dewi lawno pûr û pişîman in hûn

Hêyhat hêyhat xelko dûzex û polê sirat
Dûr mezanin lawno bigirin som û selat
Xêyr rastiyê le dunê hûn mekerin xiyalat
Je malê xwe bi der ken her sale xums û zekat
Axir rok dewi lawno pûr û pişîman in hûn

Dego: Hezretê Resûl bi ayatê beniyyat
Rebbê erenî Mûsa got je wî ra cewab hat
Xelko le dunê tune ew qedr û meratibat
Werin ta le heyat in hilînin fikrê memat
Axir rok dewi lawno pûr û pişîman in hûn

Je rûyê yomê mehşer xelko biken elhezer
Demînin le wê ersê hûn xar û zar û muzter
Hewesê malê dunê je dil hûn bikin bi der
Meger bigê dadê me le wê şafi' mehşer
Axir rok dewi lawno pûr û pişîman in hûn

Ce'fer dewêji xelko hûn bigrine ibret
Le vî dunya tunîni bi cuz renc û meşeqet
Çima nakerin nika fikrê rojê axiret
Gişti çûn ew kesêne we mal û cah û şoket
Axir rok dewi lawno pûr û pişîman in hûn



## 31. Ademîzad

Je qetrêk ava menî silsal liqat dewî
Je piştê bavê terî we dê ra hemcan dewî
Ta ku çû hemlî mader xwîn û goşt yeksan dewî
Peyda dewi reg û pê bendeyî Yezdan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Ne me ne ro ne sa'et ne deqîqe berqerar
Hatinî tey vî dunya guya dewî aşîkar
Teqdîrnivîs tê cem te hînga degirî qerar
Muhrî ziman vedewi aheste giriyan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Le gehwarêk ba sefa te datînin ca we ca
Hiltînin û datînin je te dewine aga
Hemîn ku bûy yeksale dê bavan dekî peyda
Şîrîn şîrîn gep dekî tûtiya xoşxan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Nazik dewi canî te binê çenê xencere
Wextê bûy du salî gah yêqilan gah ture*
Aram aram rê terî we zimanê şekere
Sê çar sale ku bûyî yaxşî yol gîden dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Pênc salî bû 'umrê te hergiz tu nêy mekenan
Le şeş salan delîzî le nav hemtûş hevalan
Le heft salan têxinî tu je fekê didanan
Fikrê te oc degiri gûya senaxan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

* Yanî rûniştin û rabûn şair ji peyvên "geh yikila geh otura" tirkî wergirtiye.

Heş salî bû ‘umrê te dekerî fehm û idrak
We lefzê xwa dexwînî kelamê Xwadê bêbak
Halî dewî je wacib je şeş cehetê eflak
Wextê ku bûy de sale xanayî quran dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Le Yezdan edew erkan telî degirî we yad
Tu dewî eşkalniwîs je ders û meşqê ustad
Le diyanzdan nas dekî tu terîqeyî îrşad
Le çardan balix dewî hêran û mestan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Wextê bûy panzdesale dede te hewa yarê
Le şanzdan û hevdan têr navî je dîdarê
Sermest û medhûş dewî le mewsimê biharê
Le nozdan aşkar î le bîstan piyan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Le bîst û yêk û dudiyan guya dewî tu nomal
Le bîst û sê û çaran bulbul je te dewî lal
Hînga giriftar dewî kêmtir dewî tu xoşhal
Le bîst pên û şeşan xamûş û hêran dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Le bîst û heft û heştan cefay te dewi peyda
Tu le sinê bîst û neh tu dedanî mubtela
Sî sale bû ‘umrê te rû le te têne bela
Duşmenan dekî pamal Rustemê destan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Le sî û yêk û duduyan tu cewan î mexrûr î
Le sî û sê û çaran we quwwet û pîroz î
Le çel û çar û pêncan we sûretê pir nûr î
Le pênce ta‘et dekî bendey subhan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî



Tu le pênce û pêncan dekerî zikr û ta‘et
Le şêst û şêş û pêncan le heq dekî ‘ibadet
Be ta‘etê heftad sal Heq bibexşe gunahet
Tu le heftê û pêncan halî we erkan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Le heştê tu derêjî je çavan avê cûşiş
Mihasin sefîd dekî le ta‘et dekî kûşiş
Xwadê je te reza wi curmê te bike bexşiş
Tu le newed saletî bi qed çun keman dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Wextê ku bûy sed sale Ezraîl deke nizûl
Qewm û xîş û ‘eqreba je te dewin dilmelûl
Hem bîmar û hem bîzar mirinê dekî qewûl
Kelîme carî deken qaliwek bêcan dewî
Je zikrê xafil mewî axir peşîman dewî

Sed salan mihnet dekî royek je ser bar dekî
Ezraîl dewi mîwan dil je dunê sar dekî
Nezrê te qewûl nabin mêylî kull iqrar dekî
Nûr je çavê te tere xemgîn û giriyan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

El-xerez tu demirî beref deken we her hal
Datînin le çarçûwî dekene qewrê wetal
Mele telqî dewêjî vedegerin rê û mal
Kes nawînî le ba xwa hêran û nalan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Nakevi le derdê te tu girî û tu zarî
Xa bigirîn xwa xoşhal tu we derd giriftar î
Pûşakê te du gez caw şûnê te teng û tarî
Xalî we ser te deken je çavan pinhan dewî
Je zikrê xafil dewi axir peşîman dewî

El-xerez nikam biwêm tu çûy le binê zemîn
Peyda dewin nekîrên her du sa te le kemîn
Xezebnak û pirnihîn le des gurzî ateşîn
Je bîm û selabetê tirsan û lerzan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Hînga je te pirs deken en dînik û en Rebbek
Dîsa je te pirs deken en qiblek û en nebiyek
Biwêj je mezhebê xwa en kitab û en îmamek
Sindûq dil ger saf wi le rûy wan xendan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Biwêj Ellah Rebbû Mihemmed pêxember
Biwêj Ke'be qiblê me dînê Îslam muqerer
Bê quran kutawê me Îmamê Heyder Sefder
Te ku va cewawa da xurrem û şadan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Wawêlan ku te nego Mihemmed e pêxember
Te dekene tûtiya we derbî gurzişî per
Ta we rojî qiyamet el-hezer û wel-hezer
Bêmihebbetî 'Elî muqîmî nêran dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Amaje goftarî Heq nekîreyn dewin xoşhal
Tuhfe sate ra tînin je te deken istîqbal
We te ra tuş nawêjin we zimanî tirş û tal
Nawî despaçe le wê xurrem û xendan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Des je ser te hiltînin te dewine şûn nikû
Le vî dunê bêwefa ger xulqê te wi xoşxû
Peyda dewî le cem te mehbûbeke sîm-rû
Le rûy te ew dekeni sermest û şadam dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Dewê le dunyay fanî ez ê hevalê te wim
Tu xoşxû yê hemê şe ez we xwa xulqê te wim
Ta qiyamet berpa wi sewa te bûme me'lûm
Pê ra tekellum dekî meşxûlî canan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Eger biwi xulqê te le vî dunya nagiwar
Peyda dewi le cem te sêke gire reşî har
Hemêşe dadede te te dekerî birîndar
Ta heşrê tu le nav êr daîmen sûzan dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Wextê sûrî Israfîl şêpûr lêxist we seda
Heq û naheq pir deken je te bendê bênwa
Rind û kûtî ret dewi qiyamet dewi berpa
Terazûyê datînin xûb û bed kişan dewi
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

Elmasê tîx birra mûyek e Polî Sirat
Şefa'etî te bike pêxemberê ka'înat
Çun ku te eda nekir je gerdem xums û zikat
Le axiret û 'uqba pûr û peşîman dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

*Ce'fer Qulî* tu bike hemêşe kar nîkû
We teharet û teqwa we ta'et biwê ya Hû
Le pênc rûy vî dunya terîqî îman bicû
Piş mede vî dunya axir peşîman dewî
Je zikrê xafil mewi axir peşîman dewî

## 32. Aqibet Xeflet Xab e

Elo xelko biwînin va dunyêkê xeraw e
Sa min ra nazil bûye hem zillet û ‘ezawe
Min fexêrî xelas kin je vî ara sewaw e
Me‘lûm e ez xaric im ne umîd û cewaw e
Dînê Zertuşt û Yehûd aqibet xeflet xab e

Dîsa ez dilgiriftar bêqerar im bê taxet
Perda namûsê teng e le min bûye qeht û wexet
Herdem mest û dîwane le min nemaye xêret
Te‘nê lêtêxine min le nemaye hurmet
Gişti dînê Nisara aqibet xeflet xab e

Bêmal û bêmedar im yarê min le xurwetê
Qelenderwar degerim sîneçak je firqetê
Ew ê je min bêxewer hêsîr im we cehetê
Je des tîrê işqê wê ez ketime zilletê
Sergeşte bûm haware aqibet xeflet xab e

Bêşek û şubhe dewêm ketme girdabê xeme
Ehate kir* dora min mîna deryay Qulzem e
Herdem min zelîl deke we şemalê bêdem e
Ez ê giriftar bûme we îmamê heştom e
Gişti dînêne Xwadê aqibet xeflet xab e

Kudûret** le min xêlek berpa bûn je her teref
Cewr û cefa pir bûne rû le kê bikem teref
Le kî dînê duçar im celawgîr im le refref
Eger mîna şêrî mest xurriş kunan rû be sef
Heme celdî heywanet aqibet xeflet xab e

* Dorpêçkirin.
** Diltengî/ kîn.



Exl û xîret pirxeşm in le min bûne ew xalib
Feraset rehnima ye ferzendî Ebû Talib
Siyaset desgahî ser danîn îra wacib
Ta peyda wi bêmiha sewa min kesek sahib
Kullê dînê cihûdan aqibet xeflet xab e

Eger Cemşîdi Cem wim va dunya bê‘itibar
Le cihanê bêxem wim xemefza ye rozigar
Mîna fir‘ewn ez bikem idi‘ayê kirdigar
Sa xwa sahibheşem* wim axiret je min ferar
Ixrac wim je vî dunya aqibet xeflet xab e

Biwim ger Rostemê Zal axir peşîmanî ye
Perwerdê Sîmurxî bal axir pişîmanî ye
Le cem Kiyan we Celal axir pişîmanî ye
Merdane bikem cidal axir pişîmanî ye
Turkistanê wêran kem aqibet xeflet xab e

Mehzi vî munacata eger herme Kûhê Tûr
Le wî qomê naseza herdem biwêm ya Xefûr
Hem sual û hem cewaw mehzi wî ‘ecûzê kûr**
Xofnak û sehimnak je dîndarê dewim dûr
Gişti dînê mûsayî aqibet xeflet xab e

Herçî biwêm min tune diger fikr û xiyale
*Ce‘fer Qulî* aşiq e hem dil hûrîcemal e
Naçar û na‘elac im zemane we min tal e
Ger bixwazim perwaz kem ne min per û ne bal e
Gişti dînê perîzad aqibet xeflet xab e

* Leşker.
** Meqsed dinyaya bêwefa ye.

## 33. Muşkil Kar e Karê Dil

Xelko le min eyw megrin, muşkil kar e karê dil
Çel qeter nêr û meya, nakişînin barê dil
Je meşrêq tayne mexrêb, deşewiti arê dil
Tu derya û deryaçe, xeva nake arê dil
Bêçare û aware, bêqerar im je dest dil

Îro le dunyay fanî, xar û zar im je dest dil
'Alem gişti tendurust, ez bêmar im je dest dil
Işqê malê min danî, giriftar im je dest dil
Je milkê xwa derweder, elferar im je dest dil
Xar û zar û bêqerar, gunekar im je dest dil

We serê pirr meşiqet, we dilê pirr we cûş im
We cêgerê sûxite, we lefzê pirr xurûş im
Ne dunya û axiret, dayêm mest û medhûş im
We nadanê bêkemal, çimanê hemaqûş im
Pabendê qul û qerar, stuxar im je dest dil

Qedrê xwa ez nizanim, le nav hemtûş û heval
Rence û zarî dekem, bêhûde eql û kemal
Weqes munacat dekem, zimanê min dewi lal
Carê aram nagirim, tune furset û mecal
Bêhuqûq û bêqerîn, eşkbar im je dest dil

Ser we bela we şur im, je eyamê xizanî
Tu xêr û behre nedî, je doranê cewanî
Dayêm bi uftadegî, bi medh û sena xanî
Ger canê xwa qurwan kem, kes qedrê min nizanî
Bi 'ehd û şert û pêyman, giriftar im, je dest dil



Ne min bav e ne bira, ne min ser û saman e
Ne min eql û ne min hûş, ne min dîn û îman e
Ne min sewr û ne taqet, ne min şûn û mekan e
Le elacê derdê min, peyda nawi derman e
Şekayetê min pirr e, erzdar im je dest dil

Mêylê min tune le 'ilm, daim le ehlê saz e
We ademê nadan ra, çere bûme hembarze
Cunûnê min bê hesaw, işqê min bê endaze
Mu'min im lakin durust, ne rûjî û nemaz e
Le dergahê Xudawend, gunehkar im je dest dil

Eger asmanê Xwadê gişti kaxezê zer wi
Serdirextê cihanê we qelemê duser wi
Gişti kaniyêne dunê mirekew û cuher wi
Nê nivîsîn derdê dil meger je heq nezer wi
Ellah le dunyay fanî xar û zar im je des dil

Şeva ro ez degerim, dutarê min Zekeriya
Sayîlek sergerdan im, le min nakevi qerar
Mest û medhûş dexwînim, le her hengî bulbulwar
Je işqê Milwariyê, rusva bûme aşikar
Şekayetê min pirr e, daqdar im je dest dil

Bejna min û qeda min, hem hêykel û hem endam
Reg we reg lê nazil bû, derd û bela je eyam
Gişti belê vî dunya, le du kes kirin meqam
Evel sewa Eyûb û, duvum *Ce'fer Qulî* nam
Barilaha tu zanî, beladar im je dest dil

Je Xudawend nida hat, ey bendey ser we şûr
Le ba her namehremê, derdê dil meke zuhûr
Çere bikem je dest dil, le min nemaye hedûr
Royeke xweş min nedî, je dest vî dilî nacûr
Barilaha mubîn î, giriftar im je dest dil

Je dest dilî ser we şûr, gulrengê min bû rencûr
Le serê min nema hûş, le çavê min nema nûr
Bejnê min bûye keman, je dilê min çû hedûr
*Ce’fer Qulî* bay daye*, je dest dil rahê sebûr
Ya Elî can edrêknî, xar û zar im je dest dil

Her çar feslê salê çûn, royekê nebûm dilşad
Bulbulwar le ser gulan, şeva ro dekem feryad
Bêsemer û bêbehre, ‘omrê min çûye ber bad
*Ce’fer Qulî Zengilî*, dayêm dekişînî dad
Stuxar û gunehkar, bêqerar im je dest dil

Ey Xaliqê bêhemta, ey nûr je te bûye nûr
*Ce’fer Qulî* bêçare, je dest dil bûye mehcûr
Sewa Milwariyê ra, le wî nakevi hedûr
Çi dil hewû le Ferhad, je Şîrînê xwe bû dûr
Aware we dû yarê, elferar im je dest dil

Dil şem'eke heremê, ez le dorê pervane
Bûye xerîdarê can, kirme delî dîwane
Bejnê minî ço nêyze, tey kir bûye keman e
Le defterê zemanê, ez kirime efsane
Nam erzê xwe we kê kem, erzdar im je dest dil

*Ce’fer Qulî* tu bes ke, nawi hekayet temam
We fekê û dutarê, me bir we dû hev meqam
Durfiroş î efsûs ku, xerîdar tu kir bednam
Dest bavê dawê Xwadê, hînga de-yazde îmam
Bêj Xwedêyo dewînî, şermsar im je dest dil

* Ji dest daye.



## 34. Yar û Hemdem Hatine

Dûr bûyî yarê nazenîn, narerey je yadê min
Sa te zar û ‘elîl im, tu napirsî halê min
Haka cefakar newî, çima tu nêy palê min
Bêtexsîr û bêgunah, te ar berda canê min
Tu halê min dewînî, rehm bike le halê min

Ger herem bezm û şadî, bê te nawime xendan
Eger herim nav gulan, eger palê hevalan
Je feraqê rûyê te, hemîşe zar û nalan
Le gerdişê zemanê, ez bûme mat û hêran
Dunya gişti xweşhal e, bedhal e va halê min

Me’lum dewi reqîwan, serê çerê girtine
Le serê te xwandine, tu je rê dagirtine
Van karêne reqîwan, je rûy ‘edawetê ne
Dilwer tu xwa xilas ke, yar û hemdem hatine
Bêkes û giriftar im, rehm bike le halê min

Serê zulfê wê daf in, ez kefterê demanê
Taqet le min nemaye, je dest hatime emanê
Rûzigar le min nema, haware le cihanê
Naçar û na'elac im, demirim we ermanê
Xudavenda guwah î, rehm bike le halê min

Reza me we baysî wê, dûr bûme je aşyanê
Perwaz dekem defirim, we heway av û danê
Le çiyan û le cûlgan, le zawn û demanê
Reqîwan le qesdê min, tîr danîn le kewanê
Cûya cûya pirs deken, je her kê nîşanê min

Xewerdar wi nezer ke, carê tême ser damê
Serê dafan tu veke, ez tême we aramê
*Ce'fer Qulî* dewêji, gudagir le kelamê
Terkê cur û cefa ke, avek bide je camê
'Aşiq û giriftar im, rehm bike le halê min



## 35. Sebrê Eyûb We Min De

**1**
Ya Reb we hurmetê penc tenê eba
Eql û xiredek merqûb we min de
Min şev zindedar ke, bêşek û riya
Işqê dîdarê xwe mehcûb pe min de

**2**
Le 'emelê xêrê min bike raqib
Le nefsê emare min bike xalib
Le işqê E'ême* min bike talib
Nûrê cemalê wan, metlûb we min de

**3**
Qena'eta Resûl, kerema Emîr
'Ismeta Zehraye, bê şibh û nezîr
Hilma Mucteba û quveta Şebîr**
Xêreta 'Ebbasê mehbûb we min de

**4**
Je rahet û xuşî, min bike ixrac
Xêrez xwa meke, we kesê muhtac
Rengê dilê min ke, zelîl û zecac
Feraq û hicrana, Ye'qûb pe min de

**5**
*Ce'fer Qulî* dewî tu xayib û hazir
Te we nezerekê kirime şa'ir
Min we qezayê xwa ke razî û şakir
Je lutfê sebrê 'Eyûb pe min de

---

* Pêxember Muhemmed
** Yek ji navê Hûsên e.

## 36. Barilaha Kerîma

Barilaha çi bêjim gunekar im rûsiya*
Qurwek le min nemaye mehzi yarê dilruba
Her kesek le hedê xwa eger şah û ger geda
Memnûn e je eqlê xwa le dergay te Kerîma
Ez ê mame sergerdan Barilaha Rehîma

Le vî dunyayî fanî yêk xoşhal e yêk xursend
Yêk le fikrê doletê yêk we dilê mustemend
Yêk le yarê xe xaş e yêk le xeyalê ferzend
Ema ez je giştiyan bênesîw û derdemend
Ez ê bûme giriftar Barilaha Kerîma

Fexîr le qena'etê şahan le 'edaletê
Xenî le malê dunê 'abid le 'ibadetê
Esîs le narê dûzex mu'minan le cennetê
Her derê defikirim herkesek we himmetê
Yêk le 'êyş û 'işretê yêk le xarî Rehîma

Je gerdişê vî çerxa ez mame mat û hêran
Daim eşkrêzan im dunya le min bû zindan
Rozigar le min tune mudam ez dîdegiriyan
'Umrê min bûye talan sergerdan im pişêman
Muşkilê min asan ke Barilaha Kerîma

* Rûreş



Le dergay te dewêm dad tu yî Xaliqê yêkta
Ez ê munacat dekim gûya le Tûrê Mûsa
Umîd tune xêr ez te le dergay te ço Îsa
Denalim ez çon tu yî hem Rehîm û xêrxa
Muşkilê min asan ke Barilaha Kerîma

Hedûr le min nemaye ey Xudawendê Eyûb
Taxet le min tax bûye mîna Hezretî Ye'qûb
Zemîngîr û hezîn im je çavan bûme me'yûb
Miday min tu hasil ke eya 'Ullam'ul-Xuyûb
Muşkilê min asan ke Barilaha Kerîma

We kemendê zulfê wê ez ê bûme giriftar
Je firqetê rûyê wê ez bêmar û xar û zar
Naçar û na'elac im le redê wê ustixar
Hedûr le min nakevi le çiyan dekim ferar
Hedûrekê we min gîn Barilaha Kerîma

Tu rehm bike le min ez bûme dilfikare
Ya Hû dewêm derwîşwar le mi nema qerare
Mecnûnwar ez degerim sergeşte û aware
Ge mest û ge medhûş im ge dewime xumare
Le çengî vî zemana giriftar im Kerîma

*Ce'fer Qulî* dewêji ez bêmar im 'aşiq im
Sewa yarê dilruba cannisar im 'aşiq im
Le rûy wê wefadarê giriftar im 'aşiq im
Kerbela û Medîne telebkar im 'aşiq im
Miday min tu hasil ke Barilaha Kerîma

## 37. Sî û Du Hirûf

Evel serê bismilê dewêm le rûy zemînê
Wesfê yarê tarîf bû le sûreyê Wet-tînê
Elîf: Elleh û Ekber je cemalê şîrînê
Bulbulê baxê irem ahûya milkê Çînê
Bê: Biriyê te kewan in pijangê te bûne tîr
Zulfê te çînçîn bûne natê daney zincîr
Ciwaniyê le min rû kir we dû te bûme hêsîr
Şevaroyê denalim derdê te nakem je bîr

Pê: Perwîn î ya Zuhre nizanim tu kîjan î
Ya feriştey asmîn ya xurşîdê cihan î
'Işqê te da serê min dîn je dû wê hilanî
Xewer te ji min tune derdê min tu nizanî

Tê: Terkê te ez nakem ta le min heye nefes
Te min kiriye giriftar çûn tûtiyan le qefes
Ta sewa dîdarê te kete dilê min hewes
Birîm je qom û xîşan le dorê min nema kes

Sê: Sulsek rehm tunîni 'eslen le sûraxê te
Tawisek rengwereng î demrim je feraxê te
Le nav bax û bostanek ez bûme qonaxê te
Ser daynim le juniyê te bimrim le qiraxê te

Cîm: Cewawek nadî min herçi îlçiyan deşînim
Bulbulwar im sewa te şevanero dexwînim
Le serê min nema hûş sewa te har û dîn im
Dîdarê te nawînim ah û nalan dekşînim

Çê: Çadirê hefreng e le serê te melekê
'Işqê te min riswa kir beref kir je nav xelkê
Teqdîrnivîs kiriye serê min le kelegê
Rehm bike le halê min xwa nîşan de carekê

Hê: Husnê te perîzad 'alem gişti kiriye dax
Sîngê te baxê Rizwan memê te mîweyê bax
Didanê te mîna zîv lêvê te hemçû qeymax
Welat gişti min tevda telê* te nekir sorax

Xê: Xaliqê lemyezal te we heqê Quranê
Va çi husn e le yarê min haniye emanê
Pijangê wê mîna tîr le çileyî kemanê
Yêk filitî le min ket nekar kirim le anê

Dal: Zelîl bûm we dû te haware çûn Mecnûn e
Je feraqê rûyê te dilê min bûye xûn e
Dûkmê baxê xe veke ta 'aşiq têr biwîne
Mîna bulbul je 'eşqê gulê bêwî zimîne

Rê: Rawûn le sîngê te ew cuftê sêv û naran
Zekatê wan degêne me fexîr û bêçaran
Derwîş im û musteheq hatime mîna miskînan
Xêr û berê biwînî bi heqê heşt û çaran**

Zê: Zulfan çînçîn meke guliyê xwa berde dirêj
Dilê min meke kewaw tu le ûcêx mebirêj
Liqmanê Hekîm tu yî dermanê min tu biwêj
Dest hilînim le Xwadê 'umrê te bike dirêj

Jê:

* Weke te. Mîna te
** Heşt û çar, mebest 12 îmamên şîeyan in.

Sîn: Sal û meh red dewin nawînim feraxê te
Ro we ro teze dewi le dilê min daxê te
Mîna bulbulê şêda denalim le baxê te
Can dedim le reda* te nawînim soraxê te

Şîn: Şimşad e bejnê te kemerbarîk û zerîf
Lêvê te mîna qunçe didanê te mîna zîv
Qedem dayn le ser çavan carê tu weyne teşrîf
Ta le ba dost û duşmen wesfê te bikem te'rîf

Sat: Sebr û qerar tune le vî dilê nacûre
Ne le dil maye tewan ne taxet û hedûr e
Seyyadek im le dû te le min nema sebûre
Rû le dergahî Xaliq herdem dewêm Xefûr e

Zat: Zaminê ahûyê derdê min bike derman
Bêkes û bêpenah im xêr ez te tune guman
Ez le redê yarê xwa aware me le ciyan
Dilsûxte derdmend im hêstirê min av û nan

Ta: Talib im je Heq da te metlûbê rizwanî
Çavêne reş kil kiriye we killê Silêmanî
Nam hûrî û nam perî nam feriştê asmanî
Va derdê le min keti tu we xwa lê derman î

Za: Zahir bû 'işqê te le min bê kesê bê mal
Xur û xab je min dûr kir daim le fikr û xiyal
Şehr we şehr ez geriyam min nedî yar û heval
Min kes nedî mîna te we cemal û we kemal

'Êyn: 'Êynulla ye 'Elî Yedellah û Nûrellah
Butxane wêran kir çûn Ibrahîm Xelîlellah
Je wî roneq girt dînê Muhemmed Resûlellah
Canişînê pêxember 'Eliyu'l-weliyellah

* Şop, rê



Xêyn: Xêrez te min nedî nazenînek we celal
Ne çon te zimanşîrîn ne çon te we bejn û bal
Şevek ger biwi mîvan sa te bikem derdi hal
Zanî çer bûme hêsîr sa te yarê bêmisal

Fê: Fermanberdar nawi va dila je 'eql û hûş
Şu'lê 'işqê ser kişand we avê nawi xamûş
Mêhrê te ketiye dil satê nawi feramûş
Mîna Ferhad le cihan dekşînim sa te xurûş

Qaf: Qirmiz bû rengê te je qudretê ilahî
Fekê te qunçey gul didanê te telayî
Derdek le min ketiye feqet tu lê dewa yî
Qunçegulê bulbulê şêda û bênawa yî

Kaf: Keman in biriyê te pijangê te ço xencer

Gaf:

Lam: Lêvê te bergi gul bejnê te ço sinober
Guliyê te çil û çar in saf kişyane berawer
Zimanê te şîrîn e fekê te hewzê koser
Bînî zulfê û mûyê te xoştir je muşk û 'enber

Mîm: Muhemmed Pêxember le roya qiyametê
Je lutf û keremê xwa defikri le ummetê
'Elî we dadî me gê le ser polê siratê

Nûn: Nûn we'l-qelem kişand biriyê yarê çon keman
Cemî'ê cin û melek le wê bûne we guman
Wê nazenînê gulrû dilê mi kiriye biryan
Je qom û xîşan dûr kir haware kir le çiyan

Wav: Wasitê yarê min ew emîrê welayet
Je des zulmê te daim le wî dekem şikayet
Le wê royê ger biwi berpa şûrî qiyamet
Sewa te re namîni bicoz renc û nedamet

Hê: Heçî nê zulfê te pijangê te hem ço tîr

Va derdê le min keti hergiz nakerim je bîr

Yê: Yarê min we refş e ser sîngê wê lalezar
Herdu çavê wê kildan biriyê wê qelemkar
Sîngê wê baxê irem bejnê wê serw û çinar
*Ce'fer Qulî* çav le rê dekişîni intizar



## 38. Qelender û Mestane

Gel ey saqî bu yana doldîrgînin peymane
Ayetgînin ey mutrib çixar bîzî fexane

Îro je xemê yarê bûme Mecnûn dîwane
Şûna min mîna Yusif bûye çah û zindane

Ez zer û zar hiştim je 'eql bûm bîgane
În 'êşq sûzed mera çûn şem' kê pervane

Gordîm bu gece baxde bulbul qonub aşiyane
Şebnem tokûlûp gulden ol xonçey xendane

Rûniştim le ser hozê dehat bîna gulane
Dilbera min bû peyda zulfî xwa lêxist şane

Çend ramîsanek da min je nergisê çavane
Rûnişt le palûya min mestane û piyane

Leblerinden bal tokmîş men îçtîm xanexane
Qaşlarî qaş û qira ol xal dane dane

Min destê wê girt çûnî nav baxan û gulane
Min jê hilgirt kamê dil min dî ku cane cane

*Ce'fer Qolî* ez an rûz bişod xane vîrane
Gêrdê 'alem mîgerded qelender û mestane

**39. Milwariyê Dil Ji Min Bir**

Dîsa xemê eser kir le vê dilê hezîn e
Şu'lê eşqê ser kişand şewitand qelb û sîne
Ta min carê nezer kir le wê yare metîn e
'Eql û dîn je min estand ez kirim zar û dîn e
Va razê miniy pênhan le xelkê bû yeqîn e
Ye'qûb newum çima bûm" Beytul Hezen" nişîn e
Je feraqê Yûsifê şems û qemer cebîn e

Mem enar û lîmûn e beden mina bilûr e
Nemayan bû le dunê ber pa kir şerr û şûr e
Taxet le xelkê nema, bay dan hilm û sebûr e
Kufir newî dewêjim secde kirin zerûr e
Ger le zahir nîzîke le batin ew ê dûr e
Va hukmeta Encîlê, ya mu'ciza Zebûr e
Xerz beşerha nawî, yeqîn ku hûr-'eyn e

Tekya daye mutekkî berdaye zulf û keceg
Lêv yaqût û 'ennab in didan rîz û qunçe fek
Ne sitrû ne hicab e le bedenê tune çek
Le vêy şikla heyran in perî û cinn û melek
Gûya niqqaşê Çînî vî sûreta kirne hek
Va 'aşiqê bê care pir bûye lê dil weşekk
Sakûwe yarê min va hem şikl û hem qirîn e

We heft qeleman kişand mîna gulê hefreng e
Biriya wê çûn kewan in pijangê wê xedeng e
Murxê hewê seyd dike we derîne dane heng e
Ta wê dî Şêx Sen'an kafir bû bê dereng e
Çima ku va sûreta je tersa û fereng e
Ew ê mîna yarê min mah-rû û qeşeng e
Şiklê van her duyana sun' can aferîn e

We ba'îsa 'işqa wê mam je yar û hevalan
Je bîrê min neçûye le muddetê heft salan
Cuwaniya 'umrê min wê kafirê kir talan
Elîf bejnê min dal kir, milê we bejn û balan
Rengê sûyîre min zer kir je xusan û xeyalan
Rûh je cismê min kişand çavî mînê xezalan
Bulbulê baxê Îrem, ahûyê milkê Çîn e

Le heft îqlîman tune mîna yarê dilruba
Mîna wê qeşeng nawî ne Bulqîs û Zuleyxa
Ne Şîrîn û ne Leyla ne 'Uzra û ne Gulşa
'Alemê pak jê bê nesîb bicoz sêr û temaşa
Hacî Zemzem muwekkîl bê mûnîs bê mawa
Welîken Milwariyê min aşkar e huweyda
Hêfê ku vayê lal e, Mulê* ziman şîrîn e

Pes hûn le min 'eyû megirin, muşkil kar e karê dil
Ji meşriq ta we mexrib deşewtî arê dil
Çel qeter nêr û me ya nakişînin barê dil
Barê dil dane çiyan qewul nekir barê dil
Felek çima te axir kirime giriftarê dil
*Ce'fer Qulî* des bavê dawê '*'Mededkarê dil''***
Milwariyê dil je min bir nika qesdê dîn e

* Milwarî
** Xwedavend

## 40. Le Dîwanê Muhemed

**1.**
Xelayiq intizar in le dîwanê Muhemed
Bê yar û xemgusar in le dîwanê Muhemed
Şermende gunehkar in le dîwanê Muhemed
Be emel giriftar in le dîwanê Muhemed
Temamî eşkbar in le dîwanê Muhemed

**2.**
Hat Newrozê Cemnişan, nîkûterînê sa'at
Mubarek e û mêymûn je xoştirîni oxat
Ger kafir e ger mumin le Xwedê ken ew xelat
Her kes we emelê xwe çigûne û bi halat
Şermende ustixar in le dîwanê Muhemed

**3.**
Hat mosimê biharê verket gulê reng we reng
Her yêk we tûşî xwe ra verket qeşeng û xoşreng
Gişti xurrem û xoşhal ger dirext û ger çi seng
Le zikrê heq meşqûl in we awazê dengwedeng
We qurb û êtibar in le dîwanê Muhemed

**4.**
Je hewesê Elî can şîhe lêtêxist Duldul
Mosim êyş û êşret çehçehe lêtêxist bulbul
Le kûh û sehra û deşt bişkufte xunçeyê gul
Nesrîn û sosinzeban, benefşe û hem sunbul
Lêv xendan in gulzar in le dîwanê Muhemed

**5.**
Rûnişt cenabê Elî le ser textê xelafet
Ger le xûb û ger le bed yêk yêk dekir edalet
Duşmenê wî şermende gişti ser we xicalet
Daim le dilê wan e buxz û kîne lecacet
Şermende gunehkar in le dîwanê Muhemed

**6.**
Sê xelîfê .............Omer Xetab............seng
Je wan Ebûbekr û ew Osmanê ...neg
......................... xorakê ......... .......
Daim je ........... barê ............... şeng

**7.**
Foc we foc hazir dewin le yomulqiyametê
Nida je enelheq tê murexes ke umetê
Pes cenabê pêxember le wan tê şefeqetê
Muminan rewan dewin terin rû le cenetê

**8.**
Paberca berqerar in le dîwanê Muhemed
Sef sef dewin muşrikîn cumligî ehlê ezab
Pirs dekin je karê wan je wan dekşînin hisab
Je zimîn dewine lal ew nikan bidin cewab
Sa ku le darê dunê kaferan nekir sewab
Gerdenkec û mehar in le dîwanê Muhemed

**9.**
*Ce'fer Qulî* bêçare xiredmend biwi aqil
Le vî pênc royê dunyê je zikrê mewi xafil
Tu her çi ku biçînî wê hiltînî tu hasil
Des bavê le damanê Elî sahibê Duldul
Gunêh te we xerwaran le dîwanê Muhemed
Selê ela Muhemed selewat ber Muhemed

## 41. Ya Elî Meded

**1.**
Meded je te dexwazim êy xwedawendê sermed
Xwedwendê ehed û hem hovellaho semed
Serwerê pêxemberan pêxemberê me Ehmed
Le her karê xûb û bed dewêm ya Elî meded
Le ser polê seratê je te dexwazim meded

**2.**
Ya hezretê Muhemed şefî'ê rozê mehşer
Eceb nûrek xilqet kir xwedawendê dadger
Je dû wî da xilqet kir Elî saqiyê Koser
Çar mahe le gehwarê du nîme kir wî ejder
Ya Elî şahê merdan je te meded dexwazim

**3.**
Xatûna qiyametê Fatimeyê Muteher
Le min 'asî gunehkar heram bikerî seqer
Ronay bikî qewrê min bidim cewabê Munker
Hazir bikî le cem min Elî heyder û sefder
Fatimê bintê Ehmed je te dexwazim meded

**4.**
Meded dewêm ya Hesen umetê te yî kafer
Dane te çon şîr û zehr te rijand dil û cîger
C'udey bint Eş'et ew e mel'ûnê bedexter
Je wî zehrê daye te wê alem kir mukeder
Ya Hesen ibnê Elî je te dexwazim meded

**5.**
Çû je rûy dunyay fanî, Husên ew şem'ê roşen
Qatilê te ya Husên bûye Şimrê Zilcoşen
Le Kerwelê şehîd bûyî dûr bûyî je milk û weten
Şefîulmuznibînî zexmdarê bê kefen
Ya şefî'ê şîeyan je te dexwazim meded

**6.**
*Ce'fer Qulî* dewêji ya reb ez gunehkar im
Xicletzede ya Elî le ba te şermsar im
Dilê min pir we hesret je çavan eşkbar im
Le ser polê siratê ez ê bê mededkar im
Tu bigê feryadê min dewêm ya Elî meded

## 42. Keçika Qizilhisarê

Xelko sa we ra bêjim je halê rozigarê
Dilwer pir in le dunê dil medin we her yarê
Teze rasteva hatim çûme Qizilhisarê
Keçikê wê mîna durinan ketine rêce qetarê
Heryêk mûyek xwe bidin sewa perdê dutarê
Perdan girê dem lêxim sewa têllê nigarê
Mellenino! Qazîno! Herine pêşwazê yarê
Des we sîne hûn herin belkî je me neqarê
Can û mal payendez e sewa şîrîngoftarê



## 43. Çiyay Şaycanê

**1.**
Le engê cewaniyê çûme çiyay Şaycanê
Le wê mat û hêyran bûm ez ketime gumanê
Wesfê wê nêye gotin we tu fikr û zimanê
Wê tune tûş û hemta le nav çiyayê cihanê
Çiya nawi mîna wê serferaz û navdar

**2.**
Kanî le wê rewan in gul û giya nemûdar
Bînê çadirnişînin şûn we şûn lê berqerar
Kîvî û gur û piling wehş û têyr in le pêkar
Qudretê perwerdigar je her kuda aşikar
Kes nas nake mîna min nîşanê perwerdigar

**3.**
Va çiya kîmiya ye berfê le wê dewa ye
Ew sirfê perwerdigar sewa şah û gida ye
Ger biwêjim xakê wê zêrr û zîv e, rewa ye
Rûhê min tê qehqehê ew mezherê Xweda ye
Kes nawîni mîna min Xwedê le wê aşikar

**4.**
Tavê royê ku verket evel tavê wê nûr e
Nizanim va Sîna ye ya Uhud e ya Tûr e
Le wê cilweger dewin gulêne cûr we cûre
Le nav gulan dilîzin keçik lawkê purşûre
Tu kes nawi mîna min le wê mest û huşyar*

---
* Heceyek kêm e.

**5.**
Çi biwêm sa Şaycanê, Şaycan şahê cihan e
Ew we berf û baran e ew kaniyêne rewan e
Çi çûk û çi qeremîx, merx û şîlan* têda ne
Je bînê gul û anix adem dewi mestane
Keriyêne pêz û hespan le çêre ne berqerar

**6.**
Le demanê Şaycanê bax û milkê Şîrwanê
Je Şîrwanê hewale cûlgê Faric Qoçanê
Îmamdax, Elîbulax, Armûtlî û Zîlanê
Çiyay Selsal û Duçing le rastê Xewûşanê
Hespan şîhe dekşînin berxan le wê barrebarr

**7.**
Xoş we halê wan kesan şûnê wan bûye Şaycan
Xoşsûret û xoşsîret, xoşguman in xoşziman
Xoşpindar û xoşgoftar xoşkirdar in xoşerkan
Hêf ku tune le *Ce'fer* je wan tu nav û nîşan
Razê nihanê *Ce'fer* le wê bûye aşikar

* Çûk, qeremîx, merx, şîlan navê darên li çiyayên Xorasanê ne.



## 44. Biwîn Halê Min

Va tererî hemdem selane selan
Lê gulê xendanê biwîn halê min
Mîna şerebxwaran pur bûyî tu mestan
Goherê Emanê biwîn halê min

Qedê te şemşad e ya tûba derext
Sîngê te bulûr e sa min bûye text
Je min qarî şikl, cemal kiriye sext
Lê hûrê rizwanê biwîn halê min

Je derdê işqê te bûme qelender
Deşewtim daim mislê semender
Sa te ra dexweme ez xwînê cîger
Lê şîrînzimanê biwîn halê min

Lewasê te zerbeft, etles û mahot*
Kafir e bê dînê miletê Cuhûd
Çîçek û benefşe zumurud yaqût
Lê le'l û mircanê biwîn halê min

Bi hukmê Şah Ebas je Romê Qêyser
Aware bû je olada Heyder
Le vir *Ce'fer Qulî* pir bûye muzter
Xwenga du biranê biwîn halê min

* Zerbeft, etles û mahot cureyên qomaşan in.

## 45. Mîna te tune yarek

Gotin hatiye Newroz e, eydê şerîf mewarek
Tu Leylî ez Mecnon im, ez Vameq tu Ezarek
Qeda te şaxê şimşad, kişiya bûye çinarek
Bikşîn şaneyê abnûs, zulfa te bû şamarek

Eqlê min we te ra çû, tu çere nazenîn î
Gîştî menzêla bilind, ehvalê min nawînî
Kaxazekê bişînim, mele ninî bixwînî
Ez dewim nîçîrwanek, çima nawî merarek*

Suwê wextê nemazê, dager je çiyay bilind
Şamarek were nawi, zulfê te bûye kemend
Zimanê te engebîn, nebat û şeker û qend
Ez biwime cîranek, tu biwî çişmesarek

Geriyam le Hind û Şîraz, le Kaşan û Sefahan
Mîna te nedîm pirr naz, le giştî royê cihan
Tu biwî kepkê derî, ez bazê destê şahan
Radû te kim** hemço baz, te bigirim le qarek

Le min tu meke qezeb, lê dilwerê sitemkar
Bikşîn kardê işqê xwe, goştê min ke pari par
Bûye aciz elîl e, *Ce'fer Quliyê* muxtar
Dil je te kende nake, mîna te tune yarek

* Xezal, meral.
** Radûkirin: teqîbkirin.



## 46. Can û Dil Bêtab İn Îro

Le dilberê bûme mîvan, çavê we 'etab in îro
Naz û qemzê wê je min ra, zulm bêhisab in îro

Ew verket mîna meraran, kişiya çû ro le kemeran
Je dil nehat biwê caran, ramîsan sewab in îro

Herdu çav sêhr û cadû ne, du mem narinc û lîmo ne
Biskê royan du ta bûne, le hîvê niqab in îro

Eceb xwînxwar e xwînrîz e, lêvpisteyê şekerbîz e
Le rêçûnê çi temîz e, sune û murqab in îro

We min wê kir cewr û sitem, ro we min hilanî qedem
Le min bêçarê derd û qem, je yarê xelat in îro

Quşe xalê royan xaye, sîngê buz gerdensira ye
Eql û hûş le min nemaye, je min ictinab in îro

Nizanim je min deqarê, işqê lê kar nekir carê
Behrê muhebetê yarê, je min ra girdab in îro

Ew bihar û xezanê min, ew sultan û xanê min
Bijangê wê le canê min, me'mûrê ezab in îro

Je işqê wê bûm bedhal e, şevaro dekerim nale
Hêstira min jale jale, natira sehab in îro

Ez gugerçînê dilxeste, we mismarê sitem beste
Je bend û qeydan guseste, şehbaz û uqab in îro

Le min ket birîna karî, xwîn je dila min bû carî
Sebr û tabê min ferarî, guya le qerab in îro

Je xelkê bir qem û surûr, we cemalê xwa ye meqrûr
We rê tere mest û mexmûr, jê ra dil kebab in îro

Tûlek* terlan û laçîn e, terene çîn û maçîn e
Lêvnazik didan înçî ne, murwariyê xoşab in îro

We tîrê işqê hencalê, dilê min bir wê delalê
Pencê mîna gulê lalê, we xwînê xezab in îro

Şemalê wê gulendamê, le min xist ketime wî damê
Ket bîna wê le meşamê, ya 'etr û gulab in îro

Namê mest e nam xumar e, fekşîrîn tutî guftar e
We zulmê bûm giriftar e, rehm û rûz nayab in îro

Namê hûr e, namê qilman, jê ra giştî bende ferman
Le ber wê medhûş û hêyran, mah û aftab in îro

Zendê buz in bilûrfersa, gorcîduriş û rewş tersa
Le canê min xedengasa, du tîrê şehab in îro

Mîna bulbul dekem feryad, je dest wê gulê hemradad
Je sebr û sukûtê naşad, can û dil bêtab in îro

Min nizanî we vî tura, we min dekir vî cewira
Gulêne wê je Kurdo** ra, zencîr û qulab in îro

* Ref, rêzeke dirêj ji balendeyan.
** Hin caran Ce'fer Qulî xwe weke Kurdo bi nav kiriye.



## 47. Kelamullahê Natiq Ya Elî

**1.**
Ehlê îmanê ra ser o serdar sabiq ya Elî
Alemê şer' o kelamullahê natiq ya Elî
Kaşif o danayê esrar o heqayêq Elî
Mezherê envar û melca'ê xelayêq ya Elî
Mesnedarayl Resûlullah o sabiq ya Elî

**2.**
Rûz o şeb gûyem senayet êy şehê kon û mekan
Bam xezra bax tûba sethê xebra uns o can
Toqê ma toqê me'anî nexlê torê qudsiyan
Zulfê sunbul nayê bulbul xendêyê gul xoş zeban
Îzed paket nimûdê, pak ez cem'ê elayêq ya Elî

**3.**
Mîşeved der rûzê kîn ez tîxê burhanet cuda
Eql ez ser ten zê hûş ez sema
Tîx ez kef silk ez sef reng ez rux dil zê ca
Cism ez can ..... nûr ez ş'ua'
Geşte eslê dîn zê bazûyê to fayêq ya Elî

**4.**
Ançinan sît to gûya behrê S'ebanê nebî
Damê merg o narê sûzan çerx reng e'eda' kunî
Kûh şikaf û kufrefken dil gusel
Xûnfişan o du zeban o cansitan cêyhûn...
Saxtê zî fethê mexrêb ya mişariq ya Elî

**5.**
Çon şeved rûzê qiyamet edlê yezdanî bi pa
Ehlê mehşer eleteş gûyan ez tabê heva
Asiyan gerdend ez xem xerqê tûfanê bika
Zan teref *Ce'fer Qulî* ayed bi sûyet pur gunah
Va rihanî ez çonîn hol o mezayêq ya Elî



## 48. Le Şe'nê Îmam Reza

Êy zaminê qerîwan sultanê Xorasanê
Tu sir û elxefiyat hem ayatê yezdanî
Giştî eyan le ba te aşikar û nihanî
Danayê raze nihan we hikmetê subhanî
Nizanim Sulêmanî ya Mûsayê emranî
Ez hatime dergay te des hilanîme dua
Kî dadresê bêkesan le bê penahan pena
Je te dexwazin hacet sultan û şah û geda
Le şanê te bû nazil sûreyê Şemsulzuha
Tu menzûra êncîl û torat û hem quranî
Guldestê te tijî zêr e we birûsk û mutela
Melekan sucde dekin şeva ro dewîn sena
-------------------------------------
----------------------------------
Je dû îmamê heftum tu yî rêwerê cihanê
Êywanê te zêr û zîv we erşê heq berawer
Hozê Ismayîl tela manendê hozê koser
Sewa me gunehkaran şafê'ê rozê mehşer
Helalê muşkilatî le me îmam û rêwer
Yadigarê pêxember hem mezherê îmanî
Qewrê Harûnereşîd je xakê te cuda ye
Ew xelîfe ço Fir'on le dergay te gida ye
Şermsar û gunehkar le wer derî tem aye
Xakê derê xanî te le herdê dewa ye
Em elîl û hem bîmar tu tebîb û dermanî
Le'net bêwi le Memûn daye te zehrê cefa
Ne fede je Mustefa ne şerm kir je Murteza
Ne wî kişand xicalet je Sediqey Kubra
Ne tirsiya je xwedê ne bake rûzê ceza
Tu zaminê cêranî sultanê Xorasanî

## 49. Reza Zaminê Ahû

Êy le husnê te pêyda envarê padişahî
Le ilmê te hovêyda sifîdî û siyahî
We tofêylê te berpa je xor ta gav û mahî
Şaf'ê cin û beşer le ersey uzrxahî
Le fikrê te nihan e sed hikmetê êlahî
Mustecab dewi dua le wextê subgahî
Ya zaminê qerîwan tu umîd û penahî
Je gerdişê felekê je kevakib mehnûs
Sitem le te bê hed bû je des çerxê abnûs
Ta Memûn te şehîd kir we sed hesret û efsûs
Dil kende kir je veten je ehlêbiytê meyûs
Rewanê Xorasanê musafir bûye rû we tirs
Ta le milkê qurwetê bûyî mehcûr û mehbûs
Ya ziminê qerîwan tu umîd û penahî
Êy tu je ced û aba xwediyê vehî û ilham
Mehremê sirrê xwedê le her emrê û nizam
Alêm bi ilm mektûb û namektûb islam
Le torat û incîlê le zebûr û le kelam
Memûn sewa qetlê te rûnişt le fikreke xam
Îlçî rakir le îlçî name sa te şand be nam
Ya zaminê qerîwan tu umîd û penahî
Je muciza te biwêm ilm û xired nade yad
Le nav cûlgeyê Meşedê te dî şexseke seyad
Girê daye cêranek we xwe lê bûye celad
Heywanê zimanbeste ta tu dî kişand feryad
We te ra got ya îmam je des vî zalima dad
We zaminê we êhsan min je bend bike azad
Ya zaminê qerîwan tu umîd û penahî
Ger nicat bidî min tu herime wî demanê
Şîr bidime tiflê xwe le berr û biyabanê
Dîsa ez tême xidmet we hurmetê quranê
Qerez tu bûyî sebebê xelasiya wî heywanê
Le wê je canibê heq bûyî zimanê cêranê
Azim bûyî teşrîf birî ta Mervê Xorasanê
Ya zaminê qerîwan tu umîd û penahî
Je yomnê qedemê te Merv bûye baxê êrem
Mamûnê xwedaneşnas le zahir şad û xurem
We ekabirê xwe va le tezîma te bû xem
Le behsê te alem saf kirin mazûn û mulzem
Memûn je edavetê kir karê ibnê mulcem
Wî murtiza we şûr kuşt wî tu mezmûm kir tu we bi sem
Ya zaminê qerîwan tu umîd û penahî
Meded ya Ebulhesen tu sultanê xerîbî
Je bêkesan tu yarî le bêmaran tebîbî
We rûzê xuldê berîn we qendîl û we zîbî
Ferzendê pêxemberî pakzad û necîbî
Le mabêynê sê sehnan pir va'êz û xetîbî
Je dû xwediyê subhan *Ce'ferê* endelîbî
Ya zaminê qerîwan tu umîd û penahî
Barilaha bi heqê Reza zaminê ahû
Şevek bêwi xewnê min Milwariya çişm cadû
Ew mîna cêranekê we min biwi rûbirû
Hêsîr ke min we dû xwe ew we kemend gîsû
*Ce'fer Qulî* şev û ro dewê Ellah ya Hû
Tebîrê vî xewnê min aşikar ke her çi zû
Ya zaminê qerîwan tu umîd û penahî

## 50. Rojê Qiyametê

Ezîza min derxwast kin je pêxember şefa’et
Şefa’etê wê royê ku xelk dekin nedamet
Je me ra hasil newi melalet û melamet
Zerêkê aga biwin je ehwalê giyamet
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Xwedê bike newinê je sere wan tayfan
Merhemetek bixwazin je xaliqê ins û can
Je lutfê xwedawendî me'yûs bûye şeytan
Hûn hergiz me'yûs mewin je dergay heyê subhan
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Elo xelko bixwazin rehmetê xwedawendî
Tu kes le derd nakevi le roya hacetmendî
Je şerarê ateşî ew roya perakendeyî
Yom: Yomulmucrim min ezabê yeftedî
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Ezabê şedîd dekin gunehkaran ew mimet
Xetakaran wê royê je kê dexwazin hacet
Qelbê selîm û xalis dexwazin û keramet
Eleman û elhezer je wî royê qiyamet
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Ademîzadê gumrah tu hergiz mewi mexrûr
Le dergahî êlahî je ta'etê mewi dûr
Hesreta lilalemîn we xwe rat û mewe gor
Je zexîrê vî dunya qiyamet deke zuhûr
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Eleman eleman je royê bê dadresî
Bêzarî hasil dewi min "umê ve beniye"
Yom yefer elmer min exiye ve ebiye
Likul emir minhum hingam şan yuxniye
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Eleman, elhezer je tercifelracife
Je je hul û je herasê ebsarhum xaşi'e



Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Eleman eleman je numîd û nidamet
Kafer dewi mukeder êndelesrê elqiyamet
Ya leytenî turaben yom teqomelsa'et
Ve la yoxize minha ve la yuqbel şefa'et
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Ez feqêrê bêçare je bêwacî bedhal im
Je işqê Xwedawendî natê keman bedal im
Eleman elhezer yom ye'êzuzzalim
Yeqol yalîtenî biqol ferdê alem
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Je xwabê xeflet rawi ademîzad je qeza
Yoma la teczî nefs en nefsin rûzê ceza
Ceza'o sey'tetun misluha
Ze cerde kin lo xelko tayfê betşen ve meza
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Tu bigê we dadê min êy dadresê dadresan
Inî mexlûbê feqêr êy nasirê mexlûban
Je rojê qiyametê dilê min bû herasan
Taqet le min nemaye je zecrê gunehkaran
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
Xafil mewin agah win je ezabê qiyamet
Sewa mesiyetkaran ceheneme elamet
Je dergahî kibriya numîd mewin yêksaet
Je osafî Xwedawend cod û bezl û sixavet
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran
*Ce'fer Qulî* li hêçê omrê te bû temame
Te ku tu fayde nekir biciz ku bûyî bedname
Le şanê bedêqbalan va ecayêb kelame
Nikam ku cewab bidem ez le yomulqiyame
Xwdawenda rehm bikî le giştî gunehkaran

## 51. Pûr û Peşîman Dewin

Xelko herçi defkirim ez le rûyê cihanê
Pirs dekerim je her kê nabêm razê nihanê
Dexwazim kohensalek ez je ehlê zemanê
Ta ku je wî pirs bikem je gerdişê dewranê
Axir rok dewi xelko, Pûr û peşîman dewin
Eger çi mest û huşyar eger çi giştî dîn in
Hergiz le milkê xelkê toxmê xwe hûn meçînin
Sere xwe hûn hilînin temaşe kin biwînin
Le kaxê padişahan bûmê şûm çer dexwînin
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Serê xwe hûn hilînin carekê nezer kerin
Çol û welatê dune hûn zîr û ziwer kerin
Herin je goristanan carekê guzer kerin
Ta batil fikrê dune je serê xwe der kerin
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Eger Cemşîdê cem win xelko eger Iskender
Le Çînê biwine xaqan le romê biwine Qeyser
Eger zêrînsol biwin manendê Tûsê Nuzer
Eger çon Efrasiyab Tûran biken musexer
Axir rok dewi xelko Pûr û peşîman dewin
Kanê Zehakê mardoş kuda çû Cemşîdê cem?
Ka Kaweyê ahenger sahibê tuq û elem
Kanê Firêydûnê kêy kanê tûr û kanê selm
Ka Îrec şahê Îran ku ew kuştin we sitem
Hûn jî royek dewi xelko pûr û peşîman dewin
Kanê şêrê Tirkistan pehlewan Efrasiyab
Neheng le binê deriyê je bîmê wî dil kebab
Şêrê nêr je tirsê wî le bîşe tunewû xwab
Le rûzê mêydanê ceng zehrê fîlan dekir av
Axir rok dewi xelko hûn jî peşîman dewin
Ka Kêykavûsê xodkam darayê text û kulah?
Ka Nuzerê Şehriyar ka Qubadê padişah?



Ka nucewan Siyaveş seri birîn bê guneh
Ku da çûye Kêyxusro sahibê xêl û sipah
Hûn jî rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Ka Zerdoştê pêxember ka azer û azergah
Kanê Gerşaspê yel Xwedawendê ferr û cah
Je rah eql û daniş bena kir wî ateşgah
Ka Geştasb û ka Lorasp ka ew Ercaspê bedxwah
Kuda çû ew Zalê zer ka Sîmurq û Tehemten?
Kuda çû Gîvê Qûderz kanê pehlewan Behmen?
Kanê Isfendiyarê şehsevarê royînten
Giştî çûn le bin xakê girtin menzîl û veten
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Ka Berzû û ka Sohrab pehliwanêne reşîd?
Kanê Rustemê destan qatilê dêvê sifîd?
Giştî çûn je cihanê des we tal û naumdî
Va dunyê bê êtibar we kes nemaye cavîd
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Ka Iskenderê Rumî sahibê textê lêlac?
We zorê bazûyê xwe je xorşîdê hilgirt bac
Heft Iqlîm kir musexer je şahan hilgirt xerac
Seddê "yacûc û macûc" çê kir sa bike elac
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Xelko rindtir fikir kin kanê tacê kiyanî?
Ka kesra Nuşîrevan ka silsilê Sasanî
Ka silisilê Sefevî ka Şah Ebasê sanî?
Kuda çû Nadirşah ku je Hindê Xerac hanî?
Axir rok dewi xelko Pûr û peşîman dewin
Ka îwana medayên kuda çû Xusro Perwîz?
Dunya wî kir musexer we zerbê tîxê xwînrêz
Ka Şîrînê mehleqa kuda çû hespê Şebdîz
Direfşê kawiyan bû we destê duşmen rîzrîz
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Kuda çû Sultan Mehmûd lo felekê kecmedar
Je wî bû dil mukeder Firdûsiyê navdar
Ka Nadirşahê Efşar je duşmen hanî demar

Hind û Rum kir musexer duşmenê wî tar û mar
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Xelko hûn huşyar biwin dune beqa tunîne
Ademîzatê gumrah eslen heya tunîne
We zindetê demirî kesê se kesê sax we tunîne
Hûn je heq mewin xafil dune wefa tunîne
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin
Bêçare *Ce'fer Qulî* navek je te bimîni
Ezrayîl ku bû mêvan ew hale te nawîni
Çengê tavê canê te reg we reg dekişîne
Hînga tu rindtir zanî dunya le kes namîni
Axir rok dewi xelko pûr û peşîman dewin



## 52. Şêrên Perakende

Tu şem'eke herem î ez sa te ra perwane
Işqê te da serê min je xwe bûme bêgane
Le husnê te periyê alem giştî heyrane
*Ce'fer Qulî* dexwîne je işqê te mestane

Weçen min sa te ra got engezên min westiyan
Mîna berxê dê miri sa te dame bangiyan
Mîna Mecnûn we pêy te degerim serê riyan
Nalê Ferhad sa Şîrîn dekolim kevirê çiyan

Dilwer je mal we derket we dulaqê narincî
We kurikê ewrîşem leyaq we solê Gurcî
Şîrîn şîrîn gep dekir we zimanê kurmancî
---------------------------------------------

Verketime çiyay Mervê ez le redê mahwerê
Tav xwar wê le min fikirî piştê xwe da kemerê
Mîna merganek naşî kişiyame yaterê
Çel û çar dua pê ra yêk je wan yê nezerê
Ez lê mat û hêyran mam sekinîm le hemberê
Gulgûn rûy te xwê daye mîna şevnêmê şevgîr
Biriyê te mîna kewan bijangê te hemço tîr
Zulfê te helqe helqe natê daneyê zencîr
We carê le min fikiriyî we dû te bûme hêsîr

Xwedê le min xezew kir çere min der we der kir
Têrek we bal û per wûm çere bê bal û per kir
Kevir kuçikê dunê giştî we ser min wer kir
We ademê nadan ra heval û hemsefer kir

Durne terin le asmên perîzadek le nav e
Hem we refş û qeşeng e hem je wan nav zirav e
----------------------------------------------------
--------------------------------------------------

Pir zanim kêm dewêjim guher xerîdar tune
Bendelek pir giran e xahan û tucar tune
Dilê minê we xof e muminê xemxwar tune
Kes mîna min giriftar hem bê qerar tune

Her çi ez fikir dekim işqê je eqlê dûr e
Her derê işq tere eqlê we dû mecbûr e
---------------------------
Kesê aşiq bê eql û bê qerar û bê hedûr

Qirmiz bûye rengê te je qudretê êlahî
Fekê te xunçeyê gul didanê te telayî
----------------------------------
------------------------------

Ce'fer Qulî bêçare dûr ketiye je Îranê
Dilê wî sirfe nîni ve ke le her meydanê
Nalê Yûsif je des dil ew ketiye zindanê
Mîna Kerem hawar e le redê Esilxanê

Heda dewû rû we rû extelat dekir deçû
Dilê minê intizar çavê minê hîn we dû
Xwedawendê karsaz çi kiriye rengê rû
Şevaro we dû yarê ez dekşînim ya Hû
Ya mergê min we min gîn ya miday min bide zû

Şev û ro je xemê dil mîna bulbul denalim
Aqibet le min tune je işqê elferar im
Ez Mecnûn û ew Leylî sewa wê bê qerar im
Şeva royê nalan û sa wê ra daxdar im



Tuwe deşe te bikem ba ser bikin cudaye
Min tune malê dunê va canê min feda ye
Hêsîr kî ya bikujî hukmê te yê rewa ye
*Ce'fer Qulî* sewa te des hiltîni duaye

Ez hulistiyam hulistim bênijîm û sewir hat
Şevereş bû roşenayî temaşe kir perîzad
Kesek mîna wê tune le cinsê ademîzat
Dilê min bir we xwe ra nalê Şîrîn je Ferhat

Yarê minê qeşeng e neslê je hûriyan e
Ta biwînim nas dekim je çavan û biriyane
Gulbûta derê heştê gulê le nav baxan e
Nam Seyad e nam Leylî nam Şîrîn Esilxan e
Işqê wê ez şewtandim mîna merê çiyane
Careke din bûwînim le dil namê ermane

Qesem we navê Xwedê çûme ser kaniya zelal
Bal şekerê selsebîl melekan jê girtin bal
Va dunya bê wefa ye le her tiştê tê zewal
Malê dunê siyê dêr satê te dekin xoşhal
Ne wefa le hesp û şûr ne le jinê we cemal
Ne hurûf teva dewin ne jî ziman dewi lal

Îro gotin bihar e ewravî guregur e
Je asmên da debari lel û cewahir durr e
Mêr ku we xêretbiwin malê le dunê pirr e
Jin ku we kemal biwin çêtir je zîv û zêr e
Kesê bêdil zewicî je xelkê ziman kurr e

Çavê reş û zulfê hej xunçe benefşê xoşnigar
Didan mircan durrê xeltan hûr û xilman bendewar
Şev û royê ez je işqê te degirîm zar zar
Nazenînê mehcebîn xoşzimanê çavmerar
Dilbirîn im pirxemîn im min nema sewr û qerar

## 53. Dîdarê Te Dexwazim

Dîdarê te dexwazim mirim je intizarê
Şevaroyê ban dekim dilwer je min meqarê
Perde je royan hilîn biriyan nîşan de carê
Can û malê xwe bikim ta qurwane te yarê

Îro le pigêh şemalê siwê rawû
Zulfê yarê perîşan le ser rûyan bela wû
Wesf û zikrê cemalê yarê bê intihwû
We bejn û balê yarê le dunê peyda nawû

Herdem dewêm we efxan carê bike nizare
Sed aşiqê mîna min sewa te bê qerar e
We kullan ra mayêlî je min dekê kinare
Sa ew ew mal û dewlet ez feqêr im bêçare

Le xelkê mêhrewanî çima le min we qarî
Ez we baysê te bûme je milkê xwe ferarî
Laçînek im tav dexwim le ser te kewê marî
------------------------------
Tu naz û xemze meke dilê min tab tune
Je feraqê rûyê te çavê min xwab tune
Derd û xemê min pir e belkê hesab tune
Satê were paliya min meger sewab tune

Nam tûtîwû nam perî ziman bûye risale
Evelê dunê şîrîn axirê dunê tal e
Her kê va duniya kirrî ba verxini qewale
Her kessek le vî duniya je eqlê xwe xoşhal e
Serê giştî doletan xelko eql û kemal e

Mest û mestane dilwer
Je xet û xalê yarê dilê min bû kewawe
Je feraqê rûyê wê halê min bû xerawe
Ne nîşan dede ebrû ne dekere sewawe
Her çi min je wê pirs kir nedaye min cewawe
Ah û nalê min we dû çû asimanê dilwer

Balabilind e dilwer bejnê wê bû çinare
Je hesretê rûyê wê derdê min bû hezare
Ez demirim we derdê wê sa min tunîni çare
Nizanim va çi derd e nizanim va çi kar e
Gahî le min we qar e gah mêhrewan e dilwer

Çima tu nêyî palê min carek je mêhrewanî
Tu xwe je min mede yan meger tu hîn xizanî
Ez aşiqê rûyê te meger we xwe nizanî
Bulbulê zarê te me tu gulê bûstanî
Le hemer nemayan wi mest û mestane dilwer

Dilwer carê nezer ke le halê min bike rehm
Dost bûye şad û xurem duşmen bimiri je xem
Je hesretê rûyê te her du çavê min we nem
Carê we min ra gep ke we min ra biwi hemdem
Sa te bûme bulbulê hezardestane dilwer

Welat nema min tevda geriyam le rûy zemîn
Ban kirim û lalijîm ta ku ketim je zimên
Je işqê te senemê cîgerê min bûye xwîn
Heft salin le min bûye dunya qaf û fê û sîn
Tu le kax û bezmê xwe ez le çiya ne dilwer

Sewa te yarê qeşeng dilê min bûye biryan
Şev û ro nalê Mecnûn aware me le çiyan
Leylî je feraqê te ez bûme dîde giriyan
Je hicrê te le ser min dunya bû axir zeman
Qom û xwîş û eqreba bûne bêqane dilwer

Xelko dunya le ser min bûye zindan û qefes
Xem û xusan ez xwarim le dunê mame bê kes
Her çi xelkê we min kir min go: Xwedawend û bes
Je des zemanê kûtî je min everneket nefes
Le serê *Ce'fer Qulî* teng bû zemane dilwer

Yar were ser xakê min mezarê min bilivîn
Wê bejn û balê rena we nekîran binimîn
Je serê wan biwe hûş je wan bistîn eql û dîn
Wê namê emalê min ji wan hilgir bidirîn
Hînga daye destê min je bin xakê bikişîn
Ta biwînin qudretê Xwedawend le rûy zemîn
Je husn û cemalê we xewer biwine asmên
Le ser serê min bise mest û mestane dilwer



## 54. Milwarî Rind e

1
Gulê xunçe lêv xendan kir
Alem pîrwû pak cewan kir
Cîgerê me wê biryan kir
Çav qereqaş e bejn teraş e
Yar qizilbaş e çek je qumaş e
We lefzê xweş kirime nexweşe
Ellah Ellah Ellah Xwedêyo Milwarî rind e
Milwarî boz e we mîna qund e
Arê işqê Milwariyê tund e
Destê min nagê bejn bilind e
Hilmê Mesîha Xwedê we min de
Tu sebrê Eyûb Ellah we min de

2
Zendê mîna zillê rewacê
We tu torê nakim elacê
Çere hiştim wê je zewacê
Çavê nergisê şehdê xalis e
Mîna tawûsê nuqla meclis e
Ellah Xwedêyo ecew mûnis e
Ellah Ellah Ellah xwedêyo Milwarî rind e
Milwarî boz e we mîna qund e
Arê işqê Milwariyê tund e
Destê min nagê bejnê bilind e
Tu destmalê xwe we min de
Yadigarî tişteke rind e
Ellah Ellah Xwedêyo Milwarî rind e
Hilmê Mesîha xwedê we min de
Tu sebrê Eyûb Ellah we min de

**3**
We rê here we girani
Te şewitandim we xizani
Derdê dilan kes nizane
Çavê xezal in birû hilal in
Rûyê we xal in lêv şekerbal in
Kaniya zelal in cayîl denalin
Ellah Ellah Xwedêyo Milwarî rind e
Hilmê Mesîha Xwedê we min de
Tu sebrê Eyûb Ellah we min de

**4**
Nam tu perî nam ku hûrî
Mem enar û sîng bilûrî
Hêfa te ku je min dûrî
Çav cadû ne kewan ebrû ne
Enber gîsû ne xalê Hindû ne
Her du memê mîna lîmû ne
Ellah Xwedê Milwarî rind e
Arê işqê Milwariyê tund e
Destê min nagê bejin bilind e
Hilmê Mesîha Xwedê we min de
Sebrê Eyûb Ellah we min de



**5**
Nam newatî ya şeker î
Şîrîn şîrîn gep dekerî
Mîna kewan we rê terî
Çavê badam e zulf elîf lam e
Hîvê temam e çav we dû mame
Ellah Ellah Ellah Xwedêyo Milwarî rind e

**6**
Çavêne reş kanî kanî
Min kildanek jê ra hanî
Çav pir reşwûn kil hilnanî
Çavê xuraman gulê şamaran
Baxê dutarin mem sêv û nar in
Cayîlan je wê ra ustexwarin
Arê işqê Milwariyê tund e
*Ce'fer Qulî* wê kiriye bênd e
Ellah Xwedêyo sewrek we min de
Sewrek we min de

## 55. Wesfê Elî

Wesfê Elî we der ket je her teref hat leşker
Dor ta dorê Medînê xendeq kişand pêxember
Je Xwedê da hukum bû rabûye kevrê mermer
Je nav kêvir da verket ew Zulfeqarê duser
Le wê royê Elî girt pêşî le Emroenter
Elî nerêkê kişand lerzî zemîn û asman
Nazil bû rûhulemîn vegirtiye per û balan
Baskê Elî le hewa hînga girtin melaykan
Zerb negê gav mahî ta dunya newi wêran
Du leşker nizareger le halê Emroenter

Elo xelko biwînin kar û barê vî dunya
Ne bira we birê ye ne law û bav hev ra
Le şikestê hevalan sond dexwin Ellah Billah
Nan nemekê nas nakin bûne şêtan û gumrah
Dunya ku ew dunya ye va dunya bê wefa ye

Le vî umrê tûlanî pir geriyam le cihanê
Şûnê genimê dême dîm le textê Doletxanê
Şûnê keçikêne xunçe serhedê Cirîstanê
Şûnê kall û qerpozan va cûlgeyê bin Bêganê
Welat nema min tevda bûme arê hefşanê



## 56. Gulcihan je min bû cuda

We kemendê gîsûyane we xencerê ebrûyane
Cîgerê min kir biryane senivişţê min haka wû
Aşiqim derdê bê derman tebîbî wî xaliqê subhan
Tu mehbûb nawi Gulcihan ruxa wê perî nemawû
Le husnê mah û perwînê we goftarê pir şîrîn e
Le reftarê xwe metîn e va çi fitne çi bela wû
Le refşê hûr û xilman e navzirav mûrçe miyan e
Ar berdaye cism û cane arê ku hêç xeva nawû
Felekê ez kirim xwar e we xem kirim giriftare
Gulcihanê berqerar e rûh je cismê min riha wû
Xussan le min kiriye rîşe derbiderî bûye pîşe
Je min biriye qom û xîşe pir kareke narewa wû
Le cem hîva çardeh ez xemgîn û ew dilşad e
Je des wî dekşînim dade virda min zikrê ellah wû
Serayê gerden bilûr e sa min çê kir şerr û şûr e
Je vetenê kirime dûre oxir le wer min venda kir
Lêvxunçe û mehcevîne sîmîn ruxê nazenîn e
*Ce'fer* jê ra dil we xwîn e hêsîrê wê dilruba wû
Evel Mecnûn duvum *Ce'fer* işqê le wan hilanî ser
Je milkê xwe bûn der we der eql û dîn je wan cuda wû

## 57. Qehbe felek

**1**
Qehbefeleka fanî ez danîm le hicranê
Ez kirim lamekane degerim le cihanê
Tegerga xem le min xist ketim je aşiyanê
Bulbulek wûm bûm asa şûn girtim le wêranê
Çon perwane şewitandim le şem'ê şebistanê

**2**
Heray je des felekê qet nekirim xoşhale
Carê nekirim xurrem kirim bê per û bale
Wê pirmikrê pirhîle oxetê min kir tale
Ew lobetê ferengî temaşeê wê helal e
We vê tora kes nedî le rûy giştî cihanê



## 58. Eya Xaliqê Ekber

**1**
Je meşriq ta we mexrêb cihan giştî ser bi ser
Hem cubûb û hem şumal cumligî min kir nezer
Le her ku min guzer kir manend bad serser
Rind û kûtî carî bû hem je zêr û hem je şerr
Merganek im tav dexwim daîmen le berr û behr
Le şanê şîrîn yarê dexwînim şê'rê ezber
Haware me le çiyan eya Xaliqê Ekber

**2**
Xwedawenda çi cenet min dî le rûy zemînê
Benefşe gul û giya ez têr nawim je bêhnê
Dilengîz e û xoşbêhn mîna zulfê şîrînê
Eql û hûşê min biriye işqê wê nazenînê
Cilveger bûye le dil je dil rakiriye kînê
Laçînek im le çolan we pêy wê gogerçînê
Sizawar im le çiyan eya Xaliqê Ekber

**3**
Rencê dilê min biriye nizanim çi çiya ye
Seyl û siyahet dekim çi we zoq û sefa ye
Nesîmê wê rûhbexş mu'ter canfeza ye
Je gulistanê êrem giştî tişt le wê xuya ye
Tecub û teheyur je her teref nemaye
Je asmên da nazil bû quranê aye aye
Degerim ez le çiyan eya Xaliqê Ekber

**4**
Le çar teref defkirim munever û nûranî
Reng we reng û direxşan je qudretê yezdanî
Je her aliyê rewan e kal û cû û kanî
Le çêrê sergerm bûne hesp û pezê Êlxanî
Bereket firêwan bû je raziqê subhanî
Sizawar im sergerdan êlaha rindtir zanî
Bê heval im le çiyan eya Xaliqê Ekber

**5**
Alem sirrulxefa tu yî vaqif je halan
Perdepûş û êybpûş asan dekî muşkilan
Ez feqêr im û muzter muflis û zar û nalan
*Ce'fer* bûye perwane meşewitîn per û balan
Mîna bulbul dexwîni şevaro le ser gulan
Je fezl û keremê xwe we hev gîn her du dilan
Xelas keme je çiyan eya Xaliqê Ekber



## 59. Sehergeh çon zaqê şeb ser hilanî roşen bû

Sehergeh çon zaqê şeb ser hilanî roşen bû
Şefeq lêxiste asmên alem sef û gulşen bû
Bejnê yarê nemayan hem ço servê semen bû
Herdu zulfê le tawê mîna sunbul sosen bû
Xoş sûret û şemayil Zulêyxayê zeman bû
Rabie bint Ke'b ya Şîrînê Ermen bû
Zinexdan avê heywan xoş xebxeb û zeqen bû
Birû hilal çav kejal ew serayî gerden bû
Nizanim perîzad wû ya hûriyê rizwan wû
Wê xezalê çeşm mest ez kirime dîwane
Le cennetê beşerî goya hûrê canan e
Helqe helqe pêç û tab we zulfê zerefşan e
Mahrû û perîveş pirfitne û fesan e
Le rê çûynê qeşengtir je kewêne çiyan e
Fek we ken şîrînziman xoşxû û mêhrewan e
Eger ferman dideri can dekeme qurwane
Ta zaniwi ço Qêyser ewê hukim rewan e
Nizanim perîzad wû ya hûriyê rizwan e

## 60. Qadirê qudretnema

**1**
Qadirê qudretnema xaliql leyl û nihar
Barilaha bike rehm le bendey gunehkar
Bendê te pir gunahin le cem te pir şermsar
Je kerem tu bibaxşîn curmê bendey xeffar
Rehm ke tu le bendey xwe çon rehman û rehîm î

**2**
Êy raziqê mêhrewan çi bêjim ez ê bende
We xiclet û rûreş im le ba te ez şermende
Kes nikay le dergay te bikere çon û çende
Curmê bende bibaxşîn ta biwime xursende
Rehm ke tu le bendey xwe çon rehman û rehîmî

**3**
Êy xaliqê bê hemta xellaqê her du alem
We emr û qudretê te xelq wûye cin û adem
Av û xak û bad û ar îcad bûye je edem
Te sê bendê gunehkar amade kir cehenem
Rehm ke tu le bendê xwe çon rehman û rehîm î



**4**
Je wan sifetêne te yêk celîl û yêk cemîl
Heq resûlê ekrem haqiyê kullê sibîl
Kes nekî xicletzede tu le cem qom û qebîl
Le vî dunyay bê wefa tu bende nekî zelîl
Rehm ke tu le bendey xwe çon rehman û rehîm î

**5**
Xiredmenda kerîma êy mêhrebanê alem
Le van xizanê qiçik je kerem tu bike rehm
Je dilê wan dûr bike melal û endûh û xem
Nesîbê kes tu meke renc û ezab û elem
Rehm ke tu le bendey xwe çon rehman û rehîm î

**6**
Xwedawenda je royê te em kirinê xilqet
Me nekir karê nîk û cuz gunah û m’esiyet
Heq resûlê ekrem ew e xatem risalet
Me we gunay me megir êy menbe’ê kiramet
Rehm ke tu le bendey xwe çon rehman û rehîm î

## 61. Dildarekê

**1**
Dil je min istandiye dilwer ecew dildarekê
Xoşgêl û nazik beden le bejn çon serdarekê
Pir we naz û pir we qemze zulf çon tomarekê
Fek şîrîn cadû ziman şeker fişan goftarekê
Gurciya ve'de xelafê tu bike iqrarekê

**2**
Gah birîn dekî dil û gahî dewê dewi derman dekim
Rûzê hicran û feraq we hatinek cubaran dekim
Serkêşî nakim dubare ta'etî ferman dekim
Dilwera ger tu bêwî can sa te ra qurwan dekim
Dil we dar im ta biwînim carekê dîdarekê

**3**
Êy senem serdarê xûban em le te mayîl inê
Fufsetê je des nedenê ta ku em cayîl inê
Der we der bigerinê goya ku em sayîl inê
Aşiq û m'şûq û em herdu le hev qayîl inê
Qumriya şîrîn zimanê tu biwêj goftarekê

**4**
Êy merarê çav kejalê ez giriftarê te me
Tu gulî ez bulbul im ez aşiqê zarê te me
Mehremê razê te ez le giştî esrarê te me
Nalê Mensûr her zeman ez le ser darê te me
Ez detirsim ku bimirim newînim dîdarekê



## 62. Sed hezaran şukr yezdan çon ku tu yarê min î

1
Sed hezaran şukr yezdan çon ku tu yarê min î
Durr şahvarê min î hem bext bidarê min î
Min ziman tune biwêjim tu giriftarê min î
Tûtiyê şîrîn ziman û mest û huşyarê min î
Mehremê razê min û mehbûb dildarê min î
Mahruxsarê min î û qismet û yarê min î
Pes bihêl va endelîba bêwi sa dîdarê te

**2**
Xwar û zarî pir mede êy dilberê gul pîrhen
Sebrê Eyûb hatiye min dilberê şîrîn suxen
Ez we baysêişqê te aware je milk û veten
Hemço Y'eqûb ez giriftarê xem û derd û mehen
Rûz û şeb nalan û şûrîde ço murxanê çemen
Le feraqê te denalim hemço şemê encumen
*Ce'ferê* te ustixwar e hatiye wer darê te

**3**
Ger bikujî hazir im ema peşîmanî çira?
Tune insafê te Lêylî bûme Mecnûn sa te ra
Le gulistanê umîd menzil bena ke sê me ra
Bulbulek şêyda û mest im bike mêhman sê xwe ra

------------------------------------------------------------
------------------------------------------------------------

Tu gul î ez bulbul im ez hatime gulzarê te

## 63. Badê Seba

1
Badê seba ger guzer kî cem dilberê mehleqayî
Biwêje aşiqê miskîn go: Çima weqes bê wefayî

2
Şedeng e ew le guftarê dil xoş dekim le iqrarê
Şîrîn e suhbetê yarê je esel bûye cudayî

3
Le min çi kir sîmîn saqê da serê min iştiyaqê
Ezê mame le feraqê va bela hat je êlahî

4
Vî derdê min tune derman je feraqê bûme giriyan
Cuda bûme je xaniman je des dame şekîbayî

5
Le me çi kir wê merarê wê merarê çemenzarê
Je min bir sebr û qerarê we pê xwa kirime hewayî

6
Wê Gurciyê wê mestanê wê bulbulê şûlistan
Berzengê berê kemanê *Ce'fer Qulî* kir şêydayî

Evel serê bismillê padişahê bê leşker
Elî le Duldulê nişt cilodar bûue Qenber
We du bêçiyê mubarek xera kir şehrê Xêyber
We Zulfeqarê duser girêda bendê Berber



Evel serê bismillê goftarê xwedawend e
Kare giştî bendegan le kaxanê wî bend e
Her muşkilê te hewi le dergay wî hesend e
Le vucûdî Xwedawend tu me ke çûn û çende

Bêlek perî we rê ket we pêşiyê
Herre te dilê min bir mesekin le qarşiyê
Mîna şem û kafûrê deşewiti le kaşiyê
Her kes bêwi rûyê te nawîni ne xweşiyê

Nizanim çi hesaw e dutar bûye kêm sida
Hûn fikirekê bikişînin bûme derwîş û gida
Kele we kele herim ta derê xaniyê Xwedê
Le k'ebe ziyaret kim ez le wê bikim dua

Barilaha guvahî le halê min ê hezîn
Bednam bûm le alemê sa dilwerê nazenîn
Je sûzê işqê yarê bûme xakisternişîn
Le vî dunya min nedî le wê dunyê we min gîn

Hat mûsimê biharê alem bû şad û xurrem
Bulbul çehçeh lêtixi qumrî denale her dem
Bedel bûye we işret xem û endûh û matem
Qudretê perwerdigar le her kuda mucesem
Çi feslek ba sefa ye yêkser gul û giya ye
Bêllek boz perî terrin yarê minê lê nas e
We tolaqê narincî .......................
Le wer geriyam eşkrîz her dem we iltimase
Nezer neker carekê je des min bû xelase

Je çavan hatin hêstir pir hatine min xiyal
Îmanê xwe bay medin keçikan medine mêrê kal
Ew ku terrine çolê dil nakine bêwine mal
Je guhçikan dewin kerr je zimên dewine lal
Ellah Billah ban dekin we caylan biwine heval

## 64. Li Şahrekê

**1**
Xelko xakê zemênê giştî zêrr û zîwer e
Weqes adem xwariye yêkser bûye cohere
Va xiştê lêtêxinin xakê cismê beşer e
Dîdê çavî Mecnûn û Milwarî û *Ce'fer e*

**2**
Lo xaliqê leyezel dil je xemê riha kî
Me tev li *Ce'fer Qulî* je lutfê xwe reva kî
Ya mergê wî bigînî ya derdê wî dewa kî
Milwarî namêhrewan pe wî ra aşina kî
Barilaha sa *Ce'fer* tu umîd û penah î

Terazû ne her du çav deşewitin nalê çirê
Je wê da tê rûyê xwe degiri we çadurê
Dilê xwedê bixwaze le karan naxe girê
Her wext ku te dewînim dewime cewanê berê

Ya zaminê xerîwan
Hasil ke miday dilan
Nûrê her du çavê me aqa îmam Reza ye
Quwetê baskê nema Eliyê Murteza ye

Eceb xwedawendekî kerîmê ba Edalet
Sewa bendê rûreş ra xilqet kiriye çi nêmet
Dexwine radekevine nakine şukrê nêmet
Le ortê me bedebextan ne izet e ne hurmet
Elo xelko bifikirin hûn le sun'ê êlahî



Çima je min derevî ez nîn im bebr û piling
Her der ku min dewînî goya dewî reng we reng
Gûşê teng û xelvet tu ra biyarem bi çeng
Te bikîşnim kinarek satê bikim nesîhet
Elo xelko bifikirin hûn le sun'ê êlahî

Xwedawenda le asmên bendê te le rûy herdê
Dekene karê kûtî le ser tavêjî perdê
Ademîzat gumrah... perde redê
Eger tuwe nekene je ser hilînî perdê
Elo xelko bifikirin hûn le sun'ê êlahî

*Ce'fer Qulî* bêçare daîm deke munacat
Pêşî le wî girtine bêllek je keçikê tat
Le refşê wan nê dunê xelko hêyhat hêyhat
Şîrîn şîrîn gep dekin şîrîn je qend û newat
Yêk je wan bê hemta ye xwedo bike berat

Çûme derê wê qarê du gogerçîn tê da ne
Yek je wan yarê min wû yê din xwe daye yane
Yarê min berve min hat lêv we ken û xendan e
Mîna hîveke çardeh xalekê le rûyan e
Bervê çûm ta canê xwe lê bikime qurwane

Çûme derê wê qarê Milwariyê we tenê
Zulfê xwe şane kiriye daketiye bin çenê
Ez bûme nêçîrvanek kişiyame kemînê
Le husnê wê min nedî ne le çîn û maçînê
Ne le Rom û ne Şamê ne le Hind û Yemenê
Çûme derê wê qarê min dî du hûr û perî
Işqê wan da serê min je wê bûme serserî

Çûme derê wê qarê periyekê denalî
Sîsebozê perîşan natê miyan dekalî
Je meşriq ta we mexrib rê yê hezar salî
......................................
Evel serê bismillê goftara pêxember e
Diyanzdeh îmam ber heq in cenaw Elî serwer e
Şûnê ademê mumin le ser "huzl juser" e
...............................................
Evel serê bismillê va dunya berewat min dî
Ademîzadê gumrah Ezrayîl celat min dî
Le çiyan nema qerçixe felek seyad min dî
Le vî dunyay bê vafa qewristan awat min dî

Dilê min we te ra çû tu çere nazenîn î
Le mertewê bilind î tu halê min nawînî
Kaxazekê bişînim melle nîn î bixwînî
Je hesretê dilê min xewerekê hilînî

Milwariyê ra biwên rawi je xwabê xurûr
*Ce'fer Qulî* bêçare îro je te ketiye dûr
Ne le joniyan quwet ma ne le çavan maye nûr
Je dûriyê te senemê le wî nemaye hedûr

Oris ingilîs girtin serheda Çîn û Maçînê
Rûniştin le butxanê ta xera ken xaney dîn
Işqewatek çê deke û şehr dekî ayîn
Muselman û Ermenî we hev dewin hem qerîn
Va dunyêk bê wefa ye ... boz perî
Ya Ebasê elemdar tu serdarê leşker î
Umet je des çû verket tu şêrê dilawer î
Heft eflakan xrraw ke .................



Çirê le pêşî xwe vêx ronay bide qewrê te
Eger we xwe neşîni kesek nayîne we pêy te
Eger batinê te rind we dîsa xoş we halê te
Eger qasir bûyî tu Elî bigê dadê te

We navê xwedawendê mezin
Xelko sa we ra bêjim je layînî qehreman
Je wan merzdarêne we heng û nav û nîşan
Sîngê xwe kirine siper jin û mêrê pir talaş
Pişt we pişt le vî xaka wan kirine guzeran
We desteke wan da şûr hem gurz û tîrkewane
We destê din quran û le Îranê nigehwan
Je wan şêre mêran û wan jinêne kîvanî
Seferaz ma islam û Xorasan û hem Iran

Êy xaliqê bêhemta êy nûr je te bûye nûr
*Ce'fer Qulî* bêçare je des dil bûye mehcûr
Nizanim çi kar bikim je des vî dilê nacûr

Je xwedawend nida hat êy bendeyê ser we şûr
Le ba her namehremê derdê dil meke zuhûr

Elo xelko biwînin le gerdişê zemanê
Nerre şêrek peyda bû le xakê Çinaranê
We sexawet hunermend ço Rustemê dastanê
Pîlê ezîm girê dan birine wî dîwanxanê
Dunya ku ew dunya ye
Va dunya bê wefa ye

Îro gotin behar e ewravî guregur e
Her çi je asmên da tê mîna cevahir durr e
Mêran kisbek xwe hewi malê le dunê pirre
Her kes we dil zewicî umrê wan dewi pirre
Her kes bê dil zewicî umrê wan dewi kurre

## Helbestên tirkî*

1.
Gêti evel Cemşîd Cem, Selsal û hem Dal Ibnê Dal
Vermedi furset ecel Qarûnê ba mal û menal
Gordûn ki qalmedi Eflatûn ba eql û kemal
Koçli êti leşker hamû boldi paymal

2.
...Dunyaden yox olûb hem dîn û dunya qalmedi...

3.
Şêx û mulla yoregînde qalmemiş bir zerre nûr
Xemr îçub kafer bolûb artiq bolûb fosq û focûr
Leyn û murted bolûbdûr dax û daş û mar û mûr
El-eman êy şah Mehdî el-eman êle zuhûr
Bîr ûşaqin kungelinde dîn û îman qalmedi

4.
... bolûbdûr mehşerîng gûnî eyan ...

* Kelîmullahê Tevahudî aşkere dike ku di dema veguhestin û tomarkirina helbestên tirkî yên Ce'fer Qulî de gelek beyitên tirkî nehatine xwendin û nehatine famkirin. Me jî di di dîwanê de li cihê beyit û peyvên nehatine veguhestin .......... (xal) bi cî kirine.



## Xurasan sitûnî Hesen Pehliwan

1.
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan
2.
Şîr ner sifetli, Hesen pehliwan

3.
Sufre tukan çorkinde bî perva
Vêrmegden hemtasi tapulmas eslen
Pehliwan yaninde Hatemler gida
Sufreli çorekli Hesen pehliwan
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

4.
......... dûmanlo
Geldi .......................
Yêri yêylaq tîresini Reşvanlû
Şahlere gergli Hesen pehliwan
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

5.
Şah .................................
Geldi .............................
Hatem bexşende ...............
Zal zer sifetli Hesen pehliwan

6.
Deregezde bîr toy goldi Beglerxan
Geldi goglan saroq tekke yomod baxladîlarsan
Gorling olob yixlûb olob nêce adi bêlli pehliwan
Xocexan nokerlarini biyûrdi: yeraq baxliyan
Dalmede durîng sîzlar dest nîşan
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

**7.**
Pehliwanin yêre çaldin, demex oldi Rizaqulî xan
Başînge qayredi tûfanê Nûh axir zeman
Qocaqlûb pehliwan aradin goterdi ozi mest ner kîman
Qûrd hêykeli şîr sifetli bebr hêybetli
Rustem şucaetli Hatem sixavetli, Hesen Reşwanli
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

**8.**
.......................açdi
Rustem kimîn mêydan îçere dolaşdi
Nêçe pehliwanlar onîng qorxsinden gêcede qaçdi
................ ax rişdi
Bo awaze çar goşe cihan duşdi
On îki îmam awazi feryadine yêtişdi
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

**9.**
............................
....... Cemiyet qildilar leşker feravan
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

**10.**
Oni gomiyanlar ..........
....................................
Xudaynîng qudretnden evel kemer beste
Geldi ................................
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

**11.**
Her kîm gilob çaresini qilmedilar qaytilar perşîan
Her kîm one duşmen olsûn........
Xoy û Ûrmiye, Tiflîs, Meraxe, Meşhed, Le`lê Bedexşan
..........................................................
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

**12.**
Qurban olûb Tosîn Muhemedelî xanî
Reşîd legi, qîlçi, sufresi nanî
Geldi Xor û Zaw û Sîne, Çerem, Çehçehe, Mîhîn, Qeretîkanî
Dîsk bawerd û Pîşbilûk û Qehqehe Suhanî
Geldi adxal têcinîng pehliwanî
Himesini yêre çaldi aldi menşûrnamenî
Qord hêykeli ner sifetli bebr hêybet
Rustem şucaetli Hatem sixawetli Hesen Reşwanlû
Xurasan sitûnî Hesen pehliwan

**13.**
Pehliwan tek hêçkîm olmaz dunyade
Qehbelar duşdîlar Meşhedîng erkîndin Hemzemîrza şahzade
Pehliwan oldîlar xan hukmîne, noker piyade
Evel devaye barob Hesen pehliwan
Hêy orob îllar ve yûrêş aparûb
Îki oz serbaz oldorûb yêr alûb
Namerd oq pehliwan gongîsîndin digûb
Atindin yêxildi Hesen pehliwan

**14.**
Pehliwan tek hêç kîm gelmez cihande
Onîng vesfê bolmez şerh û biyane
Ce'fer Qulî vesfîn salob dastane
Qoçîkdili nersifetli Hesen Reşwanlû

**Fitneya Salar***

**1.**
Şahzade salar îlan behsi var
Şahzade dîrbarçe Îran menîngdur
Rê milkînden hukûmetlêq îlan
Text ustinden şagê doran menîngdur

**2.**
Salar diyer yox dir xêyl o sipahîm
Meşhed kimîn yexşî mekan minîngdur
Imam heştum dur puşt o penahîm
Fikr êydirim alem yeksan minîngdur

**3.**
Şahzade diye menîng îşim hamu zor
Minîngdur Sebzivar, beyat Nêyşabûr
Qayîn o Qerayî hukmîmden memûr
Samxan êylan mulkê Qoçan minîngdûr

**4.**
Salar diyer yalan dême kelamî
Kerîmdad xanîmdir Rustem meqamî
Yaxşî nokerlerîm Mervî û Camî
Receb batir Bihadurxan minîngdûr

**5.**
Şahzade diyer şehrî senden alarim
Hukm êyderim qollarîngî baxlarim
Şahîng qolo qînesini yollarim
Xelq ustinde hukmrewan menîngdur

**6.**
Salar diyer yordigîngî yandirdûm
Nêçe senger Samxan êylan sindurdûm
Zor êylan îgîce Tûsîng aldurdûm
Xerîb şahê kon o mekan menîngdûr

**7.**
Şahzade diyer tac o doletim mumtaz
Minîngdur Eraq o Kaşan o Şîraz
Dahî Xurasandur minge payendaz
Şonde valîliqîn qîlan minîngdur

**8.**
Salar diyer yoxdur mine bîr misl
Sen o xêylîng munde goturub ecel
Can qotare bîlmîng olubsin qebl
Xonkar kîmîn tîxê buran minîngdur

**9.**
Şahzade dîger kopdur ferr û şoketîm
Sam Nerîman tek minîng soletîm
Qaf daxîne beraber dur qovetim
Fars êylan Azerbaycan minîngdûr

**10.**
Salar diyer sipahîngî asarmin dare
Çîkem serdarlarîng yozîne qere
Başlardin qayêrem kele minare
Ta ke şahîsin aslan minîngdur

* Kelîmullahê Tevahudî di vê helbestê dê de peyva - منینگدور minîngdur- weke منست Men est tomar kiriye. Em pabendî forma resen a helbestê man û me jî weke Tevahudî veguhast. Ligor têbiniyên Kanîmal ûû gelek edîbên Xorasanê helbestên Ce'ferqulî yên bi tirkî nêzî şîwezara tirkiya çaxatayî ne. Formên lehçeya çaxatayî di helbestên Ce'fer Qulî yên tirkî de tene dîtîn.

**11.**
Şahzade diyer şehrê alarim bêle zar
Qerram xelqi yixam dûkan o bazar
Zinde quymim Xurasande bîr diyar
Xan nayibl Iskenderxan minîngdûr

**12.**
Salar diyer leşkerim girîde dûrmas
Sultanxanê mest ner tek ozînî bilmas
Xusûs oxlum yozîn oxdin dûndirmas
Rustem kîmîn Emîrerselan minîngdûr

**13.**
Şahzade diyer oç îl munde durarmin
Oç îlde mehsûlîng men otararmen
Şehrîng xelqê tazare gitorar men
Her ne zahir sirr nihan minîngdûr

**14.**
Salar diyer vêr menim fûrset o eman
Ûç gon lîn sinê qulor men daxan
Ta ki qalsin defterlardin dastan
Başînge gêtoran tûfan minîngdûr

**15.**
Şahzade diyer bêhed menîng leşkerîm
Ceʻfer Qulî xan dur çon şîrê nerim
Perwîzxan dur her îşîmde rehberîm
Husên paşa bebrê miyan minîngdûr

**16.**
Salar diyer leşkerîm bêhed o payan
Oz mîngîm Meşhedli çon şîrê jiyan
Şahzade oxlum dur Nadirê Doran
Muhemed şêx bîlan Orazxan minîngdûr



**17.**
Şahzade diyer soyî senden kesmîşem
Qafile karvanîng yolin dutmîşem
Munden gêtmem sipahimîden gêçmîşem
Kate babamden bîr nîşan minîngdûr

**18.**
Salar diyer êtmîşem kop senî xemgîn
Az qulmîsin vêrîng konkilînge teskîn
Sene..... yesar o yemîn
Durt yanîngde teke turkman minîngdûr

**19.**
Şahzade diyer menî gûrûbsin oşaq
Xurasanê atim hicraylin firaq
... didîng ne bolor toli qulmaq
Îki başden bûce mekan minîngdûr

**20.**
Salar diyer zerbimden tîtira şûr fereng
Rom leşkeri mene êyde bîlmaz ceng
Meger sin Hemze mîrzaden reşîding
Henûz onden qanlosinan minîngdûr

**21.**
Şahzade diyer sine vêrurim bîr nevîd
Hemzenîng yoxmêş tedbîr û temhîd
Gor nêtay qilor men seni na umîd
Gîrîde Isfihan Zencan minîngdûr

**22.**
Salar diyer Meşhed qîlme nizare
Meger eqlîng yêtmis bêle goftare
Emanînîg nezeri duşmîş ferare
Iran îçon zamin bolan minîngdûr

**23.**
Şahzade diyer çapar şahe yollarim
Mundin gêçan îşi temam yazarim
Îgremî top on foc îlan îstarim
Sêyl gelan seni sêyrliyan minîngdûr

**24.**
Salar diyer serwerîm bîr bo yan baxir
Texti bîlan evel şahingi êvde yaxir
Bîr işare sîlîng gîri qaytir
Qesîm cenet o nêyran minîngdûr

**25.**
Şahzade diyer şehrîm bê hed o bê merz
Eraq o Xurasan mine baş eger
Sin nêrdin gêytordîng sipah o leşker
Şah otoran texti Têhran minîngdûr

**26.**
Salar diyer yanimde bende ferman
Efrasiyab yêri Belx o Bedexşan
Xwarezm o Buxara koli Turkistan
Goglin Yomod evel qereoxlan minîngdûr

**27.**
Şahzade diyer meni gûrûbsin cahil
Kîmîng bardor olson tedbîri kamil
Idila'im qulor herayêşden hasil
Derecezli Silêman xan minîngdûr

**28.**
Salar: tarîmden olobim memnûn
Qevî duşmenlerim qulor sernigûn
Muhemedrehîm xanîm misli Eflatûn
Melek sşmadiyan Muhemedxan minîngdûr

**29.**
Şahzade diyer eslen qayxoymenem
Otore men qiş û yazi bîlmenem
Meni toxoz dursun hêç kîm gormenem
Rahet şerabini îçan minîngdur

**30.**
Salar diyer Hesenxan eger olsêydi
Meger seni Xurasande qoyêdi
Îndi oxli qorxmes canden kêçêdi
Mîraxorîm evel Memîşxan minîngdûr

**31.**
Şahzade diyer olmeng îşmêden aga
Menêng dostlarîm bar aqil o dana
Imam Cume Mîrza Ebdullah
Hacî Mîrza Haşim bîlan minîngdûr

**32.**
Salar diyer axa meni êyledi aga
Duracilarîni quldi rûsiyah
Oldordim varînden qulor men gida
Qayêb îşi hazir êdan menîngdur

**33.**
Şahzade diyer munde dorom xeraman
Menîng îçon qelle gelor feravan
Sîr o sat îçon bîrdem olmem sergerdan
Her terefden komek gelan menîngdûr

**34.**
Salar diyer menîng çon gelmison sorsat
Doracîni dotsam vêrmenim nicat
Nokerim olare yazim berat
Padişah îki cihan menîngdûr

**35.**
Şahzade diyer senîng yoxdur hêç xeber
Mîng bîr dostim bar ne her şîri ner
Hamo xerab îşim yexşi dozatir
Esli Mervli Ibrahîmxan menîngdûr

**36.**
Salar diyer oni kop yaman gordîm
Qoli baxli oni Merwi gonderdîm
Muhemed Tahir xane emvalin vêrdîm
Edaletê Noşîrwan menîngdûr

**37.**
Şahzade diyer geldim şehri Têhranden
Pêşwazîm geldîlan şol Mezînanden
Meni otordîlan bêle mekanden
Xurasani wêran qêylan menîngdûr

**38.**
Salar diyer mîrza Axbaba îş qulûb
Pêyman îlan seni munde gutorûb
.... Ye gondardum oni oldorûb
Yexşi batin xelqi vêran menîngdûr

**39.**
Şahzade diyer şehi doleti mustedam
Lutf êyliyob mengabîle bîr nizam
Menîng îçon komek gondarob Semsam
Memalik dehri doran menîngdûr

**40.**
Salar diyer komegîng gelobdur cedîd
Hêç terefden yoxdur meni bîr umîd
Padişahim komegîm imam şehîd
Xosro zemîn o zeman menîngdûr

**41.**
Şahzade diyer sene şebîhxûn vêrir men
Qafillîn şehri sende alar men
Merwi cami dîgan hamo qurur men
Gul bozîm acilob rêyhan menîngdûr

**42.**
Salar diyer tengerîmîz ênayet qîlûb
Menîng îçon Velîxani yitorûb
Oç yoz menzil yolinde gêtorûb
Leşkerim serdarîn eyan menîngdûr

**43.**
Şahzade diyer artoq bolmeson ferax
Muselmanlar yoragini qîlme dax
Bo îş larden çîkrak olor bar şimax
Bo no îlan îş qayran menîngdûr

**44.**
Salar: bo mesleheti yexşi bîldîlar
Serdarîn sozlarîn kop înandîlar
Atlanob îzi ordûye geldilar
Aydi dîmaxîngden gelan menîngdûr

**45.**
Şahzade diyer serdar îşi dozatûb
Hîle bîlan seni yexşi alatûb
Gunehkar koşi sen hem seni dutûp
Fehm île seng îndi doran menîngdûr

**46.**
Salar diyer kop duşmen êydîm canînge
Serdar îlan hêç duşmedîm qanînge
Namerdlîq lan îndi geldim yanînge
Teqdîr boldi îndi doran senîngdûr

**47.**
Şahzade diyer çox çox bîca îdersin
Niye şah yozîne qilîç çêkersin
Ne diyobsin şah nokerin qirirsin
Şol gunahlar bazxwast îdan menîngdûr

**48.**
Salar diyer t'enelar oystime ating
Zerûr degol menîng zerbîmi doting
Oldorng baxşîng qol kîmi sating
Gunahkar bo cism o canim senîngdûr

**49.**
Şahzade diyer kop gunahlar qêlobsîn
Şahzade dostlarin bar o zadin alobsîn
Girdi nam olob îndi ozîng gelobsîn
Pak batinim seni varaan menîngdûr

**50.**
Salar diyer xicletîm vêrme gîl axir
Meşhed senîng ki dor batin o zahir
Sêvlayob bo sozi Ce'fer Qulî şa'ir
Terk iyledim bol Xurasan senîngdûr

**Le Xakê Xurasanê**
**(Dîwan)**
**Ce'ferquliyê Zengelî**
**Amadekar**: Mehdî Jafarzadeh / Mehmed Salih Bedirxan
www.avestakitap.com
avestayayinlari@yahoo.com
https://twitter.com/avestayayin
https://instagram.com/avestayayin
http://www.youtube.com/avesta1995
http://www.facebook.com/wesanenavesta